

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Amine BULAN

ZAZAKİ DE BÜKÜM HAL EKİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

MUŞ-2024

K.T.
ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN
ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ
ŞAXA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Amine BULAN

TEWANG DI ZAZAKÎ DE

TEZA MASTIRÊ

ŞÊWIRMEND
Dr. Öğr. Üyesi Songül GÜNDOĞDU YÜCEL

MÛŞ-2024

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Amine BULAN

ZAZAKİ DE BÜKÜM HAL EKİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

TEZ JÜRİ ÜYELERİ

Tez Danışmanı : Dr. Öğr. Üyesi Songül GÜNDOĞDU YÜCEL

Jüri Üyesi : Prof. Dr. Tahirhan AYDIN

Jüri Üyesi : Doç. Dr. Ayhan TEK

MUŞ-2024

NAVEROK

NAVEROK	I
KURTE	IV
ABSTRACT	V
ÖZET.....	VI
PÊŞGOTIN	VII
KURTEBÊJE	VIII
LÎSTEYA TABLOYAN	IX
LÎSTEYE WENE	X
DESTPÊK.....	1

BEŞA YEKEMÎN

TÊBÎNIYÊN GIŞTÎ YÊN LI SER ZAZAKÎ

1.1. ERDNÎGARÎ	7
1.2. NASNAME: ZAZA/KIRD/KIRMANC/DIMILÎ	8
1.3. DI NAVA ZIMANÊN ROJAVAYÊ ÎRANÊ DE CIHÊ ZAZAKÎ.....	10
1.4. TESNÎFKIRINA ZARAVAYÊN ZAZAKIYÊ	10
1.5. ZAZAKÎ ZIMAN E AN ZARAVA?.....	11

BEŞA DUYEMÎN

TEWANG DI ZAZAKÎ DE

2.1. TEWANG DI RAVEKÊ (ÎZAFE) DE	15
2.1.1. Ravek di Zazakî de.....	15
2.1.2. Ravek di Devoka Qulpê de	17
2.2. TEWANG DI DAÇEKÊ DE	18
2.2.1. Pêşdaçek.....	20
2.2.1.1. Pêşdaçekên ji Rêzê.....	20
2.2.1.2. Pêşdaçekên Navdêrî	21
2.2.2. Paşdaçek.....	22
2.2.2.1. Paşdaçekên ji Rêzê.....	22
2.2.2.2. Paşdaçekên Navdêrî	23
2.2.3. Daçekên Bazinî	23
2.3. TEWANG DI HÊMANA PIŞTÎ LÊKERÊ DE	24
2.3.1. Ber bi Cihêkî ve Hereketkirin (Allative).....	25

2.4. JI ALIYÊ GIRTIYAREKÎ (INDIRECT OBJECT) VE NEQILKIRIN (DATIVE)	26
2.4.1. Hêmanên Paşiya Lêkerê	27
2.4.2. Hêmanên Pêşiya Lêkerê	27
2.4.3. Hêmanên li Pêşî û li Paşiya Lêkerê	28
2.5. TEWANG DI HÊMANÊN DIN DE	28
2.5.1. Tewang di Rewşa Hokerê de (ji bo tespîtkirina demê)	28
2.5.2. Tewang di Rewşa Banglêkirinê de.....	29
2.6. TEWANGBARIYA KIRDEYÊ DI DEMA BORÎ DE (ERGATÎF)	29
2.7. TEWANGBARIYA BIRESERÊ DI DEMA NIHA DE (AKÛZATÎF)	30

BEŞA SÊYEMÎN

TEWANGBARIYA KIRDEYÊ DI DEMA BORÎ DE (ERGATÎF)

3.1. ERGATÎFA KANONÎK	31
3.2. DI ZIMANÊN ÎRANÎ DE AVANIYA ERGATÎF A KANONÎK	31
3.3. DI KURMANCÎ DE AVANIYA ERGATÎFÊ	32
3.4. DI BELÛCÎ DE AVANIYA ERGATÎFÊ	32
3.5. DI ZAZAKÎ DE AVANIYA ERGATÎFÊ	33
3.5.1. Hevokên Kirdeya Lêkera Gerguhêz	35
3.5.2. Kirdeya Lêkerên Hevedudanî	36
3.6. DI ZIMANÊN ÎRANÎ DE HEVOKÊN DÛRÎ AVANIYA ERGATÎFÊ	39
3.6.1. Di Belûcî de Mînakên Cottewangê	40
3.6.2. Di Kurmancî de Mînakên Cottewangê.....	40
3.6.3.1. Di Zazakî de Mînakên Cottewangê.....	42
3.6.3.2. Di devoka Qulpê de Mînakên Cottewangê	43
3.6.3.3. Hevokên ku Kirde Tewandî, Bireser xwerû û Lêker li Gorî Kirdeyê Hatiye Îşaretkirin	44
3.6.3.4. Kirdeya Lêkerên Negerguhêz.....	46
3.6.3.5. Di Lêkerên Gerguhêz de Kirdeya Xwerû.....	47
3.7. SEDEMA DERKETINA HEVOKÊN DÛRÎ AVANIYA ERGATÎF A KANONÎK	49
3.8. TEWANGBARIYA BIRESERÊ DI DEMA NIHA DE (AKÛZATÎF)	50
ENCAM	53



KURTE
TEZA MASTIRÊ
TEWANG DI ZAZAKÎ DE

Amine BULAN

Şêwirmende Teze: Dr. Öğr. Üyesi Songül GÜNDOĞDU YÜCEL

2024, 102 Rupel

Navçeya Qulpê ku di nava sînorên bajarê Diyarbekirê de ye, ji ber pozîsyona xwe ya erdnîgariyê ji herêmên din ên ku Zazakî lê tê axaftin cuda ye. Devoka Zazakiya ku li vir tê axaftin di navbera zaravayên başûr û navendê de dimîne. Ev navçe wekî herêmeke derbasbûyî ye û zêdetir bi Kurmancî û Tirkî re di nava têkiliyê de ye. Ev rewş hem di warê rêzimanê û hem jî di warê axaftinê de li gorî herêmên din dibe sedema hin cudahiyan. Di hevoksaziya vê devokê de ev cudahî bi zelalî têne dîtin. Armanca vê xebatê ew e ku li ser devoka Zazakî ya ku li navçeya Qulpê tê axaftin lêkolîn bike. Ji bo vê xebatê ji heft gundên Qulpê yên wekî (Kerikan, Seyrikî, Zêrug, Herta, Text, Arqetîn) daneyên ziman bi amûreke qeydkirina dangan ji mêr û jinên ku temenê wan di navbera 25 û 89 salî de diguhere, hatin berhevkerin û ev qeyd bi tevahî 788 deqîqe ne. Li ser daneyên devoka Qulpê ferqên rêzimanî û ferqên rewşa tewangê hatin tespîtkirin û sedemên muhtemel hatin nîqaşkirin. Di vê devokê de bi taybetî hevokên dûrê avaniya ergatîf a kanonîk hatin tespîtkirin. Ev hevok di nava xebatê de hatine rêzkerin û sedemên derketina van hevokan hatine nirxandin.

Peyvên Sereke: Zazakî, Devoka Qulpê, Tewang, Ergatîf.

ABSTRACT
MASTER THESIS
OBLIQUE CASE IN ZAZAKI

Amine BULAN

Advisor: Assist. Prof. Songül GÜNDOĞDU YÜCEL

2024, Page: 102

The district of Kulp, located within the borders of Diyarbakır province, differs from other regions where Zazaki is spoken due to its geographical location. The Zazaki dialect spoken here serves as a transition zone between the southern and central dialects, with more contact with Kurmanji and Turkish. This situation leads to differences in grammar and speech, which are clearly reflected in language structures. The current study aims to analyze the distribution and function of the Oblique case marker in the Zazaki dialect spoken in Kulp. The data used in this study comprised 788 minutes of spontaneous speech, elicited from native Zazaki speakers aged 25 to 89, drawn from seven different villages in Kulp (Kerikan, Seyrikî, Zêrug, Herta, Text, Arqetîn, Kû). Based on the elicited data, the distribution and function of the oblique case marker are analyzed, with an examination of the areas where Kulp Zazaki exhibits unique characteristics, as well as potential reasons for these differences. The study particularly focuses on the ergative alignment observed in past-tense transitive constructions, identifying any non-standard patterns, and exploring possible causes for these deviations.

Key Words: Zazaki, Kulp Zazaki, Oblique Case, Ergativity.

ÖZET
YÜKSEK LİSANS TEZİ
ZAZAKİ'DE BÜKÜM HAL EKİ

Amine BULAN

Tez Danışmanı: Dr. Öğr. Üyesi Songül GÜNDOĞDU YÜCEL

2024, 102 sayfa

Diyarbakır il sınırları içerisinde yer alan Kulp ilçesi, coğrafi konumu nedeniyle Zazaca'nın konuşulduğu diğer bölgelerden farklılık gösterir. Burada konuşulan Zazaca ağzı, güney ve orta lehçeleri arasında bir geçiş bölgesi oluşturmaktadır olup, Kurmanci ve Türkçe ile daha fazla temas halindedir. Bu durum hem gramer hem de konuşma açısından diğer bölgelere göre bazı farklılıkların ortaya çıkmasına neden olur. Bu farklılıklar, dil yapılarında açıkça görülmektedir. Bu çalışma, Kulp'ta konuşulmakta olan Zazaca ağzında büküm hal ekinin (oblique) dağılımını ve kullanım alanlarını incelemektir. Bu çalışmada kullanılmak üzere Kulp'un yedi köyünden (Kerikan, Seyrikî, Zêrug, Herta, Text, Arqetîn, Kû) yaşları 25 ile 89 arasında değişen erkek ve kadından ses kayıt cihazıyla toplam 788 dakika süren dil datası toplanıp derlenmiştir. Bu verilere dayanarak Kulp Zazacasındaki büküm ekinin kullanım ve dağılımındaki farklılıklar tespit edilip muhtemel nedenleri tartışılmıştır. Özellikle de geçmiş zaman geçişli cümlelerde ortaya çıkan ergatif dizgede saptanan standart dışı farklı yapılar listelenmiş ve bunları ortaya çıkaran nedenler değerlendirilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Zazaki, Kulp Ağzı, Büküm, Ergatif.

PÊŞGOTIN

Ev tez ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekemîn de, têbîniyên giştî yên li ser Zazakî hatine ravekirin. Di beşa duyemîn de ewilî fonksiyonên tewangê di Zazakî de bi giştî hatine ravekirin. Piştî di bin serenavan de li gorî rêbazên zimannasiyê tewangên Zazakî hatine analîzkirin. Di beşa sêyemîn de, mijarên avaniya ergatîfê û avaniya akûzatîfê hatine ravekirin. Me xebata xwe li ser nimûneyên devoka Qulpê ava kir hin caran me nimûneyên vê devokê dan ber nimûneyên Zazakî. Ji ber ku xebatên li ser tewanga Zazakî kêr in, me piranî ji çavkaniya zimannas Ludwig Paul sûd girt ku li ser devokên Zazakiyê li gorî teoriyên modern ên zimannasiyê xebatên berfirehtir kirine. Ji xeynî wî ji çavkaniyên biyanî yên din û ji çavkaniyên wekî Mihemed Malmîsanij, Munzur Çem, Deniz Gündüz û Seîd Verroj jî sûd hatiye girtin. Rewşa nimûneyên Zazakiyê li gorî rêbaza zimannasiyê bi Kurmançî hatine kurtkirin (gloss) ku li gorî teoriyên modern ên zimannasiyê dema ku zimanê nivîsê û zimanê ku xebat li ser tê kirin ne wekî hev bin, wergera nimûneyên zimanê xebatê tê kirin û rewşa nimûneyan bi zimanê nivîsê tê kurtkirin.

Di encamê de me dît ku hemû devokên Zazakiyê avaniya ergatîfa standard neparêzin. Di xebatê de qesta me ya Zazakiya standard, avaniya ergatîfa standard e ku heya îro xebatên ku li ser vê avaniyê hatine kirin wekî ku hemû devokên vî zimanî, ev avaniya standard diparêzin. Lê nimûneyên devoka Qulpê û devoka Mûtkiyê nîşan didin ku hevokên dûrê avaniya standard jî hene û ev nimûne di nava xebatê de hatine rêzkirin. Sedema hebûna van nimûneyan li gorî rêbazên zimannasiyê carek din hatin nirxandin û bi xebatên berê re ku li ser heman mijarê hatine çêkirin, hatin piştrastkirin.

Ev xebat, ji dema biryardayinê heta dawiyê, bi alîkariya şewirmenda min birêz Dr. Öğr. Üyesi Songül GÜNDOĞDU YÜCEL hat çêkirin. Ez pêşiyê spasdara wê me ku ez ji tecrube û pêşniyarên xwe bêpar nekirim. Ji bo pêşniyar û sererastkirinên birêz Doç. Dr. Ayhan TEK û birêz Prof. Dr. Tahirhan AYDIN spas dikim. Dîsa ji ber alîkarî, piştgirî û baweriyê ez minetara hevserê xwe Kasım BULAN im. Di wergera metnên Zazakî de ji bo alîkariya hevalê xwe spasiya Abdülkadir AÇIKOĞLU dikim. Ji xeynî vê ez spasiyan ji bo wan kesan dikim ku me dane jê girtin û bûn bingeha xebata me. Mala we hemûyan ava.

KURTEBÊJE

Xwr : Xwerû

Tew : Tewardî

YK1 : Yekjimar kesê yekem

YK2 : Yekjimar kesê duyem

YK3 : Yekjimar kesê sêyem

PK1 : Pirjimar kesê yekem

PK2 : Pirjimar kesê duyem

PK3 : Pirjimar kesê sêyem

Q : Qertaf

Veç : Veçetandek

Brs : Bireser

Krd : Kirde

Dm.N : Dema Niha

Dm.B : Dema Borî

Daç : Daçek

N : Nêr

M : Mê

r : Rûpel

LÎSTEYA TABLOYAN

Tablo 1.1. Di Derheqê Bêjêran de.....	3
Tablo 1.2. Rêzkirina Hevokên Ergatîfê li gorî Xebeta Dorleijn (1996).....	5
Tablo 2.1. Li gorî Paul (2009) Qertafên Xwerû û Tewandî yê Zazakî.....	13
Tablo 2.2. Li gorî Paul (2009) Cînavkên Xwerû û Tewandî yê Zazakî.....	13
Tablo 2.3. Daçekên devoka Qulpê.....	20
Tablo 2.4. Qertafên Banglêkirinê.....	29
Tablo.3.1. Hevoksaziya Zimanên Îranî.....	32
Tablo 3.2. Hevoksaziya Zazakiya Standard.....	34
Tablo 3.3. Cînavkên Devoka Qulpê.....	41
Tablo 3.4. Di Devoka Qulpê de Qertafên Xwerû û Tewandî.....	42
Tablo 3.5. Cînavkên ku li gorî Lêkera Persayîş Hatine Kişandin.....	48

LİSTEYE WENE

Wêne 3.1. Nexşeya Gundên Qulpê ku Zazakî tê Axaffin.....	45
--	----



DESTPÊK

Girîngî û Mijara Xebatê

Navçeya Qulpê ku di nava sînorên Tirkiyê de cih digire, niha girêdayiyê bajarê Diyarbekirê ye. Ev navçe di navbera sînorên herêmên Dîyarbekirê, Çewligê û Mûşê de dimîne. Ji ber vê pozîsyona xwe, di devoka Qulpê de li gorî devokên din yê Zazakiyê hin cudahiyan rîzimanî hene û hin taybetiyên ku devokên din yê Zazakiyê diparêzin, di vê devokê de veguhestine formek din yan jî wenda bûne. Di vê çarçoveyê de, qasê ku me lêkolîn li ser lîteratûra vê mijarê kir, me tesbît kir ku tu xebatên berfireh li ser vê mijarê nehatine kirin. Xebatên ku li ser devokên Zazakiyê wiha berfireh hatine çêkirin tenê ev in: (Selcan, 1998; Paul, 1998; Werner, 2012; Todd, 2002; Doğan, 2023). Di lîteratûrê de xebatek berfireh li ser devoka Qulpê nehatiye çêkirin (Gündoğdu, 2022: 11).

Ev xebat, dê li ser devoka Qulpê ya ku heya îro ji xebat û lêkolînên zimannasan dûr maye raweste. Avaniya rîzimana vê devokê di çarçoveya fonksiyonên tewangê de ku di bin heşt serenavan de dabeş dibin, dê di çarçoveyek fireh de vekole. Li gorî avaniya rîzimana Zazakiya standard dê cudahiyan vê devokê bîne ber çavan û bi daneyan ispat bike. Sedema derketina van cudahiyan li gorî rêbazên zimannasiyê rave bike û ji bo xebatên devokên Zazakiyê bibe alîkar.

Rêbaza Xebatê

Me di vê xebata xwe de ji heft gundên Qulpê yê wek (Kerikan, Seyrikî, Zêrûg, Herta Text, Arqetîn, Kû) ji çend jin û mîrên ku emrê wan di navbera 25 û 89 an de diguhere dane berhev kirin. Ev dane bi amûreke qeydkirina deng û bi awayekî jixweberî bi qasî 788 deqîqeyan hatin qeydkirin. Me ev qeyd bi rêya kompûterekê derbasê nivîsê kir. Piştê me ev dane, li gorî rêbaza zimannasiyê û qaîdeyên rîzimanî nivîsî. Ji bo mijara ergatîfîyê jî me ji xebata Dorleijn (1996) ya bi navê “The Decay of Ergativity in Kurmanci” sûd wergirt. Ev xebat li ser sed hevokan hatiye çêkirin û me ji van sed hevokan tenê sî(30) hevok hilbijartin. Ji xwe di nava daneyên me de heman hevokên ergatîfê hene ku me nexwest carek din heman tiştan bipirsin. Tenê hevokên ku kêrê xebata me bîne, me hilbijartin. Di Tablo. 2. yê de Îngîlîzî, Kurmancî û Zazakiya van hevokan hatiye dayîn.

Çavkanî û Lîteratur

Li ser devokên Zazakiyê yê ku di nava sînorên Tirkiyê de têne axaftin, kêr xebat hene ku bi rêbazên zimannasiyê hatine kirin. Ev xebatên zimannasiyê cara ewilî ji aliyê

zimannasên biyanî ve hatine kirin. Îranolog Peter Lerch di sala 1857an de di herba Qirimê de bi kesekê ku bi eslê xwe ji Çewligê ye re, hevpeyvînê dike û vê hevpeyvînê bêyî analîza gramerê di sala 1858an de bi zimanê Almanî û Rûsî çap dike. Di sala 1906an de zimannas Oscar Mann li ser Zazakiya Siweregê û Çewligê xebatek berfireh çêdike. Piştî mirina Oscar Mann, Îranolog Karl Hadank careke din vê xebatê bi qaîdeyên rêzimanî sererast dike û di sala 1932an de çap dike. Pêncî sal şûn de zimannasê Amerîkî Teryy Lynn Todd bi teknîkên modern ên zimannasîyê li ser Zazakiya Çermûgê xebatek çêdike. Ji sala 1990an şûn de xebatên berfirehtir hatine kirin. Cabolov, 1985 û Maurais, 1978 li ser mijara fonolojiyê gotar dinivîsîn. MacKenzie di sala 1995an de li ser îzafeyê xebatek çêdike. Ludwig Paul di sala 1998an de gotarek bi navê “*Di Navbera Zimanên Îranî de Cihê Zazakî*” dinivîse. Zülfü Selcan di sala 1998an de xebatek bi navê “Pêşveçûna Nivîskî û Dîrokî” çêdike. Jacobson di sala 1993an de xebatek bi navê “Qaîdeyên Îmla” çêdike. Dîsa Jacobson di sala 1997an de pirtûkek bi navê “Pirtûka Xwendinê û Nivîsandinê” çap dike. Mesut Keskin di sala 2008an de li ser “Diyalektolojiyê” xebatek çêdike. Ji xeynî van gotaran du heb xebatên doktorayê yên ku ji aliyê Ludwig Paul û Zülfü Selcan ve hatine çêkirin, di nava lîteratûra Zazakî de cihekî girîng digirin (Keskin, 2015; 98-99). Di van salên dawîn de, hin xebatên mastir û doktorayê jî hatine çêkirin.

Xebatên Mastirê: Kaçan (2018) “Zazakî de Kategorîzekerdişê Edatan û Metnanê Zazakî ra Numûneyî”, Dincer (2021) “Belirleyici öbeği varsayımı açısından Zazaca da izafe yapıları: Sözdizimsel bir çözümleme”, Gündüz (2020) “Avesta dili ile kırmancca (Zazaca) 'nın karşılaştırılması: Leksikolojik bir inceleme”, Biricik (2019) “Bazı yörelerdeki Zazaca ses değişimleri”, Yeşilkaya (2019) “Hetê cinsîyetê gramatikî ra pêveronayîşê kirdkî (zazakî) û kurmanckî”, Sermiyan (2019) “Tayê Taybetmendiyê Kirmanckiya Dêrsimî”, Şanlı (2017) “Têvernayîşê Kurmanckî û Zazakî”.

Xebatên Doktorayê: Karabeyeser (2017) “Zazaki di Wextî”, Değirmenci (2017) “Yeni Farsça ve Zazaca arasındaki ortak sözcükler etimolojisi”, Kırkan (2019) “Zazacanın Fonetik açıdan incelenmesi; Kuzey, güney ve merkez Zazacanın karşılaştırılması”. Ev xebat wekî pdfê li ser rûpela yöktezê hatine weşandin.

Di Zazakiya bakurê de, xebatên herî zêde li ser devoka rojhilata Dêrsimê, devoka Pûlûmûrê, devoka Vartoyê û qismek jî li ser devoka rojavayê Dêrsimê hatine kirin. Di Zazakiya navendî de xebata herî berfireh li ser devoka Palûyê hatiye kirin. Di warê nivîsê

de devokên Solxanê, Hêniyê Pîranê û Licê jî xwedî berhemên nivîskî ne. Di Zazakiya Zazabaşûrê de, li ser devokên Siweregê û Çêrmûgê çend xebat hatine çêkirin. Lê li ser devokên Mûtîkîyê, Aksarayê, Sarizê, Erganiyê, Qulpê û Egilê li ber destê me xebat pir kêr in (Keskin, 2015: 102). Li ser devoka Qulpê tenê sê heb çavkanî li ber destê me hene û ev çavkanî jî ne piralî ne.

Mesut Keskin (2015) di gotara xwe ya bi navê “Zazaca Dili” de, di beşa “Zazacanın Lehçeleri” de behsa hokera “de” yê dike û tenê wekî dîpnotek ji devoka Qulpê mînak dide. Songül Gündoğdu û Amine Bulan (2023) di maqaleya xwe ya bi navê “Ezafê in Zazaki” de mînak ji vê devokê dane. Dîsa heman nivîskar Songül Gündoğdu (2022) di pêşkêşî ya xwe ya bi navê “Retention Zones in Zazaki” de, di beşa “The case of Kulp” de li ser vê devokê disekine. Ji bilî van xebatan, xebatên ku li ser vê devokê hatine kirin li ber destê me nîn in.

Bêjer û Berhevkirina Dengan

Dane ji nava gundên Qulpê yên wekî Kerikan (Kurudere), Seyrikî (Zeyrek) Zêrûg (Özbek), Text (Demirli), Herta (Karpuzlu) û Kû (İslam) hat berhevkirin. Ev dane ji aliyê me ve hat qeydkirin û deşîfrekirin. Kesên ku me deng jê girtine emrê wan di navbera 25 û 89an de diguhere. Ew 21 kesên dengê wan hatine qeydkirinê, ji wan 10 kes jin in û 11 kes jî mêr in. Me ev deng ji 1ê heya 21ê bi hejmaran hatin binavkirin. Ji wan dangan 1-5 Kerikan, 6 Seyrikî, 7-9 Zêrûg, 10-19 Text (kesek ji mezraya Textê ye), 20 Herta, 21 ji Kûyê hatin berhevkirin. Ji xeynê dangan ji bo mijara ergatîfîyê dîsa me ji her gundekî kesek hîlbijart û li gorî lîsteya ku me berê behs kiribû pirs pirsîn û daneyên xwe berhev kirin. Derheqê wan kesan de ku me deng jê girtiye, di tabloya (1) ê de agahî hatine dayîn.

Tablo 1.1. Di Derheqê Bêjeran de

Hejmar	Nav	Zayend	Emir	Têkiliya ewil bi Zazakî re	Têkiliya ewil ya bi Tirkî re	Perwerde	Cih	Dirêjîya Qeydê (Deqe)
1	M.B.	Jin	42	Ji dayîkbûnê ve	Ji 25 saliyê xwe ve	Nexwende	Kerika	57.51
2	S.E.	Mêr	65	Ji dayîkbûnê ve	Ji 18 saliyê xwe ve	Nexwende	Kerika	32.53
3	A.B.	Mêr	70	Ji dayîkbûnê ve	Ji 18 saliyê xwe ve	Nexwende	Kerika	41.17

Tablo 1.1. Di Derheqê Bêjeran de (Devamî)

4	R.B.	Jin	49	Ji dayîkbûnê ve	Ji 25 saliyê xwe ve	Nexwende	Kerika	19.15
5	M.S.	Jin	43	Ji dayîkbûnê ve	Ji 7 saliyê xwe ve	5 sal xwendiyê	Kerika	45.10
6	S.D.	Mêr	70	Ji dayîkbûnê ve	Ji 18 saliyê xwe ve	Nexwende	Seyriki	43.56
7	K.Ş.	Mêr	60	Ji dayîkbûnê ve	Ji 20 saliyê xwe ve	Nexwende	Zêrûg	47.46
8	A.P.	Mêr	70	Ji dayîkbûnê ve	Ji 18 saliyê xwe ve	Nexwende	Zêrûg	26.29
9	S.T.	Mêr	50	Ji dayîkbûnê ve	Ji 20 saliyê xwe ve	Nexwende	Zêrûg	22.46
10	M.N.	Mêr	35	Ji dayîkbûnê ve	Ji 20 saliyê xwe ve	Nexwende	Text	55.17
11	M.B.	Jin	67	Ji dayîkbûnê ve	Ji 47 saliyê xwe ve	Nexwende	Text	60.48
12	Î.B.	Mêr	89	Ji dayîkbûnê ve	Ji 20 saliyê xwe ve	Nexwende	Text	60.00
13	M.B.	Jin	25	Ji dayîkbûnê ve	Ji 15 saliyê xwe ve	Nexwende	Text	27.14
14	S.B.	Mêr	66	Ji dayîkbûnê ve	Ji 20 saliyê xwe ve	Nexwende	Text	15.33
15	Ü.B.	Jin	60	Ji dayîkbûnê ve	Ji 40 saliyê xwe ve	Nexwende	Text	30.24
16	C.N.	Mêr	70	Ji dayîkbûnê ve	Ji 20 saliyê xwe ve	Nexwende	Text	60.04
17	K.N.	Jin	66	Ji dayîkbûnê ve	Ji 46 saliyê xwe ve	Nexwende	Text	29.59
18	N.N.	Jin	60	Ji dayîkbûnê ve	Ji 40 saliyê xwe ve	Nexwende	Text	31.04
19	M.B.	Mêr	55	Ji dayîkbûnê ve	Ji 18 saliyê xwe ve	Nexwende	Text	26.17
20	Ş.Î.	Mêr	55	Ji dayîkbûnê ve	Ji 20 saliyê xwe ve	Nexwende	Herta	43.00
21	S.B.	Jin	50	Ji dayîkbûnê ve	Ji 20 saliyê xwe ve	Nexwende	Kû	20.00
								Tevahî 788.00

Ew dengên ku me ji 21 kesan girtiye ku bi tevahî 788 deqîqeyan pêk tên hinek “serpêhatî”, hinek “çîrok” û hinek jî “vegotinên jiyana berê” ne. Ev dengên ku me qeyd kirine, me bi rêya kompûterê derbasî nivîsê kir.

Tablo 1.2. Rêzkirina Hevokên Ergatîfê li gorî Xebeta Dorleijn (1996)

Îngîlîzî	Zazakî	Kurmancî
1.He/she fell to the ground	o/a gina erd ro	“ew li erdê ket”
2. I ate foot	min nan werd	“min nan xwar”
3. He brought me	ê/aye ez arda	“wî/wê ez anîm”
4. I wrote a letter to you	min to rê mektûb nûšta	“min ji te re name nivîsandiye”
5. The dogs scared me	kutukan ez tersnawa	“kûçikan ez tirsandim”
6. I watered the garden	min bexçe ew da	“min bostan av da”
7. Woman boiled tea	ceneke çay girêna	“jinikê çay keland”
8. He went to his mother	o şî verê dadiyê xwu	“ew çû cem diya xwe”
9. They went out	ê kewtî teber	“ew çûn derve”
10. The child came home	tût ame kê	“zarok hat malê”
11. We did not wait for it	ma hêvî ê nêvindertî	“em li benda wî nesekinîn”
12. I fell into the wather	ez kewta aw	“ez ketim avê”
13. He saw me	ê ez dîya	“wî ez dîtîm”
14. They fought	înan da pêro	“wan li hev xistin”
15. He kidnapped the girl	ê keyneke remna	“wî keçik revand”
16. He ran	ez vazdawa	“ez beziyam”
17. They burned the grass	îna vaşî socney	“wan gîya şewitandin”
18. I saw you in my dream	mi ti hewnê xwu de diya	“min tu li xewna dîtî”

Tablo 1.2. Rêzkirina Hevokên Ergatîfê li gorî Xebeta Dorleijn (1996) (Devamî)

19. Boy made pigeons fly	tûtî kevokî perney	“zarok kevok firandin”
20. Children were playing on the Street	Tûtî kuçe de kay kerd	“zarok li kuçê dilîstin”
21. He lied to me	ê mi rê zûrî kerd	“wî ji min re derew got”
22. The man performed ablution	mêrikî desmaj girot	“zîlamî desmêj girt”
23. I did not know you	mi to nasnêkerdê	“min te nas nedikir”
24. You killed me	to ez kiştî	“te ez kuştim”
25. The women bought bread	ceneke nan girot	“jinikê nan girt”
27. The women bought the apples	ceneke sayî girotî	“jinikê sêv girtin”
28. You have forgotten me	to ez kerda xwu vîr a	“te ez ji bîr kirime”
29. I am here	ez amiya	“ez hatim”
30. I scared the dog	min kutik tersna	“min kûçik tirsand”

Ev hevokên ku ji xebata Dorleijn (1996) hatine girtin, li gor rêbaza xebata me careke din hatin sererastkirin û dane li gorî van hevokan ji kesên hatin berhevkerin.

BEŞA YEKEMÎN

TÊBÎNIYÊN GIŞTÎ YÊN LI SER ZAZAKÎ

1.1. ERDNÎGARÎ

Zazayên ku bi Kurmancên rojhilatê û başûrê rojhilata anadolê re di nava erdnîgariyeke hevpar de dijîn, di nava van herêman û herêmên din de jî xwedî serjimareke girîng in. Serjimara Zazayan piranî li Çewligê û Dêrsimê ye. Li bajarên wekî Elazîzê, bakûrê Diyarbekirê, rojhilata Erzîncanê jî xwedî serjimareke girîng in. Ji xeynî van herêman li Sêwasê, Erziromê, Rihayê, Bedlîsê, Mûşê, Sêrtê, Semsûrê, Erdehenê, Aksarayê û Qersê jî dijîn (Çağlayan, 2016: 49-50; Keskin: 2015: 1; Paul, 2009: 545; Dikhan, Sadikî, 2012: 71).

Di navbera salên 1960 û 1990î de Zaza koçî bajarên mezin ên Tirkiyê yên wekî Stenbol, Bursa, Îzmîr, Kocaelî, Sakarya, Enqere, Konya, Antalya, Edene û Dîlokê dikan. Di heman serdemê de ji ber berdewamiya koçberiya ji Tirkiyê ber bi Ewropayê ve beşeke girîng a serjimara Zazayan koçî Almanya, Avûstûrya, Fransa, Hollanda, Îngilîstan, Swîsre, Îtalya û welatên Skandînavyayê dikan (Çağlayan, 2016: 50; Keskin, 2015: 1). Zazakî/Dimilî zimanek e ku ji aliyê 6 milyon mirovî ve li herêmên jorîn ên Firatê, Dîcleyê, Çemê sor û Çemê Miradê ku li nava sînorên Tirkiyeyê dimînin, tê axaftin. (Izady, 2013: 307; Keskin, 2015: 1). Li welatê Tirkiyê serjimara Zazayan texmîni di navbera 6-7 milyonan e (Kaya, 2012: 100). Her çiqas li ser serjimara Zazayan hejmar bîn gotin jî, bi awayekî fermî hejmara wan nehatiye belgekirin.

Çağlayan (2016) di pirtûka xwe de li ser vê mijarê gotarek wiha nivîsandiye:

“Divê em eşkere bikin ku daneyên fermî yên ku di sala 1965an de li ser nufûsa Zazayan hatine belgekirin, daneyên fermî yên dawîn in. Lê her çendî di serjimêrên ku di navbera salên 1970 û 1985an de, piştî sala 1965an hatine kirin de pirsên zimanê zikmakî hebin jî ji ber ku ev dane bi raya giştî re nehatine parvekirin. Li gorî encama pirsên zimanê zikmakî di derbarê nufûsa wan de ti agahî li ber destê ma nîn in”

Li ser serjimara Zazayên ku li herêmên Batûmê (Gurcîstan) û Cambûlê (Kazakîstan) dijîn, agahiyên teqez di destê me de tune ne (Keskin, 2015: 1). Di sala 1930an de, li bajarê Batûmê ya Gurcîstanê hebûna hin gundên Zazaaxêv hatiye pejirandin (Kurdoyev, 2018: 97 neqil ji; Doğan, 2023: 8). Lêbelê îro derbarê wan axavêran an jî neviyên wan de agahiyek di destê me de nîn e. Tê texmînkirin ku hinek ji wan koçî Asyaya

Navîn û deverên din ên Gurcîstanê bûne an jî hatine dersînorkirin (Kurdo 1996: 85; Selcan 1998: 5–6 neqil ji Doğan, 2023: 8).

Wêneya 1.1. herêmên bingehîn ên ku Zaza tê de dijîn destnîşan dike. Ev nexşe ji çavkaniyên wekî (Andrews 1989; Çağlayan 2016; Keskin 2008; Malmîsanij 2021) hatiye derxistin. Ji ber ku Doğan (2023) nexşeya navên ku herêmên Zaza lê dijîn bi taybetî Kurmancî nivîsandiye û bajarên ku zêdetir Zaza lê dijîn nîşan daye; me ev nexşe hilbijart.



Wêne 1.1. Nexşeya Herêmên ku Zaza lê Dijîn (Doğan, 2023: 9)

1.2. NASNAME: ZAZA/KIRD/KIRMANC/DIMILÎ

Zaza li gorî ciyawaziyên erdnîgariyê wekî “Zaza, Kird, Kirmanc û Dimilî” tên binavkirin. Lê ev awayê xwebinavkirinê ne neteweyî ye, etnîkî û olî ye (Çağlayan, 2016: 26; Keskin, 2008: 2). Zazayên ku li derdora Xarpêtê, Palûyê, Madenê, Qoçgiriye û Aksarayê dijîn xwe wekî “Zaza” “bi nav dikin û zimanê xwe jî wek “Zazakî” bi nav dikin (Zilan, 2019: 337). Her çendî di çavkaniyan de binavkirina Zazakî di derdora van herêman de were sînorkirin jî, di van demên dawî de di gelek deverên din de jî ji bo binavkirinê Zazakî tê bikaranîn. Em dikarin Zazayên ku li navenda Diyarbakirê û Çewligê dijîn wekî mînak nîşan bidin. Hema bêje hemû Zazayên ku ji mezheba Şafiî ne, xwe wekî Zaza û zimanê xwe jî wekî Zazakî pênase dikin (Keskin, 2008: 2). Di heman demê de Zazayên ku li navçeya Qulpê dijîn xwe wekî Zaza bi nav dikin.

Navê Zazakî bi rastî jî têgeheke derekî ye ku ji aliyê kesên din ve tê bikaranîn û tê wateya biçûkxistinê (Paul, 2009: 545). Dimilî û zimanê wan ê zikmakî Dimilkî, ji ber ku di zimanê wan de gelek dengên “z” hene, ji aliyê axêverên Kurmancên bakur ve Zaza tê gotin (Izady, 2013: 302).

Zazayên ku li bakurê Dîyarbekirê, bakurê Çewligê û Elazîzê dijîn, bi piranî xwe “Kird” dihesibînin û zimanê ku pê diaxifin “Kirdkî” an jî “Kirdî” ye. Erdnîgariya ku lê dijîn re jî dibêjin “Kirdane” (Çağlayan, 2016: 39; Zilan, 2019: 306).

Civaknas Gökalp (2013) di pirtûka xwe ya bi navê “Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler” de navê Zaza bi kar tîne.

“Ji bo Zazayên ku ji xwe re dibêjin “Kird” bi tîpa erebî ya kafê ku bi kesre tê gotin. Ji Kurmancan re jî dibêjin “Kirdas”. Ji aliyê din ve Tirkan binavkirina “Kurd” li Kurmancan kiriye.”

Yek ji wan navên ku Zaza ji xwe re dibêjin û li gorî navên din kêmtir tê bikaranîn; navê “Kirmanc” e. Ev nav herî zêde ji aliyê Zazayên Elewî ve li herêmên wekî Dêrsimê, Erzîncanê, Kixiyê, Gimgimê û Koçgiriye ve tê bikaranîn. Zazayên Elewî yên ku ji bo danasîna xwe navê “Kirmanc” bi kar tînin, ji cîranên xwe yên Kurmancîaxêv re dibêjin “Kirdas/Kirdaş û Kirdaskî/Kirdaşkî” (Çağlayan, 2016: 41; Zilan, 2019: 316; Malmîsanij, 1996: 4).

Munzur Çem (1996) di gotara xwe de ji bo binavkirina “Kirmanc” wiha dibêje:

“Rast e gelê Dêrsimê ji xwe re dibêjin Kirmanc, lê ev têgeh ne tenê ji bo Kirmanckî (Dimilkî, Kirdkî, Zazakî) ye ku beşek ji wan li Dêrsimê diaxivin. Elewî, komên cîran, sunnî û Kurmanc jî dikevin heman kategoriyê. Ango navên Kurmancên Kixiyê, Qereqoçanê, Milazgirtê û hwd. jî Kurdîtî û Kurdayetiyê temsîl dikin.”

Dema ku pîrên Dêrsimê yên nexwende ji xwe re dibêjin “Ma Kirmanc me” (em Kirmanc in) mebesta wan civakên Elewî yên ku Kirmanckî/Zazakî, Kirdaşkî/Kurdîaxêv in. Zazayên din derveyî vê binavkirinê dimînin. Ango Zazayên Sunnî, Kurdên Sunnî, Tirkên Elewî û Ezîdî (Gülsün, 2011: 144; neqil ji Çağlayan, 2016: 41). Di vê rewşê de navê Kirmanc wekî navekî etno-dînî ye.

Zazayên ku li Mûtkiyê, Çermûgê, Şankûşê, Gergerê, Şîroyê û Sîweregê dijîn, ji xwe

re dibêjin Dimilî û ji zimanê xwe re jî dibêjin Dimilkî (Zilan, 2019: 326; Çağlayan, 2016: 35). Peyva “Dimilî” di çavkaniyên nivîskî de wekî “Dunbulî, Dunbelî, Dunbalî, Donbolî, Dinbilî, Dünbülî, Dûmbelî, Dumbili, Dumbulî derbas dibe (Malmîsanij, 1996: 30).

Ji xeynî van çar navan binavkirinên din jî hene. Zazayên Elewî yên ku li navçeya Gimgimê û navçeya Xinisê dijîn, ji xwe re dibêjin “şarê ma” (gelê me). Ji bo zimanê ku dipeyivin jî îfadeya “zonê ma” ku tê wateya “zimanê me” an jî “so-bê” bi kar tînin (Zilan, 2019: 348; Keskin, 2008: 2). Gündoğdu (2022) ji bo xebata xwe bi Elewiyekî re ku ji Gimgimê ye, hevpeyvînek dike û ev kes di hevpeyvîna xwe de dibêje ku zimanê me Elewîti ye.


1.3. DI NAVA ZIMANÊN ROJAVAYÊ ÎRANÊ DE CIHÊ ZAZAKÎ

Zazakî di nava zimanên Îranî de, di bin şaxa bakurê rojavayê de cih digire û li başûrê rojhilatê Tirkiyê tê axaftin. Zimanê herî nêzî Zazakî, zimanê Goranî ye ku li Îranê û Iraqê tê axaftin (Paul, 2009; 545; Werner, 2012; 5).

1.4. TESNÎFKIRINA ZARAVAYÊN ZAZAKIYÊ

Zimanê Zazakî bi gelemperî li ser sê zaravayên sereke tê dabeşkirin: Zaravaya bakur, zaravaya başûr û zaravaya navendê.

Li gorî Paul (2009), Zazakî ji gelek zaravayên heterojen pêk tê ku piraniya van zaravayan ji sê devokên wekî (bakur, başûrê rojava, başûrê rojhilat) pêk tên û di bingehe de Zazakî li ser zaravayan ava dibe. Li gorî Keskin (2015) jî Zazakî li ser sê zaravayan ava dibe. Zaravaya bakurê wekî (Dêrsim û Erzîncan), zaravaya navendê wekî (Çewlig) û zaravaya başûrê wekî (Siwereg û Çermûg). Ji xeynî vana hin herêmên wekî Qulpê û Mûtkiyê jî wekî herêmên derbasbûyî qebûl dike. Selcan (1998) jî zaravayên Zazakiyê vediqetîne du beşan: Zaravayê bakurê û zaravayê başûrê. Ji ber ku Mesut Keskin di nexşeya xwe de herêma Qulpê, wekî herêmeke derbasbûyî ku di navbera herêmên Dîyarbekirê, Çewligê û Mûşê dimîne destnîşan kiriye, me ev nexşe hilibijart.



Wêne 1.2. Nexşeya Tesnîfkirina Zaravayên Zazakiyê li gorî Keskin (2015)

1.5. ZAZAKÎ ZIMAN E AN ZARAVA?

Wekî ku me li jor jî diyar kiribû Zazakî di bin şaxa zimanên Îranî yê bakurê rojavayê de cih digire. Li ser ziman an zaravabûna Zazakiyê hin nêrînên cuda hene. Li gorî hin zimannasan ev ziman, di bin şaxa zimanên Îranî de, zimanek serbixwe ye. Li gorî hin zimannasan jî ev ziman, zaravayê Kurdî ye. Di vê mijarê de mebesta me tenê ev e ku nêrînên cuda yê derbarê vê mijarê de bînin ber çav.

Hin zimannas wekî (Todd, 2002; Paul, 2011; Keskin, 2015; Selcan, 1998; Jügel, 2014) piştgirî didin ku ev ziman, jî zimanê Kurmanciyê cuda ye û di bin şaxa zimanên Îranî de zimanek serbixwe ye.

Zimannas Paul (2011) li ser vê mijarê wiha ragihandiye:

“Bi rastî di van çend sedsalên borî de, gelek Zaza bi Kurdan re di nav civakeke etno-çandî de jiyane û ji ber vê yekê ji aliyê zimanî, çandî û hwd. ve nêzîkî wan bûne (ev bi taybetî ji bo Zazayên sunnî û kesên ku bi wan re dijîn derbas dibe). Ji ber vê yekê her çiqas Zazakî zimanekî serbixwe be jî, dîsa jî Zaza di warê çandî û xwenasiya xwe ya etnîkî de dikarin xwe wekî Kurd his bikin.”

Paul (2011) dibêje ku têkiliya navbera ziman û etnîsîteyê tevlihev e. Ev têkilî di

bingehê de girêdayê çandê, olê, dîrokê, siyasetê û gelek faktorên din e. Lê dîsa jî dibe ku ziman û etnîsîte ji hev cuda bin.

Di heman demê de, ji bo pênaseya ziman an zaravabûna Zazakiyê dijberiyên din jî hene ku hinek dibêjin pênaseya zimanî dikare bi nasnameya xwe ya etnîkî re têkildar be.¹ Ji xeynê vê yekîneyê hin kes jî hene ku, zimanê Zazakî wekî zaravayê Kurdî û Zazayan jî wekî Kurd dihesibînin.²



1 Ji bo agahiyên berfireh Haig & Öpengin (2014) û Sheyholislami (2015) bnr.

2 Ji bo agahiyên berfireh Gündoğdu (2022) bnr.

BEŞA DUYEMÎN TEWANG DI ZAZAKÎ DE

2.1. FONKSÎYONÊN TEWANGÊ DÎ ZAZAKÎ DE

Di Dimilî de rewşa rêzkirin û wateya peyvên bi du awayî derdikeve holê. Peyvên ku ji aliyê morfolojîk ve nehatine destnîşankirin di rewşa xwerû (direct) de, yê ku hatine nîşankirin di rewşa tewandî (oblique) de ne (Tood, 2002: 35; Paul, 2009: 548). Bi gotineke din heke peyv qertafek hilbigire û ev peyv ji aliyê rewşê ve diyar be yan jî guherînek li ser peyvê çêbibe di rewşa tewandî de ye heke peyv qertaf negire û rewşa peyvê neguhere di rewşa xwerû de ye. Hemû zaravayên Zazakî xwedî du formên in. Forma xwerû (direct) û forma tewandî (oblique) (Gündoğdu, 2022: 11; Paul, 1998: 16). Em ê jî di vê beşa xwe de li ser rewşa duyemîn yanê rewşa tewandî (oblique) bisekinin. Gelo di Zazakî de tewang di kîjan rewşan de derdikeve holê û fonksiyonên wî çi ne? Em ê li van fonksiyonan binêrin û paşê li daneyên xwe binêrin ku me ew ji navçeya Qulpê berhev kirine.

Tablo 2.1. Li gorî Paul (2009) Qertafên Xwerû û Tewandî yê Zazakî

	Qertafên Xwerû	Qertafên Tewandî
Y.J.M	-i/-a	-er/-a
Y.J.N	-ø/-e	-i
P.J	-i/-e/-ey	-an

Tablo 2.2. Li gorî Paul (2009) Cînavkên Xwerû û Tewandî yê Zazakî

	Cînavkên Xwerû	Cînavkên Tewandî
Y.K. 1	ez	min
Y.K. 2	ti	to
Y.K. 3	o (nêr) / a (mê)	ey/ay
P.K. 1	ma	ma
P.K. 2	şima	şima
P.K. 3	ê	inan

Ji ber ku zimannas Ludwig Paul li gorî zimannasên din xebateke berfireh li ser Zazakî çêkiriye, me qertaf û cînavkên Zazakî ji xebata wî hilgirtin.

Zimannas Paul (1998) fonksiyonên tewangê di Zazakî de bi vî awayî katagorîze dike:

- I. Biresera dema niha (direct object accusative)
- II. Kirdeya lêkera gerguhêz (Agent)
- III. Di îzafeyê de hêmana xwedî/raveker (possessor/genitive)
- IV. Bireser (indirect object/dative)
- V. Hêmanên piştî lêkerê (Allative)
- VI. Berawirdkirina hêmanan (Comparative)
- VII. Hêmanên piştî daçekan (Primary-Postposition)³
- VIII. Hoker/zerf (Adverb)

Niha ev rewşên ku Ludwig Paul li gorî xebata xwe senifandine; em ê careke din li gorî xebata xwe wiha bisenifînin;

- Tewang di ravekê (îzafe) de
- Tewang di daçekê de
- Tewang di hêmana piştî lêkerê de (Allative)
- Tewang ji aliyê girtiyarekî ve di neqilkirinê de (Dative)
- Tewang di rewşa hokerê de
- Tewang di rewşa banglêkirinê de
- Tewangbariya kirdeyê di dema borî de
- Tewangbariya bireserê di dema niha de

Di bin van serenavan de fonksiyonên tewangê hatine ravekirin. Di Zazakî û devoka Qulpê de ferqa wan ji hev heye yan çiqas dişibin hevdu li ser mînakên hatiye analîzkirin.

³ Paul daçekan bi vî awayî katagorîze dike.

2.1. TEWANG DI RAVEKÊ (ÎZAFE) DE

Morfema girêdanê ku jê re îzafe tê gotin, bi girêdana navdêrek û hêmanek guherbar re raveka navdêrî çêdike. Îzafe li gorî zayend û hejmarê tê tewandin. Raveka rengdêrî, rengdêrekê bi navdêrekê ve girê dide, raveka navdêrî navdêrekê yan cînavkekê bi navdêrekê re girê dide (Werner, 2012: 11).

2.1.1. Ravek di Zazakî de

Di Zazakî (Dimilî) de morfemên ravekê bi raveka navdêrî, raveka rengdêrî û raveka zincirî re girêdayî ne. Raveber, qertafa veqetandekê digire û bi ravekerê re tê girêdan. Di ravekê de du form hene: Forma xwerû û forma tewandî. Hêmana xwedî raveker di rewşa tewandî de ye. Qertafên raveberê li gorî zayend (nêr û mê) û hejmara navdêran (yekjimar û pirjimar) tên îşaretkirin. Qertafên pirjimariyê ne xwedî zayendek in (Todd, 2002; Paul, 2009; Gündoğdu û Bulan, 2023).

Mînakên jêrê ji xebatên wekî (Paul, 1998; Gündoğdu û Bulan, 2023; Werner, 2012; Çem, 2003; Gündüz, 2013; Malmisanij, 2015) hatine girtin ku ev xebat li ser sê zaravayên Zazakiyê wekî (başûr/bakur/navend) hatine çêkirin. Qertafên îzafeyê yê tewandî di van zaravayan de bi çî awayî ne bi piştgiriya mînakan ve hatine analîzkirin.

- (1) a. *Keynek-a* *werd-î*
keçik-Q.Veq.M. piçûk-Q.Tew.M.
“Keçika piçûk”
- b. *Lajek-o* *har-ø*
kurik- Q.Veq.N. har- ø
“Kurikê har”
- c. *Enjîl-ê* *wuşk-î*
hêjîr- hişk-Q.Tew.Pir.J.
Q.Veq.Pir.J.
“Hêjîrên hişk”
- d. *Ban-ê* *diqat-î*
xanî- duqat-
Q.Veq.Pir.J Q.Tew.Pir.J.

“Xaniyên duqatî”

Di raveka rengdêrî de qertafên ku girêdayî hêmana navdêrê ne li gorî zayendê û hejmarê qertafên cuda hildigirin. Di rewşa xwerû de, navdêrê yekjimar nêr veqetandeka (o)yê, navdêrê yekjimar mê veqetandeka (a)yê hildigire. Veqetandeka pirjimariyê jî (ê)4 ye.

- (2) a. *Kutik-ê mi*
kûçik-Q.Tew.M. mi-Y.K.1.Tew.

“Kûçikê min”

- b. *Keynay-a pađıřay geno*
qîzîk- Q.Veq.M. pařa- girtin-Dm.N.
Yek.J.N.Tew.

“Qîza pařê digire”

- c. *Dest-ê lazek-î*
dest- Q.Tew.N. kurik-Q.Tew.N.

“Destê kurikî”

- d. *Doman-ê dewe*
zarok- gund-Q.Tew.M.
Q.Tew.Pir.J.

“Zarokên gundê”

Di raveka navdêrî de, qertafên ku girêdayî hêmana navdêrî ne di rewşa tewandî de ne. Navdêrê yekjimar nêr qertafa (-ê)yê, yekjimar mê qertafa (-a)yê, hildigire (Gündoğdu û Bulan, 2023: 3).

4 Qertafên tewandî yê zaravayên din û devoka Qulpê bi awayekî berfireh hatine dayîn (bnr. Gündoğdu, 2022; Paul, 1998).

2.1.2. Ravek di Devoka Qulpê de

Raveka rengdêrî

- (3) a. *Telik-a* *sûr-e*
şimik-Q.Veq.M. sor-Q.Tew.M.
“Şimika sor”
- b. *Telik-ê* *sûr-î*
şimik-Q.Veq.Pir.J. sor- Q.Tew.Pir.J.
“Şimikên sor”
- c. *Bir-o* *pîl- ø*
bira-Q.Veq.N. mezin- ø
“Birayê mezin”
- d. *Bir-ê* *pîl-î*
bira-Q.Veq.Pir.J. mezin- Q.Tew.Pir.J.
“Birayên mezin”

Raveka Navdêrî

- (4) a. *Xal-a* *mi* *Safe*
xatî-Q.Tew.M. mi-Y.K.1.Tew.
“Xatiya min a Safê”
- b. *Kulfet-î* *ap hecî* *Resûl-î*
kulfet- Q.Tew.Pir.J. apê hecî Q.Tew.N.
“Kulfetên apê hecî Resulî”
- c. *Bab-dê* *to*
bav-Q.Tew.N. te-Y.K.2.Tew.
“Bavê te”
- d. *Dew-ê* *pêrtag-e*
gund- Q.Veq.M. pêrtag-Q.Tew.
“Gundê pêrtagê”

Hevoka (c)yê ku aîdê gundê “Zêrûgê” ye wekî Zazakiya başûrê di raveka navdêrî de xwedî forma “de/da” yê ye.

Di hevoka (d)yê de, ravebera “*dew*” ê ku navdêrekî xwedî zayenda mê ye qertafa nêrê “ê” hilgirtiye. Divê li gorî qertafên mê yên Zazakîyê, ev navdêr qertafa mê “a” hilbigirta. Lê dema ku em bala xwe didin vê mînakê em dibînin ku qertafa mêyê veguhestiye qertafa nêrî. Ji xeynî gundê “Zêrûgê” şeş gundên din di raveka navdêrî de qertafa nêrî “ê” yê bi kar tînin.

2.2. TEWANG DI DAÇEKÊ DE

Daçek ji wan cureyên bêjeyan in ku bi tena serê xwe ne xwedî wateyek in. Ev daçek dema ku bi curebêjeyên din re tèn bikaranîn wateyan digirin ser xwe û wateyan li curebêjeyên din bar dikin. Di Zazakî de daçek li ser sê cureyan tèn dabeşkirin: Paşdaçek (prepositions), pêşdaçek (postpositions) û bazindaçek (circumpositions) (Malmîsanij, 2015; Verroj, 2014; Gündüz, 2013; Çem, 2013; Gündoğdu û Bulan, 2023). Li gorî Todd (2002) Zazakî xwedî du cure daçekan e. Daçekên ku hêmanên pêşiya xwe ditewînin û yên ku hêmanên pêşiya xwe natewînin. Daçekên duyemîn di Zazakî de zêdetir in. Lê ev pênase û tespîta Todd ji bo daçekên Zazakî hinek qels dimîne. Li gorî Paul (2009) jî Zazakî xwedî du cure daçekan e. Daçekên yekemîn (primary) û daçekên duyemîn (secondary)⁵. Ev daçekên yekemîn bi gelemperî daçekên ji rêzê ne û ji pêşdaçek û paşdaçekan pêk tèn. Daçekên duyemîn jî ji aliyê hevoksaziyê ve xwedî ravek in. Ev ravek ji navdêran û hokeran pêk tê. Ji ber ku daçekên duyemîn xwedî ravek in, raveber qertafên tewandî hildigire. Lêbelê daçekên yekemîn qertafên cuda hildigirin.

⁵ Di zimanên Îranî de bi gelemperî daçekên duyemîn bi rêya ravekê tèn çêkirin (Doğan, 2023: 43)

(5 a. *Ma pê arye bîyê we*
) P.K.1.Tew. bi aş- bûn-
 Yek.J.M.Tew. Dm.Bor.

“Em bi aşê xweyî dibûn”

b. *Ma pê gey-an-ê xwu cit ker-dê*
 P.K.1.Tew. bi canege- xwe cot kir-
 Q.Tew.Pir.J. Dm.Bor.

“Me bi canegên xwe cot dikir”

c. *E xwu rî li mel-ê gêrena*
 Y.K.1.Xwr. xwe re li mele- Yek.J.N.Tew. gerîn-Dm.N.

“Ez ji xwe re li melê digirim”

d. *Ma ro dere mere nêewnayê*
 P.K.1.Tew. li dere- nenihêrî-
 Yek.J.M.Tew Dm.Bor.

“Me li dere mere nênihêrî”

e. *Ma bi melêve o simer*
 P.K.1.Tew. bi melev- ew ka
 Yek.J.M.Tew.

“Me bi melevê ew ka”

f. *Şima rû mi kerd*
 P.K.2.Tew. li Y.K.1.T kir-Dm.Bor
 ew

“We li min kir”

g. *Patose bi qayiş gire deyne*
 patos-Yek.J.Tew.M. bi qayiş- girêdan-
 Yek.J.Xwr.N. Dm.Bor.

“Patos bi qayişê girê didan”

- h. *Homa* *to* *razi bî*
 Xweda Y.K.2.T razi be-Dm.N. .
 ew
 “Xwedê ji te razi be”

Tablo 2.3. Daçekên Devoka Qulpê

Daçekên ji rêzê					Daçekên navdêrî	
Pêşdaçek	Paşdaçek		Bazindaçek		Pêşdaçek	Paşdaçek
pê	“bi”	ra	“ji”	badî...ra	“pişt re”	zere “hindir ser “li ser”
li6	“li”	rê	“ji bo”	mîyan...ro	“nav”	nizd “nêzîk”
ro	“li”	zî	“jî”	ser...di	“li ser”	miyan “di nav de
bi	“bi”	rî	“ji re”	ver...de	“li ber”	dorûver “derûdor”
rû	“li”	ro	“li”	ver...ra	“ji ber”	ver “li ber”
de”		di	“ji”	orte...de	“nav	ser “ser”
						qê “ji bo”

2.2.1. Pêşdaçek

2.2.1.1. Pêşdaçekên ji Rêzê

Di hevoksaziya Zazakî de pêşdaçekên ji rêzê li pêşiya peyvan cih digirin û peyvên piştî xwe ditewînin (Paul, 1998: 78).

Di mînaka (g)yê de, divê navdêrê nêr “qayiş” ku li piştî daçekê cih digire bihata tewandin. Lê ev navdêr di rewşa xwerû de ye. Ludwig (1998) li ser vê yekîneyê wiha dibêje ku navdêrên ne candar yên nêr dema ku li paşî yan jî li pêşiya daçekên ji rêzê cih digirin qertafa tewandî hilnagirin û di rewşa xwerû de ne. Dîsa li ser vê yekîneyê Doğan (2023) dibêje ku tewangbariya navdêrên nêr ên ku li paşî yan jî pêşiya daçekan cih digirin,

6 Ev daçeka “li”yê tenê li gundê “Textê” tê bikaranîn û di şexş gundên din de li şûna wî daçeka “ro”yê tê bikaranîn. Li gorî nêrîna me ev daçeka “li”yê ji Kurmanciyê hatîye hilgirtin. Lewre di Zazakî de ev daçek nîn e.

girêdayî diyarî û candariya wan navdêran e. Yanî heke navdêrek ji aliyê rewşê ve diyar be û candariyê be di rewşa tewandî de ye. Heke ne candar be û ji aliyê zayendî ve nêr be di rewşa xwerû de ye.

i.	<i>Jê</i>	<i>gay</i>	<i>bigureye</i>	<i>jê</i>	<i>heş-ø</i>	<i>bure</i>
	wekî	ga	bixebite-Dm.N.	wekî	hirç-Yek.J.N.	bixwe-Dm.N.

“Wekî gayê bixebite wekî hirçê bixwe”

Di vê hevokê de hêmanê piştî daçekê “*heş*” xwedî zayenda nêr e û di rewşa xwerû de ye. Ev yekîne jî nîşanê me dide ku hem di Zazakiya Qulpê de hem jî di Zazakî de navdêrên nêr ên cinsî dema ku bi pêşdaçekan û paşdaçekan re di nav hevokê de cih digirin di rewşa xwerû de ne.

Di mînaka (h)yê de ku me ji gundê “Zêrûgê” peyda kiriye, daçeka “*ra*” yê ji holê rabûye. Her çiqas di nava hevokê de ev daçek tune be jî mirov difikire ku daçekeke veşartî heye û hêmana pêşiya xwe “*to*” yê ditewîne.

2.2.1.2. Pêşdaçekên Navdêrî

Li gorî Paul (1998) hin cure daçek hene ku ji daçekên ji rêzê cuda ne. Ev daçekên ku em wekî daçekên navdêrî bi nav dikin xwedî raveka navdêrî ne û ev daçek hem bi xwe qertafên tewandî hildigirin hem jî hêmanên piştî xwe ditewînin. Zazakî hin daçekên navdêrî ji zimanên Tirkî û Erebî hilgirtine û dîsa ev daçek di raveka navdêrî de qertafên Zazakî yên tewandî hildigirin.

(6)	a	<i>Ma</i>	<i>amey</i>	<i>zer-dê</i>	<i>Mûş-î</i>
		P.K.1.Tew.	hatin-Dm.Bor.	nav-Q.Tew.N.	Q.Tew.N.

Em hatin navenda Mûşê”

b	<i>Eno</i>	<i>şino</i>	<i>nizd-î</i>	<i>îne</i>
	ev	çûyîn-Dm.N	nêzî-Q.Tew.N.	P.K.3.Tew.

“Ev diçe nêzîkê wan”

c	<i>Ti</i>	<i>nêzana</i>	<i>dorûver-ê</i>	<i>dar-a</i>	<i>bikerê</i>
	Y.K.2.Xwr.	nezanîn	derûdor-Q.Tew.N.	dar-Q.Tew.Pir.J.	kirin-Dm.N.

“Tu nizanî derûdora daran çêbikî”

d	<i>Gey</i>	<i>berdêne</i>	<i>ver-ê</i>	<i>genim-a</i>
.				
	ga	birin.Dm.Bor.	ber-Q.Tew.N.	genim- Q.Tew.Pir.J.

“Ga dibirin ber geniman”

e	<i>Kuno</i>	<i>mîyan-dê</i>	<i>dewe</i>
.			
	ketin-Dm.N.	nav- Q.Tew.N.	gund-Tew.M.

“Dikeve nava gund”

f	<i>Apê</i>	<i>Mehmec</i>	<i>şîyo</i>	<i>ser-ê</i>	<i>dare</i>
.		<i>an</i>			
			çûyin- Dm.Bor.	ser- Q.Tew.N.	dar-Tew.M.

“Apê Mehmeccan çûye serê darê”

2.2.2. Paşdaçek

2.2.2.1. Paşdaçekên ji Rêzê

Paul (2009) hin paşdaçekên ji rêzê carna dikarin bi navdêrek an jî daçêkeke duyemîn re bên girêdan.

(7)	a	<i>Hom-ê</i>	<i>ra</i>	<i>tersenû</i>
.				
		Xweda- Q.Tew.N.	ji	tirsîn-Dm.N.

“Ji Xwedê ditirse”

B	<i>Mi</i>	<i>Hecî Xalid-</i>	<i>rê</i>	<i>viraşto</i>
.		<i>î</i>		
	Y.K.1.Tew.	hecî- Q.Tew.N.	ji	çêkirin-Dm.Bor.

“Mi ji Hecî Xalid re çêkiriye”

c	<i>Ê</i>	<i>şî</i>	<i>o</i>	<i>çax</i>
.	P.K.3.Xwr.	ji	wê	dem

“Ew jî wê demê”

d	<i>Şî</i>	<i>zinar⁷</i>	<i>di</i>	<i>kot</i>
.	çûyin-Dm.Bor.	zinar- Xwr.N.	ji	ket- Dm.Bor.

“Çû ji zinar ket”

e	<i>Mijdiyan-ê</i>	<i>cinet-î</i>	<i>ti</i>	<i>rî</i>	<i>amiya</i>
.	mizgînî- Q.Tew.M.	cenet- Q.Tew.N.	Y.K.2.Xwr.	re	hatiye- Dm.Bor.

“Mizgîniya cenetê ji te re hatiye”

Di mînaka (e)yê de cînavka “ti” yê di rewşa xwerû de ye û ev paşdaçeka “rî” bi tenê li gundê Textê tê bikaranîn.

2.2.2.2. Paşdaçekên Navdêrî

(8)	<i>Des</i>	<i>yemekî</i>	<i>yenê</i>	<i>sifr-î</i>	<i>ser</i>
	deh	xwarin	tên- Dm.N.	sifre-Q.Tew.N.	ser

“Deh cure xwarin tên serê sifrê”

2.2.3. Daçekên Bazinî

Daçekên bazinî ji daçekên navdêrî û daçekên ji rêzê pêk tên. Hêmana ku di navbera van herdu daçekan de cih digire her tim di rewşa tewandî de ye û daçekên ji rêzê her tim li piştî daçekên navdêrî cih digirin.

7 Ji ber ku peyva zinar “nêr” e dîsa di rewşa xwerû de ye.

(allative) û ji aliyê girtiyarekî (object) ve neqilkirinê (dative) de ne. Ew cihê hedefê û hêmanê girtiyar li paşîya pêveberê ye.⁸ Ew hêmanê girtiyarê û hedefê di rewşa tewandî de ne.

2.3.1. Ber bi Cihêkî ve Hereketkirin (Allative)

(10) a *Ma berdî mektebe*

·
P.K.1.Tew. birin-Dm.Bor. dibistan-
Tew.M.

“Em birin dibistanê”

b *Bi her-an ma antê kê*

·
bi ker- P.K.1.Tew. dikişand- mal-Tew.N.
Q.Tew.Pir.J. Dm.Bor.

“Me bi keran dikişand malê”

c *Ez kewta ereba*

·
Y.K.1.Xwr. ketin-Dm.Bor. erebe-Tew.M.

“Ez siwarê erebê bûm”

d *Di niqlî şîyê doleke*

·
du car çûyîn- Tew.M.
Dm.Bor.

“Du car diçûn dolekê”

e *Ot ra yene Sorevan*

·
Xwr.N. ji hatin-Dm.N. g
Xwr.N.

“Ji Otê tên Sorevangê”

f *Ê kewtî aw*

·
P.K.3.Xwr. ketin-Dm.Bor. av-
Xwr.M.

“Ew ketin avê”

⁸ Lê hin îstîsna hene ku hin hêmanên girtiyarê li pêşîya lêkerê ne.

Mînak: *Ezû ci şanî* Yek.J.Tew. “avêtin” “Ez ê bavêjim kê”

Herwiha di hevokên jor de lêkerên tevgerê “*berdiş, antiş, kewtiş û şiyayiş*” ku ber bi cihêkî ve hereketkirinê nîşan didin û hêmanên piştî xwe ditewînin. Di van mînakên de kesek an jî hêmanek ber bi cihêkî ve hereket dike û ev cih “*mektebe, ereba, kê û doleke*” di rewşa tewandî de ye.

Di hevoka (e)yê de hêmanê piştî pêveberê “*Sorevang*” ku cih nîşan dide di rewşa xwerû de ye. Wekî ku me di mijara daçekan de jî diyar kiribû navdêrên cinsî yên nêr dema ku li pêşî û paşîya daçekan de cih digirin natewin. Herwiha navdêrê nêr “*Sorevang*” ku li paşîya lêkerê ye, nehatiye tewandin.

Di hevoka (f) yê de hêmana piştî pêveberê “*aw*” ku cih nîşan dide di rewşa xwerû de ye. Ev navdêra “*aw*” ku xwedî zayenda mê ye divê di nava hevokê de wekî “*awe/awi*” bihata tewandin. Ev navdêr di gundên *Zêrûgê, Kerikanê, Hertayê û Seyrikîyê* de di rewşa xwerû de ye. Di gundên *Kûyê, Arqetînê û Textê* de di rewşa tewandî de ye.

2.4. JI ALIYÊ GIRTIYAREKÎ (INDIRECT OBJECT) VE NEQILKIRIN (DATIVE)

Di Zazakî de nîşandayina morfolojîk û pozîsyona girtiyar li gor cureya lêkeran cudahiyan nîşan dide. Lêkera “*dayiş*” her tim li pêşîya girtiyarê cih digire. Yanê ev lêker cihê hedefê destnîşan dike û hêmanên piştî xwe ditewîne. Lêkerên wekî “*şirawutiş, vatiş, ameyiş û ardiş*” li paşîya hêmanê girtiyar cih digirin. Di heman demê de ev hêmana girtiyar li pêşîya daçekê cih digire. Ji xeynî van yekîneyan lêkerên wekî “*berdiş û şirawutiş*” dema ku bi daçekeke re tînan bikaranîn dîsa hêmanê girtiyarê li pêşîya pêveberê cih digire û dema ku cihê hedefê bê nîşandayin ev cih/hedef li paşîya pêveberê cih digire. Yanê her du cihên hedefê hem li pêşî hem jî li paşîya pêveberê cih digirin. Em dikarin ev sê cure hevoksaziyên devoka Qulpê, li gorî Gündoğdu (2019) ku di gotara xwe ya bi navê “*Asymmetries in Kurmanji Morphosyntax*” de ji bo hevoksaziya Kurmanciya Mûşê sembolîze kiriye, em ê jî ji bo devoka Qulpê sembolîze bikin.

HEDEF (Girtiyar, kesek) LÊKER HEDEF (Girtiyar, mekan/cih).

2.4.1. Hêmanên Paşiya Lêkerê

- (11 a *Ma velg dey ci*
)
 P.K.1.Tew. çilo dayin-Dm.Bor. kê-
 Tew.

“Me çilo dida kê”

- b *Veyn da armenî-y-an*
 .
 bang dayîn-Dm.Bor. ermenî-
 Q.Tew.Pir.J.

“Bangê ermeniyan kir”

Di hevokên jorê de lêkerên “*dayiş*“ê û “*veyn dayiş*“ê neqilkirinê îfade dikin. Di hevoka lêkera “*dayiş*“ê de tiştek ji ber kesekî “*ci*“ yê ve tê neqilkirin û ew kes “*ci*“ wekî hedef li paşiya lêkerê cih digire û ev hedef di rewşa tewandî de ye. Di hevoka lêkera “*veyn dayiş*“ê de tiştek ji aliyê kesekî “*erменîyan*“ ve tê neqilkirin û ew kes “*ermeniyan*“ dîsa li paşiya lêkerê cih digire û di rewşa tewandî de ye.

2.4.2. Hêmanên Pêşiya Lêkerê

- (12 a. *Min to rê mektûbe rêşû*
 Y.K.1.Tew. Y.K.2.Tew. re name şandin-Dm.Bor.
 “Min ji te re name şandiye“

- b. *Rocêk Evdila ame mi ra va*
 rojek hatin-Dm.Bor. Y.K.1.Tew. re got-Dm.Bor.
 “Rojekî Evdila hat ji min re got“

- c. *Mijdiyan-ê cinet-î to rê amiya*
 mizgînî- cinet-Q.Tew.N. Y.K.2.Tew. re hatin-Dm.Bor.
 Q.Tew.M.
 “Mizgîniya cinetê ji te re hatiye“

- d *Hîrî hevî zerdî mi rê ardvî*
 sê heb zêr Y.K.1.Tew. re anîn-Dm.Bor.
 “Ji min re sê heb zêr anîbûn”

2.5.2. Tewang di Rewşa Banglêkirinê de

Tablo 2.4. Qertafên banglêkirinê

Nêr:	Mê	Pirjimar:
-o	-a/-ê	-no

(15) a. *Os-o malmîra*

t

Oso- malxirab

Q.Tew.N.

“Oso malxirab”

b. *Vatê hey Meqbûl-a*

gotin- hey Meqbûle-Q.Tew.M.

Dm.Bor.

“Digot hey Meqbûlê”

c. *Mi va yad-ê*

Y.K.1.Te got- dayik-Q.Tew.M.

w. Dm.Bor.

“Min go dayê”

d. *Keyney- bêrê etya*

no

qîzik- hatin- vira

Q.Tew.Pi Dm.N.

r.J.

“Qîzno werin vê derê”

2.6. TEWANGBARIYA KIRDEYÊ DI DEMA BORÎ DE (ERGATÎF)

Zazakî jî wekî zimanên Îranî yên din xwedî avaniya ergatîfê ye. Li gorî rêbaza vê avaniyê di dema borî de heke lêker gerguhêz be kirde di rewşa tewandî ye. Bireser di rewşa xwerû de ye.

- (16) *Mi nan berd*
 Y.K.1.Krd.Te nan-Brs.Tew. bir-Dm.Bor.
 w
 “Min nan bir”

Di vê hevokê de kirdeya “*min*” di rewşa tewandî ye. Biresera “*nan*” di rewşa xwerû de ye.

2.7. TEWANGBARIYA BIRESERÊ DI DEMA NIHA DE (AKÛZATÎF)

Zazakî di heman demê de xwedî avaniya akûzatîfê ye. Di avaniya akûzatîf de kirde di rewşa xwerû, bireser di rewşa tewandî de ye.

- (17) *O mi arên-o*
 Y.K.3.Krd.Xwr. Y.K.1.Brs.Tew. anîn-Dm.N.
 “Ew min tîne”

Di vê hevokê de kirdeya “*o*” di rewşa xwerû de ye. Biresera “*mi*” di rewşa tewandî de ye. Ji ber ku beşa sêyemîn bi taybetî li ser van herdu mijaran hatiye nivîsandin, wekî destpêk me behsa wan kir. Niha em ê derbasê beşa sêyemîn bibin û bi awayekî berfireh van mijaran analîz bikin.

BEŞA SÊYEMÎN

TEWANGBARIYA KIRDEYÊ DI DEMA BORÎ DE (ERGATÎF)

3.1. ERGATÎFA KANONÎK

Kirdeya lêkera negerguhêz [S] û biresera lêkera gerguhêz [O] di nava hevokê de di heman rewşê de ne. Lê belê rewşa kirdeya lêkera gerguhêza [A]yê ji van her du hêmanan cuda ye. Di avaniya ergatîfê de, kirde tewandî ye bireser xwerû ye û lêker li gorî bireserê tê kişandin. Di avaniya akûzatîfê de kirde xwerû ye bireser tewandî ye û lêker li gorî kirdeyê tê kişandin (Dixon, 1994 neqil: Gündoğdu, 2017: 34; Yonat, Aslanoğlu, 2023: 14).⁹



Sembolên S, A û Oyê di xebata Comrie ya 1978an de bi simbolên S, A û Pyê re têkildar in yan jî bi simbolên wekî X, Y û Zyê re têkildar in (Haig, 2008: 5). Comrie û Dixon avaniya ergatîfê bi heman awayî pênase dikin.

Bi kurtasî ergatîf cure rêzkirineke hevokan a avaniya hevoksaziyê ye. Hevok li ser sê hêmanên bingehîn tên saz kirin. Kirde (subje), bireser (obje) û lêker (verb). Ji wan hêmanan kirde her dem tewandî ye, bireser xwerû ye û lêker li gorî bireserê tê kişandin.

3.2. DI ZIMANÊN ÎRANÎ DE AVANIYA ERGATÎF A KANONÎK

Zimanên Îranî, şaxek ji zimanên Hînd-Ewropî ne û xizmên wan ên genetîkî yên herî nêzîk zimanên Hîndo-Aryanî ne. Zimanên Îranî bi gelemperî li ser du parametreyan ava dibin. Îşaretkirina rewşê (case marking) û lihevhatina devkî (verbal agreement). Ev ziman xwedî du rewşan in, rewşa xwerû û rewşa tewandî (Haig, 2008: 13).

9 Subject: Kirde

Object: Bireser

Agent: Kariger, kirdar

Patient: Karigerîbûn, yê ku bandor lê tê kirin

Tablo 3.1. Hevoksaziya Zimanên Îranî

ACCUSATIVE ALIGNMENT:	A=Dir.	O=Obl. Verb agrees with	A
ERGATIVE ALIGNMENT:	A=Obl.	O=Dir. Verb agrees with	O

Kaynak: (Haig, 2008:13).

Di beşê de avaniya ergatîf a kanonîk di zimanên Îranî wekî Kurmancî, Belûcî û Zazakî de çawa ye hatiye ravekirin. Rêbaza vê avaniyê bi mînakan hatiye analîzkirin ku ji van zimanan hatine girtin. Ji ber ku ev beş dê zêdetir li ser Zazakiyê bisekine, em ê bi kurtasî li ser avaniya zimanên Kurmancî û Belûcî bisekinin.

3.3. DI KURMANCÎ DE AVANIYA ERGATÎFÊ

Kurmancî jî wekî zimanên Îranî xwediyê du kokên lêkeran e. Di koka dema borî ya lêkerên gerguhêz de avaniya ergatîfê û di koka dema niha ya lêkerê de jî avaniya akûzatîfê heye (Yonat, Aslanoğlu, 2023: 14). Di avaniya ergatîfê de O di rewşa xwerû de ye, A di rewşa tewandî de ye. Ji ber ku ev avaniya hevoksaziyê yanî ergatîfê di Kurmanciyê de tenê di dema borî de derdikeve holê, Kurmancî zimanekî nîvergatîf (split ergativity)¹⁰ e. Di koka dema niha de A di rewşa xwerû de ye, O jî di rewşa tewandî de ye û lêker li gorî kirdeyê tê kişandin. Di avaniya ergatîfê de kirde li gorî bireserê tê kişandin.

- | | | | |
|------|-------------------|-------------------|---------------------------|
| (18) | Tu | çûy-î. | |
| | Y.K.2.Krd.Xwr [S] | Dm.Bor. | |
| (19) | Te | .ez | dît-im |
| | Y.K.2.Krd.Tew [A] | Y.K.1.Brs.Xwr [O] | Dm.Bor (Haig, 1998: 157). |

Di van mînakên de kirdeya hevoka negerguhêz (18)ê “tu” û biresera hevoka gerguhêza (19)ê “ez” di heman rewşê de ne. Lê belê kirdeya hevoka gerguhêza (19)ê “te” di rewşek cuda de ye. Yanê kirdeya hevoka negerguhêza (18)ê “tu” û biresera hevoka gerguhêza (19)ê “ez” di rewşa xwerû de ne, kirdeya hevoka gerguhêza (19)ê “te” di rewşa tewandî de ye.

3.4. DI BELÛCÎ DE AVANIYA ERGATÎFÊ

Belucî jî wekî Peştûyî, zimanekî Îranî ye û di bin şaxa bakurê rojavayê de cih digire

¹⁰ Dixon (1994) ev avaniya ku di gelek zimanên Îranî de tê dîtin wekî nîvergatîf bi nav dike. Lê Haig (2008) pênaseya vê têgehê rast nabîne û dibêje ku ev rezkirina (alignment) hevoksaziyê bi xwe ye.

(Mirdehghan, Jahangiri, 2005: 100). Wekî gelek zimanên din ên Îranî yên nûjen, piraniya zaravayên Belûcî xwedî avaniya nîvergatîfê ne (Farrell, 1989 neqil; Jahani, Korn, 2009: 663; Korn, 2009: 44). Belûcî di koka dema niha de xwedî avaniya akûzatîfê ye. Kirde di rewşa xwerû de ye û bireser di rewşa tewandî de ye. Lêker li gorî kirdeyê tê kişandin. Di koka dema borî de xwedî avaniya ergatîfê ye. Yanê kirdeya lêkera negerguhêz [S] di rewşa xwerû de ye, kirdeya lêkera gerguhêz [A] di rewşa tewandî de ye û biresera [O] di rewşa xwerû de ye (Korn, 2009: 44-45).

(20 *maa-Ø* *šut-E*
)
 P.K.3.Krd.Xwr Dm.Bor.
 [S]

“Em çûn”

(21 *kučik-aa* *jinik-Ø* *diist-Ø*
)
 kûçik-Krd.Tew keçik- dît-Dm.Bor.
 [A] Brs.Xwr.[O]

“Kûçikî keçik dît” (Farrell, 1995 neqil: Mirdehghan, Jhangiria, 2005: 100).

Di van mînakên de kirdeya hevoka negerguhêz a (20)ê “*maa*” û biresera hevoka gerguhêz a (21)ê “*jinik*” di heman rewşê de ne. Lê belê kirdeya hevoka gerguhêz a (21)ê “*kučik-aa*” di rewşek cuda de ye. Yanî kirdeya hevoka negerguhêz a (20)ê “*maa*” û biresera hevoka gerguhêz a (21)ê “*jinik-*” di rewşa xwerû de ne, kirdeya hevoka gerguhêz a (21)ê “*kučik-aa*” di rewşa tewandî de ye.

3.5. DI ZAZAKÎ DE AVANIYA ERGATÎFÊ

Zazakî xwediyê avaniya nîvergatîfê û akûzatîfê ye. Lêkerên gerguhêz ên dema borî xwedî avaniya ergatîfê ne, lêkerên koka dema niha xwedî avaniya akûzatîfê ne. Di heman demê de lêkerên negerguhêz ên dema borî jî xwedî avaniya akûzatîfê ne. Gündüz (2013) van avaniyên ku di zimannasiyê de wekî akûzatîf û ergatîf tên binavkirin, ji bo Zazakiyê wiha rave dike:

“*Lêkerên negerguhêz di dema borî de li gorî kirdeyê tên kişandin û ne xwedî bireserê ne. Kirdeya lêkera negerguhêz di kêşana hemû deman û raweya xwestekî di rewşa xwerû de ye. Lêkerên gerguhêz ên demên borî û yên demên niha li gorî*

cînavkên tewandî, cînavkên nişaneyên tewandî û rengdêrên nişaneyên tewandî tên kişandin.”

Ji xeynî Gündüz di pirtûkên rêzimanê yên din wekî Çem (2003:138-139), Malmîsanij (2015: 268), (Veroj, 2014: 221) de jî heman pênaseya ergatîfê û akûzatîfê heye. Zimannas Paul (2009: 568) di gotara xwe de avaniya akûzatîfê û ergatîfê wiha rave dike. Avayê zimanê Zazakî xwedî avaniya ergatîfê (crosswise ergative)¹¹ û avaniya akûzatîfê ye ku lêker li gorî kirdeye tê kişandin.

Tablo 3.2. Hevoksaziya Zazakiya Standard

	Subject	Direct Object	Verb Agreement
Present	DIR	OBL	DIR
Past-trans ¹²	OBL	DIR	DIR

Ji ber ku ev tabloya Paul (1998) li gorî rêbaza zimannasiyê hatiye çêkirin me ji xwe re wekî referans girt.

(22) *Şiwane* *şi*
 şivan- çûyîn-Dm.Bor.
 Krd.Xwr.
 “Şivan çû”

(23) *Doman-an* *kêber-î* *şikî-î* (Veroj, 2014: 223).
 zarok- derî- şikestin-Dm.Bor.
 Krd.Q.Tew.Pir.J. Brs.Xwr.Pir.J.
 “Zarokan derî şikandin”

Di van mînakên de kirdeya hevoka negerguhêz ya (22)yê “*şiwane*” û biresera hevoka gerguhêz ya (23)yê “*kêberî*” di heman rewşê de ne. Lê belê kirdeya hevoka gerguhêz ya (23)yê “*domanan*” di rewşeke cuda de ye. Yanî kirdeya hevoka negerguhêz ya (22)yê “*şiwane*” û biresera hevoka gerguhêz ya (23)yê “*kêberî*” di rewşa xwerû de ne, kirdeya hevoka gerguhêz ya (23)yê “*domanan*” di rewşa tewandî de ye.

Di vê beşê de bikaranîna avaniya ergatîfê li gorî Zazakiya standard û devoka Qulpê

11 Modela ergatîfa çeprast bi gotina tirkî “çapraz ergatîf”.

12 Di dema borî de rewşa gerguhêz.

hatiye berawurdkirin. Hevokên jorê li gorî avaniya ergatîfê ya kanonîk hatine analîzkirin. Hevokên jêrê ku me ji devoka Qulpê hilgirtine, li gorî rêbaza ergatîfa kanonîk hatine analîz kirin.

(24) a. *Ez* *kewt-a* 13(negerguhêz)

Y.K.1.Krd.Xwr. ketin-Dm.Bor.

“Ez ketim”

b. *To ez dîy-a* (gerguhêz)

Y.K.2.Krd.Tew Y.K.1.Brs.Xwr. dîtin-Dm.Bor.

“Te ez dîtîm”

c. *Kutik-î min tersn-a* (cottewang)

kûçik-Krd.Xwr.Pir.J. Y.K.1.Brs.Tew. tîrsandin-Dm.Bor.

“Kûçikî ez tîrsandim”

Di hevokên (a û b)yê de kirdeya lêkera negerguhêz [S] û biresera lêkera gerguhêz [O] di heman rewşê de ne. Lê di mînakê (c)yê de biresera lêkera gerguhêz [O] û kirdeya lêkera gerguhêz [A] di heman rewşê de ne. Yanî ev herdu hêman di rewşa tewandî de ne. Ev rewş di bin serenava mînakên cottewangê de bi awayekî berfireh hatiye ravekirin.

3.5.1. Hevokên Kirdeya Lêkera Gerguhêz

(25) *Mi nan werd*

Y.K.1.Krd.Tew. nan-Brs.Xwr. xwarin-Dm.Bor.

“Min nan xwar”

Di hevoka (25)ê de kirdeya “*mi*” tewandî ye, biresera “*nan*” xwerû ye. Lêkera “*wird*” li gorî bireserê hatiye kişandin. Hevokên jêrê li gorî rêbaza vê hevoksaziyê hatine rêzkirin.

(26) *Min vaş-î suet-î*

Y.K.1.Krd.Tew. giya-Brs.Xwr. şewitandin-Dm.Bor.

“Min giya şewitandin”

13Zayenda cînavka ezê tune ye. Ji ber vê jî em nikarin qertafa “a”yê wekî mê an jî nêr îşaret bikin.

- (27) *Îna* *sîy-î* *eşt-î* aw
P.K.3.Krd.Tew. kevir-Brs.Xwr. avêtin-Dm.Bor. av
“Wan kevir avêtin avê”
- (28) *Cenîye* *mang-ey* *berd-ê* çere
jinik-Krd.Tew. çêlek-Brs.Xwr.Pir.J. birin-Dm.Bor. çêre
“Jinikê çêlek birine çêrê”
- (29) *To* kevok-î *pernay*
Y.K.2.Krd.Tew kevok-Brs.Xwr.Pir.J. firîn-Dm.Bor.
“Te kevok firandin”
- (30) *Ma* *mirdî* *nan* *nêwerd*
P.K.1.Krd.Tew. têr nan-Brs.Xwr. nexwar-Dm.Bor.
“Me nan têr nexwar”
- (31) *Ceneke* *say-e* *girot-e*¹⁴
jinik-Krd.Tew. sêv-Brs.Xwr. girtin-Dm.Bor.
“Jinikê sêv girt”
- (32) *Mi* *kutuk-î* *tersney*
Y.K1.Krd.Tew. kûçik-Brs.Xwr. tirsandin-Dm.Bor.
“Min kûçik tirsandin”

3.5.2. Kirdeya Lêkerên Hevedudanî

Hin lêkerên hevedudanî yên Zazakî, her çiqas biresera wan a tematîk tune be jî di dema borî de xwedî avaniya ergatîfê ne.

Lêkerên hevedudanî yên Zazakî (Paul, 2009) bi gelemperî ji hêmanek binavkirî

¹⁴ Heman mînak di gundê Textê de wiha ye: “*Cînek sey girot*”. Qertafa mêtê “e” hem di biresera/*sey* ê de hem jî di lêkera/*girot* de ketiye.

(nominal) û komek piçûk a lêkerên gerguhêz pêk tên. Ji bo fonksiyona gerguhêzî û negerguhêzî hêmanên bingehîn lêkerên “b-(bûyin) û ker- (kirin)” in. Wekî mînak *hewn vînavîş* “xewn dîtin”, zûrî kerdîş “derew kirin”, veyn dayîş “deng kirin” Dibe ku temamkera navdêrî (nominal component) cihê biresera tematîk digire.

(33) *Mi* *zî* *zûrî* *kerdî*
 Y.K.1.Krd.Tew. jî derew kirin-Dm.Bor.

“Min jî derew kirin”

Dema ku lêkerê hevedudanî xwedî hêmanek gerguhêz be, di dema borî de kirde ditewe û mirov difikire ev lêker xwedî bireserê ye. Lê di bingehê de ev ne girêdayê bireserê ye, girêdayê gerguhêzbûna lêkerê ye.¹⁵

(34) *Layik-î* *xer kerd*
 kurik- xêrkirin-Dm.Bor.
 Krd.Tew.

“Kurikî xêr kir”

Di hevokên lêkerên hevedudanî de, lêkera sivik a gerguhêz, wekî biresera tematîk tevdi gere û ev lêker qertafa pirjimariyê û yekjimariyê hildigire. Li gorî bingeha vê rastiyê em dikarin bibêjin ku hêmana sivik şûna biresera tematîk digire. Wekî mînak “*Telefon kerd, zur kerd, xer kerd*” (Csirmaz, Ceplová, 2004: 7). Lê li gorî me sedema vê yekîneyê her wekî (Gündoğdu, 2015) ji bo lêkerên hevedudanî yên Kurmancî diyar kiriye, ev lêkerên hevedudanî ku wekî lêkerên unergatîf (lêkerên gerguhêz ên ku kirdeya wan tewandî ye) bi nav dike, ev lêkerên unergatîf wexta bi hêmaneke navdêrî û lêkerê sivik ve tene bikaranîn di nava xwe de dibin lêkerên gerguhêz. Lê ev lêker her çiqas wekî lêkerên gerguhêz kar bikin jî di rastiyê de biresera wan tune ye û tu bandorek li ser bireserê nakin. Wekî mînak lêkera “xwarin” di bingehê de xwediyê biresera tematîk e û wateya nan xwarinê îfade dike. Lê lêkera “sondxwarinê” di rastiyê de ne xwedî biresera

15 Kurmancî jî xwedî heman rewşê ye. Hin lêkerên kompleks ên Kurmancî Haig (2002) wekî (mêzekirin, behskirin dengkirin) ji hela ferhengî (lexical) ve gerguhêz in û ev lêker ji navek û lêkerê pêktên. Her çiqas ev lêker di nav hevoksaziyê de ne xwedî bireserê bin jî ev lêkerên gerguhêz xwedî avaniya ergatîfê ne. Lê li gorî (Gündoğdu, 2015) her çiqas biresera hin lêkerên kompleks ên Kurmanciyê tune be jî. Ev lêker di dema borî de xwedî avaniya ergatîfê ne û rasterast bandorek li ser biresera tematîk nakin. Ev lêker, lêkerên unergatîf in.

tematîk e û pêveber di wateya sondxwarinê de ye (Gündoğdu, 2015: 4). Yanê ev lêker wekî Paul (2009) û (Csirmaz, Ceplová, 2004) di xebatên xwe de diyar kirine, rasterast cihê bireserê nagirin. Wekî mînak lêkera “*dayiş*” di rastiye de xwedî biresera tematîk e û di wateya dayîna tiştek de tê bikaranîn. Wekî “min qelem da te” yan jî “min tiştek da te”. Em zanin ku li vê derê biresereke tematîk heye. Lê lêkera “*pêro dayiş*” di rastiye de ne xwedî biresereke tematîk e û pêveber yan jî lêker di wateya “*pêro dayiş*” de ye.

- (35) *Îne* *da pêro*
P.K.3.Krd.Tew. lihevexistin-Dm.Bor.
“Wan li hev xist”

Kirdeya (35)ê “*îne*” di rewşa ergatîfê de ye. Yanî kirde tewandî ye. Lêkera “*pêro dayiş*” li gorî kesê sêyem hatiye kişandin û qertaf hilnegirtiye û biresera vê hevokê jî tune ye. Ev mînakên jêrê ku aîdê devoka Qulpê ne, li gorî rêbaza vê hevokê hatine rêz kirin.

- (36) *Mêrdek-î* *desmaj girot- Ø*
zilam-Krd.Tew. destnimêjgirtin-Dm.Bor.

“Zilamî destnimêj girt”

- (37) *Dîk-î* *azan da- Ø*
dîk-Krd.Tew. bangkirin-Dm.Bor.

“Dîkî bang da”

- (38) *Eyşan-e* *şer kerd- Ø*
Krd.Tew. şerkirin-Dm.Bor.

“Eyşanê şer kir”

- (39) a. *Ez* *vazdaya (Licê)*¹⁶
. Y.K.1.Krd.Xwr. bazdan-Dm.Bor.

“Ez beziyam”

- b. *Min* *vazda*
Y.K.1.Krd.Tew. bazdan-Dm.Bor.

“Min baz da”

Kêşana lêkera vazdayîş, di dema borî de li gorî devokên Zazakiyê diguhere. Hin

16 Di devoka Qulpê de her du form jî tîn bikaranîn.

-Mi vazda kî (Text)

-Ez vazdawa kê (Arqetîn)

devok forma yekem a (xwerû) bi kar tînin, hin devok jî forma duyem a (tewandî) bi kar tînin. Ev lêker ji mesdera “vaz” û “dayiş” pêk tê. Ji ber ku “dayiş” lêkereke gerguhêz e kêşana (a)yê rast e (Malmîsanij, 2015: 205)¹⁷. Lê wekî ku Gündoğdu (2015) sedema vê diyar kiriye, ev lêkerên unergatîf wexta ku bi hêmanek navdêrî û lêkereke sivik ve tên bikaranîn, di nava xwe de dibin gerguhêz. Hêmanê navdêrê “vaz” û lêkera gerguhêz “dayiş” dema ku bi hev re tene bikaranîn ji hêla teşeyê ve dibin gerguhêz. Hin devokên Zazakiyê forma tewandî bi kar tînin. Hin devok jî forma xwerûyê bi kar tînin.

3.6. DI ZIMANÊN ÎRANÎ DE HEVOKÊN DÛRÎ AVANIYA ERGATÎFÊ

Avaniya ergatîfê, di pêvajoya geşedana zimanên Îranî de gelek baş hatiye belgekirin û di dîroka zimanên Îranî de bi sê qonaxan hatiye kategorîzekirin;

1. Serdema Îraniya Kevn
2. Serdema Îraniya Navîn
3. Serdema Îraniya Modern

Di serdema kevn de S û O ji aliyê rewşê ve nîşaneyek hilnagirin û A bi temamî di rewşa tewandî de ne. Di serdema Îranî ya navîn de, bi gelemperî rewşa morfolojîk ji holê radibe. Di zimanên Îranî yên modern de, avaniya ergatîfê ji avaniyên beşdar "bi" an jî bêyî alîkariya "bûn" careke din derdikeve holê (Dorleijn, 1996: 75).

Dê diyar bibe ku di avakirina xwe ya derbasbûyî de, pir hindik zimanên Îranî; ji Îraniya navîn heya îro avaniya ergatîf ya kevn parastine. Di şûna wê de em cûr bi cûr avaniyên tevlîhev peyda dikin û di nav zimanên Îranî de bi kêmanî çar dereceyên rêzimanî yên O ya bênişan em dikarin destnîşan bikin.

Hevoksaziyên zimanên Îranî

a.) Ergatîf: O xwerû, A tewandî

¹⁷ Heman tişt di Kurmancî de jî heye ku me ji bo formên “axaftin” û “xeber dan”ê bi kar anî. Mînak “baz dan” û “bezîn” di Kurmancî de ya ewil wekî “min baz da” ya duyem wekî “ez bezî(ya)m / min bezîya” tê bikaranîn (Yonat, Aslanoglu, 2023: 16) û dîsa li gorî (Yonat, Aslanoglu, 2023) sedema van forman ji ber ku ergatîfiya kurmancî morfolojîk e, ji hêla sentaktîk ve îşareta ergatîfê (min) û ya nomînatîfê (ez) wekî hevdu tevdigerin.

b.) Notr: O xwerû, A xwerû

c.) Cottewang: O tewandî, A tewandî

d.) Akkûzatîf: O tewandî, A xwerû (Haig, 2008: 187)

Di zimanên Îranî de pêvajoya geşedana avaniya ergatîfê heye û ev geşedan li gorî şert û mercên wan deman guherînek li ser van zimanan çêkiriye. Wekî zimanên Îranî yên din Zazakî jî ji vê guherîne bê par nemaye.

3.6.1. Di Belûcî de Mînakên Cottewangê

Li gorî Farrell (1995: 221 neqil: Korn, 2009: 50) di hevoksaziya Belûcî de bireser dikare hem di rewşa xwerû de be, hem jî di rewşa tewandî de be. Di nava cînavkên Belûciya Karacyê (Başûr) de bêpergaliyek heye. Ev cînavkên kesê yekemîn û kesê duyemîn, di rewşa tewandî de ne.

(40) *kučik-ā* *hamā jīnik-ārā* *dīst*
keçik- jīnik-Brs.Tew. dît-Dm.Bor.
Krd.Tew.
“Keçikê jīnikê dît”

(41) *bæčik-AA* *maa-raa* *diist-Ø*
lawik- em-Brs.Tew. dît-Dm.Bor.
Krd.Tew.
“Lawikê em dîtin” (Farrell, 1989:19 neqil: Mirdehghan, Jahangiri, 2005: 102).

Kirdeya “*kučik-ā*” û biresera “*hamā jīnik-ār*” (40)ê di heman rewşê de ne. Kirdeya “*bæčik-AA*” û biresera “*maa-raa*” (41)ê di heman rewşê de ne.

3.6.2. Di Kurmancî de Mînakên Cottewangê

Di Kurmanciya bakurî de hevokên dûrî avaniya ergatîfê yên herî berbelav avahiyên cottewangê ne (Haig, 2008: 226). Di Kurmanciya Mûşê de ev rewşa ku dikeve pêşberî me em dikarin wekî hevokên cottewandî pênase bikin. Lewre kirde û bireser di rewşa tewandî de ne (Gündoğdu, 2016: 4).

(42)	Gundi-yan	wan	bi zor	ji hev kir- Ø
	Krd.Q.Tew.Pir.J.	P.K.3.Brs.Tew.		Dm.Bor.
(43)	Min	te	dît-Ø	
	Y.K.1.Krd.Tew.	Y.K.2.Brs.Tew.	Dm.Bor.	

Kirdeya “gundiyan“ û biresera “wan“ a (42)ê û kirdeya “min“ û biresera “te“ ya (43)ê di heman rewşa tewandî de ne. Lêker jî li gorî kesê sêyemîn hatiye kişandin.

3.6.3. Di devoka Qulpê de Hevokên Dûrî Avaniya Ergatîfê

Ji ber têkîliya zimanên biyanî, di hevoksaziya zimanên Îranî yên navîn de avaniya ergatîfê derketiye holê. Lê hin zimanên Îranê ev avaniya ergatîfê di nava xwe de neparastine û vegeyirane avaniya akûzatîfê. Wekî mînak Farisiya nû tenê xwedî avaniya akûzatîfê ye. Di zimanê Kurmancî de avaniya ergatîfê dest bi guherînê kiriye lê negihiştiye asta xilasbûnê. Zimanên wekî Zazakî, Goranî û Pêştûnî avaniya ergatîfê hê jî diparêzin (Arslan, 2016; 12-13). Di nava zimanên rojavayê Îranê de Zazakî bi gelemperî avaniya ergatîfê hê jî diparêze (Todd, 2002[1985] neqil: Opendin & Anuk, 2015: 1). Ji ber ku li ser hevoksaziya zaravayên Zazakiyê xebatên berfireh nehatine kirin, mirov dibêje qey Zazakî di bin bandora guherînên rêzimanê de nemaye û ev avaniya xwe ya kevn diparêze. Lêbelê di vê lêkolînê de bi ronîkirina daneyên devoka Mûtîkî yên ku berê nehatine teswîrkirin, em ê nîşan bidin ku di hevoksaziya zaravayên Zazakî de jî guherînên berbiçav hene (Opendin&Anuk, 2015: 1). Dîsa Gündoğdu (2022) di xebata xwe ya li ser devoka Qulpê de behsa hevokên dûrî avaniya ergatîf a kanonîk dike.

Tablo 3.3. Cînavkên devoka Qulpê

	Cînavkên Xwerû	Cînavkên Tewandî
Y.K 1	ez/e	min/mi
Y.K 2	ti	to/tu
Y.K 3	o (nêr)	ê
	a (mê)	aye/ay
P.K 1	ma	ma
P.K 2	şima	şima
P.K 3	ê	êna/îna/îne/in

Tablo 3.4. Di devoka Qulpê de Qertafên Xwerû û Tewardî

	Qertafên Xwerû (Xwr)	Qertafên Tewardî (Tew)
Y.J.M	-î (i)18/-e/-a/-ø	-î (i) /-e/-a/- ø
Y.J.N	- ø/-e	-î
P.J	-î/-ey	-an/-a

3.6.3.1. Di Zazakî de Mînakên Cottewangê

Di dema borî de, hêmanên pirjimar A û O carna di rewşa tewandî de ne (Öpengin&Anuk, 2015: 5)19

- (44) *Sipe-ya* *mi* *tersn-a*
- kûçik- Y.K.1.Brs.Tew. tirsandin-Dm.Bor.
Krd.Q.Tew.Pir.J.
- “Kûçikan ez tirsandim”

- (45) *Kutik-an* *mi* *tersna*
- kûçik- Y.K.2.Brs.Tew. Dm.Bor.
Krd.Q.Tew.Pir.J.
- “Kûçikan ez tirsandim”

Kirdeyên “*Sipeya* û *Kutikan*” yên (44 û 45)ê û bireserên “*mi*” yên (44 û 45ê di heman rewşa tewandî de ne.

18 Ev qertaf tenê li gundên Textê û Kûyê tê bikaranîn. Mînak: *Zeyn-i şî* “Zeynê çû”

19 Ev lêkolîn li ser devoka Mûtîkîyê hatiye çêkirin.

têkiliya wan bi televizyonê re dereng çêbûye. Ji ber vê yekê têkiliya wan a bi zimanê Tirkî re jî dereng çêbûye. Ji vî gundî berjêrtir gundê “Arqetînê” heye û di awaftina vî gundî de em tenê rastê hevokek cottewandî hatin. Di vê hevokê de kirde û bireser di rewşa tewandî de ne û lêker li gorî bireserê tê kişandin. Dema ku em ji vî gundî jî berjêrtir tên gundên wekî “Kerkikan, Seyrikî, Herta, Text û Zêrûg” ku zêdetir têkiliya wan bi gundên Kurmancîaxêv re heye û ji van gundan zûtir bi zimanê Tirkî re têkiliya wan çêbûye, di axaftina wan de em zêdetir rastî hevokên dûrî avaniya ergatîfê hatin. Herwiha ev jî nîşanê me dide ku gundên têkiliya wan zêdetir bi hevdu re tune ye û têkiliya wan bi zimanê Tirkî re dereng çêbûye vê avaniyê hê jî diparêzin ku gundê “Kû” yê ji bo me mîna keke girîng e.

Niha ji bo mijara me zelaltir bê fêmkirin me di wêne.3.1.ê de nexşeya gundên Qulpê ku Zazakî lê tê axaftin derxist. Gundên ku di axaftina wan de zêdetir hevokên dûrî avaniya ergatîfê derdikevin holê bi şiklê gilover, yên ku hêdî hêdî ber bi dûrbûnê ve diçin bi şiklê çargoşe, ewê ku hê jî vê avaniyê diparêzin bi şiklê sêgoşe hatine îşaretkirin.



Wêne 3.1. Nexşeya Gundên Qulpê ku Zazakî tê Axaftin

3.6.3.4. Kirdeya Lêkerên Negerguhêz

Di lêkerên negerguhêz de rewşekî awarte tune ye. Li gorî avaniya ergatîfê ya kanonîk kirde xwerû lêker dema borî li gorî kirdeyê hatiye kişandin.

(57) *Ez* *kewta*

Y.K.1.Krd.Xwr. ketin-Dm.Bor.

“Ez ketim”

(58) *Ez* *amîy-a22*

Y.K.1.Krd.Xwr. hatin-Dm.Bor.

“Ez hatime”

(59) *Ê* *kewtê* *awu*

P.K.3.Krd.Xwr. ketin-Dm.Bor. av

“Ew ketine avê”

(60) *Ê* *remê*

P.K.3.Krd.Xwr. revandin-Dm.Bor.

“Ew reviyar”

22 Li gorî tesbîta Öpengin&Anuk (2015) di devoka Mûtîkî de kirdeya lêkera negerguhêz di rewşa tewandî de ye. Mînak: *Mi vizêr ame itye*

Krd.Tew. Dm.Bor.

“Ez do hatim vê derê”

3.6.3.5. Di Lêkerên Gerguhêz de Kirdeya Xwerû

(61) *Ti* *mi* *dîy-a23*(Text)

Y.K.2.Krd.Xwr. Y.K.1.Brs.Tew. dîtî-Dm.Bor.

“Te ez dîtîm”

(62) *Ti* *sey* *da* *mi*

Y.K.2.Krd.Xwr. sêv-Brs.Xwr. dayin Y.K.1.Tew.

“Te sêv da min”

(63) *Esker-î* *tivîng-î* *kuway* *ma (Zêrûg)*

leşker-Krd.Q.Veq.Pir.J. tivîng-Brs.Xwr. lêdan-Dm.Bor. P.K1.Tew.

“Leşkeran tivîng li me dan”

Ev hevokên jorê ku me rêz kirine aîdê gundê “*Textê*” ne. Wekî me berê jî gotibû di vî gundî de tenê cînavka xwerû ti heye û ev hevok li gorî vê yekîneyê hatine rêzkirin. Hevoka (54)an ku aîdê gundê “*Zêrûgê*” ye, kirdeya vê hevokê “*eskerî*” jî di rewşa xwerû de ye. Li gorî van hevoksaziyan avaniyek wiha derdikeve: Kirde xwerû Bireser Xwr Lêker dema borî

Di zimanên Îranî de bi gelemperî wendabûna tewangê di navên yekjimar de derdikeve holê (Haig, 2008: 140). Li gorî tespîta Haig em dikarin bêjin ku di gundê “*Textê*” de cînavkên tewandî “to û tu” wenda bûne û cînavka xwerû “ti” şûna wan girtiye.

Di Kirmanckî de lêkera gerguhêz a “*persayene/persayiş*” di dema borî de li hin herêman li gorî cînavkên tewandî, li hin herêman jî li gorî cînavkên xwerû tê kişandin. Ji ber ku persayiş lêkereke gerguhêz e li gorî avaniya ergatîfê kişandina koma yekî rast e. (Malmîsanij, 2015: 201).

23 Ji xeynî vê gundê di gundê Metmûrê de jî cînavkên tewandî yên “to/tu” wenda bûne. Ev gund girêdayê navçeya Licê ye lê nêzikê vê gundê ye.

Mînak: *Ti dî mi ti ra va*

Krd.Xwr. Dm.Bor.

“Te dît min ji te re got”

Tablo 3.5. Cînavkên ku li gorî Lêkera Persayîş Hatine Kişandin

Zazakiya Licê	Zazakiya Pîranê
<i>mi persa</i>	<i>ez persawo</i>
<i>to persa</i>	<i>ti persay</i>
<i>ê/aye persa</i>	<i>yo/ya persay</i>

Malmîsanij (2015) di gotinên xwe de dibêje ku bikaranîna cînavkên tewandî li gorî avaniya ergatîfê rast e. Lê li gorî rêbazên zimannasiyê mirov nikare bibêje ku ev deverên din ên ku cînavkên xwerû bi kar tînin xelet in. Wekî ku me berê jî di gotina Haig (2008) de diyar kiribû ev formên tewandî li hin deveran hêdî hêdî wenda dibin. Ev tablo nîşanê me dide ku li devoka Pîranê ev forma tewandî wenda bûye.

Di vê beşê de hevokên dûrê avaniya ergatîfê, ji daneyên ku aîdê devoka Qulpê û devoka Mûtkiyê ne, hatin rêzkirin. Em ê avaniyên ku dûrî avaniya ergatîf a kanonîk in, li gorî xebata Gündoğdu (2017) ku li ser Kurmanciya Mûşê ye, li gorî devoka Qulpê nîşan bidin.

Avaniyên Kurmanciya Mûşê


- | | | |
|----------------------------------|-------------------------------|-------------------------------|
| a. Kirde <i>tewandî</i> | Bireser <i>tewandî</i> | Lêker \emptyset |
| b. Kirde <i>tewandî</i> | Bireser <i>tewandî</i> | Lêker <i>girêdayî Kirdeyê</i> |
| c. Pj.K.3 Bireser <i>tewandî</i> | Lêker <i>girêdayî Kirdeyê</i> | |
| d. Kirde <i>xwerû</i> | Bireser <i>tewandî</i> | Lêker <i>girêdayî Kirdeyê</i> |

Avaniyên devoka Qulpê

- | | | |
|-------------------------|------------------------|--------------------------------|
| e. Kirde <i>tewandî</i> | Bireser <i>tewandî</i> | Lêker \emptyset |
| f. Kirde <i>tewandî</i> | Bireser <i>tewandî</i> | Lêker <i>girêdayî Kirdeyê</i> |
| g. Kirde <i>xwerû</i> | Bireser <i>xwerû</i> | Lêker <i>girêdayî Bireserê</i> |

Di devoka Qulpê de, di Mînakên cottewandî de kirde li gorî avaniya ergatîfê tê tewandin. Bireser jî li gorî avaniya akûzatîfê tê tewandin. Ji xeynî vê yekê di avaniya

ergatîfê de lêker li gorî bireserê tê kişandin lê di mînakên cottewandî de lêker li gorî bireserê nayê kişandin. Mînakên ku me ji bo ergatîfa kanonîk û hevokên dûrî avaniya ergatîf a kanonîk dan, vê rewşê bi awayekî zelal eşkere dikin. Dema ku em vê rewşê bînin berçav hevokên devoka Qulpê dûrî pênaseya Dixon (1994) ya ergatîf kanonîk dimînin. Di avaniya ergatîfa kanonîk de S û O di heman rewşê de ne. Di devoka Qulpê de O û A di heman rewşê de ne.



3.7. SEDEMA DERKETINA HEVOKÊN DÛRÎ AVANIYA ERGATÎF A KANONÎK

Di avaniya ergatîfa kanonîk de, kirde di rewşa tewandî de ye, bireser di rewşa xwerû de ye û lêker li gorî bireserê tê kişandin. Lê di Zazakiya Qulpê de hevokên dûrî avaniya ergatîf a kanonîk de hem kirde hem jî bireser di rewşa tewandî de ne. Ji xeynî hevokên cottewandî. Hevokên din ên ku dûrê vê avaniyê ne, di bin serenavan de hatine rêzkirin. Em ê niha li ser sedema derketina van hevokan bisekinin.

Têkîliya zimanê Zazakiyê ku xwedî avaniyên akûzatîfê û ergatîfê ye, bi zimanê Tirkî ku tenê xwedî avaniya akûzatîfê ye re heye. Wekî tê zanîn di wê erdnîgariyê de ku Kurd tê de dijîn, zimanê Tirkî serdest e û bandor li ser zimanên wekî Kurmancî û Zazakî kiriye. Di zimannasiyê de ji vê rewşê re dibêjin “têkîliya zimanan”.

Dibe ku ji ber têkîliya zimanê Tirkî ya bi zimanê Zazakiyê re ev hevok derketine holê. Ji xeynî vê yekê îhtîmalek din ev e ku sedsal berê di vê herêmê de Ermenî jiyane û bi bav û kalên me re di nava têkîliyê de bûne. Dibe ku bandora vî zimanî jî li ser Zazakî çêbûye. Zimanê Ermenî jî wekî zimanê Tirkî tenê xwedî avaniya akûzatîfê ye. Em dikarin wekî mînak zimanê Kurmancî jî nîşan bidin ku di navçeya Qulpê de her du ziman jî tîn axaftin. Hejmara Kurmancîaxêvan ji hejmara Zazakîaxêvan zêdetir e û zimanê serdest dîsa Kurmancî ye. Dibe ku ji ber van sedeman ev hevok derketine holê û avaniya ergatîfê ber bi avaniya akûzatîfê ve hereket dibe. Li gorî rêbaza zimannasiyê, di zimanekî de tevgera hevokan rewşeke normal e. Ji bo vê rewşê pêvajoya dîroka zimanê Farisî mînakeke îdeal e. Farisiya kevin tenê xwedî avaniya akûzatîfê ye, di Farisiya navîn de

(71) a. *Wi* *bawer ke-r-o*
Y.K.3.Krd.Tew. bawerkirin-Dm.N.

“Ew bawer dike”

b. *Heyî* *gi-r-ê*
P.K.3.Krd.Tew. girtin-Dm.N.

“Ew digirin”

c. *Heyî* *şê-n-ê*
P.K.3.Krd.Tew. çûyin-Dm.N.

“Ew diçin”

Malmisanij di van mînakên xwe de li ser kêşana lêkerê sekiniye û bal kişandiye ser nebikaranîna tîpa “n”yê. Lê xalek girîng li vê derê heye ku li gorî avaniya akûzatîfê divê kirdeyên van hevokan di rewşa xwerû de bin. Lê ev kirde di rewşa tewandî de ne. Kirdeyên tewandî “wî û heyî” divê di rewşa kirdeyên xwerû “o û ê” yê de bûna. Rewşa awarte ew e ku kirde di rewşa tewandî de ye.

Ji bo vê mînakê em dikarin xebata Akbaş ya (2020)an ku li ser devoka Hekariyê ye, mînak nîşan bidin. Lewre heman rewşa awarte di devoka Hekariyê de jî heye.

“Herêma Rûbarokê (Nav Gerdiyan) ku li ser sînori û nêzîkê Soranê cih digire ji aliyê rêzehevoka akûzîtf ve hin rewşên awarte xuya dibin. Ji wan rewşên awarte yek; ku me li jor jî diyar kiribû; ji bo pirjimara kesê sêyemîn hem ji bo rewşa tewandî hem jî ji bo rewşa xwerû heman cînavka “hingo” tê bikaranîn. Ji ber ku ev cînavk ji herêma Şemzînan bi gelemperî di rewşa tewandî de tê bikaranîn, di pergala akûzîtf de tevliheviyek derdikeve meydanê.”

(72) *Hingo* *nan* *xwar*
P.K.3.Krd.Tew. Brs.Xwr. Dm.Bor.

(73) *Hingo* *hatin (avaniya akûzîtfê)*
P.K.3.Krd.Tew. Dm.Bor.

Ev mînakên dûrî avaniya akûzîtfê, li gorî avaniya ergatîfê hatine kişandin.

ENCAM

Zazakî di bin şaxa zimanên Îranî yê bakûrê rojavayê de cih digire û li başûrê rojhilatê Tirkiyê tê axaftin. Ev ziman bi gelemperî li ser sê zaravayan tê dabeşkirin. Zaravayê bakur, zaravayê başûr û zaravayê navendê. Lê li gorî zimanên din yê dinyayê devokên Zazakî ji lêkolînên zimannasan dûr mane. Ji van devokan yek jî devoka Qulpê ye ku Keskin (2015) vê devokê wekî herêma derbasbûyî nîşan dide, ji van lêkolînan bêpar maye. Navçeya Qulpê ji ber pozîsyona xwe ya erdnîgariyê, li gorî zarava ango devokên din yê Zazakiyê hin taybetiyên cuda di nava xwe de dihewîne. Di vê xebatê de bi taybetî devoka Qulpê li gorî rêbazên zimannasiyê hatiye analîzkirin:

- 1- Zazayên ku di nava erdnîgariya Tirkiyê de dijîn xwedî serjimareke girîng in. Serjimara Zazayan piranî li Çewligê û Dêrsimê ye. Li bajarên wekî Elazîzê Dîyarbekirê û Erzîncanê jî xwedî serjimareke girîng in. Zaza li gorî ciyawaziyên erdnîgariyê wekî “*Zaza, Kird, Kirmanç û Dimilî*” tên binavkirin. Ji xeynê ciyawaziyê binavkirinê; di derbarê Kurdbûna Zaza û Zazakî ziman e an zarava? de jî hin ciyawazî hene. Li gorî hin zimannasan Zaza Kurd nîn in û Zazakî jî zimanekî Îranî ye. Li gorî hin zimannas an kesan jî Zaza Kurd in û zimanê wan jî zaravayê Kurdî ye.
- 2- Me di vê xebata xwe de bi taybetî li ser fonksiyonên tewangê sekinîn. Di vê mijarê de sedî sed nebe jî di devoka Qulpê de hin rewşên cuda hatin diyarkirin. Ji ber ku me mijara xwe di bin serenavan de dabeş kiriye, em ê li gorî rêzkirina van serenavan cudahiyan bi kurtasî destnîşan bikin. Di ravekê de cudahiya herî berbiçav; ji xeynê gundê “*Zêrûgê*” di gundên din de wendabûna qertafa mê/a ye. Herwiha di van gundan de ev qertaf veguhestiye qertafa nêr/ê ye. Ji xeynê vê yekîneyê dîsa gundê “*Zêrûgê*” wekî Zazakiya başûrî di ravekê de xwedî forma “da/dê” ye. Cudahiyeke din jî ev e ku gundê “*Textê*” ji bo pirjimariyê qertafa “î”yê bi kar tîne. Di mijara daçekan de; Taybetmendiya herî ber bi çav ew e ku navdêrên cinsî yê ku xwedî zayenda nêr in, di rewşa xwerû de ne. Li gorî tespîtkirina me hem di devoka Qulpê de hem jî di Zazakî de ev navdêrên cinsî yê nêr dema ku bi daçekan ve tên bikaranîn di rewşa xwerû de ne. Ji xeynê vê yekîneyê di gundê “*Zêrûgê*” de daçeka “ra” yê wenda bûye. Di gundê “*Textê*” de cînavka tewandî “to” wenda bûye. Di mijara

hêmana piştî lêkerê de; dîsa taybetmendiya herî ber bi çav ew e: Navdêrên nêr dema ku li paşya lêkerê/pêverberê cih digirin dîsa di rewşa xwerû de ne. Ji xeynî vê yekineyê di gundên “*Zêrûgê, Kerikanê, Hertayê û Seyrikiyê*” de navdêra “*aw*” ku xwedî zayenda mê ye di rewşa xwerû de ye. Di mijara ji aliyê girtiyarekî ve neqilkirin de devoka Qulpê xwedî sê cure hevoksaziyê ye. Ev hevoksazî li gorî cureya lêkeran saz dibe. Lêkera “*dayiş*” her tim li pêşya hêmanê girtiyar e û hêmanê piştî xwe ditewîne. Lêkerên wekî “*şirawutiş, vatiş, ameyiş û ardiş*” dema ku bi daçekek re tên bikaranîn, hêmanê girtiyar li pêşya van lêkeran cih digire. Lêkerên wekî “*berdiş û ardiş*” jî; hêmanê girtiyar dikare hem li pêşya wan hem li paşya wan cih bigire. Di mijara banglêkirinê de; qertafên tewandî yên devoka Qulpê ev in; mê “*a/ê*”, nêr “*o*”, pirjimar “*no*” ev qertafên tewandî ne. Di mijara tewangê de di rewşa hokerê de, cureya peyva ku demê diyar dike her tim di rewşa tewandî de ye.

- 3- Em di beşa sêyemîn de bi taybetî li ser avaniya ergatîfê sekinîn û me mînakên zimanên Îranî yên wekî Kurmancî, Belûcî û Zazakî dan ber hev. Li gorî (Haig, 2008) zimanên Îranî xwedî du rewşan in. Rewşa xwerû û rewşa tewandî û hevoksaziya van zimanan jî bi vî awayî ye:

Akûzatîf: A Xwr O Tew Lêker li gorî kirdeyê tê kişandin

Ergatîf: A Tew O Xwr Lêker li gorî bireserê tê kişandin

Ev her sê ziman jî xwedî heman avaniya ergatîf a kanonîk in. Lê her çiqas ev ziman xwedî van avaniyan bin jî, di pêvajoya demê de hin guherîn di hevoksaziya wan de çêbûne û guherînên herî berbelav jî hevokên dûrî avaniya ergatîf a kanonîk in. Di avaniya ergatîfê de wekî me berê jî diyar kiribû kirde tewandî, bireser xwerû û lêker di bin bandora bireserê de ye. Lê hin hevok hene ku me wekî mînakên cottewandî bi nav kirin, di van hevokan de kirde û bireser di heman rewşa tewandî de ne. Ji ber ku mijara me devoka Qulpê ye em ê li gorî hevokên ku me di teza xwe de analîz kirine bi kurtasî destnîşan bikin.

Li gorî tespîta me, ji heft gundên Qulpê ku me ji bo avaniya ergatîfê dane berhev kirine; di navbera van gundan de gundê “*Kûyê*” ku li jor di xeta Qulpê

de cih digire û ji aliyê erdnîgariyê ve ji gundên din dûr e hê jî avaniya ergatîf a kanonîk diparêze. Lê em di axaftina şeş gundên din de rastî hevokên dûrî avaniya ergatîfê hatin û hevokên herî berbelav hevokên cottewandî ne. Ji xeynî van hevokan em rastî hin hevokan hatin ku lêker gerguhêz e lê kirde di rewşa xwerû de ye. Di mijara akûzatîfê de em rastî hevokên awarte nehatin. Sedema derketina van hevokan jî ya “têkêliya zimanan” e yan jî “guherîna navzimanî” ye.

Mebesta vê xebatê ew bû ku, di Zazakî û devoka Qulpê de fonksiyonên tewangê bi çî awayî ne, li wan binêre û bi çavekî zimannasî analîz bike. Herwiha xebat, ji serî heya dawiyê bi daneyan hat piştrastkirin ku bi taybetî ji vê navçeyê hatin berhevkirin. Hêvî dikim ku ev mijarên ku ji lêkolînan bêpar mane ji aliyê lêkolîner, zimannas û kesên ku bi van mijaran ve mijûl dibin, xebatên berfirehtir bînin kirin.

ÇAVKANÎ

- Akbaş, S. (2020). “Hakkari Kurmancisi Grameri Üzerine Bir Analiz” (Yüksek Lisans Tezi). Muş Alparslan Üniversitesi. Sosyal Bilimler Enstitüsü. Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı.
- Alay, O. (û ynd). (2019). *Sözden Yazıya Zazaca*. Stenbol: Peywend Yayınları.
- Arslan, İ. (2016). Zaza Dilinde Ergativ Sistemin Tarihi Gelişimi. *Munzur Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*. Cilt 4, r. 8.
- Çağlayan, E. (2016). *Zazalar, Tarih, Kültür ve Kimlik*. İstanbul: İstanbul Bilgi Üniversitesi Yayınları.
- Çem, M. (2003). *Kırmancca (Zazaca) Gramer*. İstanbul: Deng Yayınları.
- Çem, M. (1996). *Alevilik, Kurmanci-Kırmancki (Zazaki) ve Dersim Üzerine Kimi Yanlış Bilgiler*. İstanbul: Deng Yayınları.
- Dixon, Robert M. W. (1987). Studies in Ergativity. In *Lingua: International Review of General Linguistics* 71:1-16.
- Doğan, M. (2023). “Differential Case Marking on Adpositional Complements in Zazaki” Masterarbeit, 30 ECTS. Bamberg: Otto-Friedrichs-Universität Bamberg.
- Dorleijn, M. (1996). *The Decay of Ergativity in Kurmanji: Language Internal or Contact Induced?* Tilburg: Tilburg University Press.
- Gökalp, Z. (2013). *Kürt Aşiretleri Hakkında Sosyolojik Tetkikler*. İstanbul: Toker Yayınları.
- Gündoğdu, S. û Bulan, A. (2023). “Ezafe in Zazaki” *Toronto Working Papers in Linguistics (TWPL)*, Volume 45. <https://doi.org/10.33137/twpl.v45i1.41679>.
- Gündoğdu, S. (2016). “Noun-Verb Complex Predicates in Kurmanji: a syntactic account.” *Proceedings of the 23rd Conference of the Student Organization of*

- Linguistics in Europe (ConSOLE XXIII), 383-405.
- Gündoğdu, S. (2017). "Variation in the Ergative Pattern of Kurmanji", *Wiener Jahrbuch für Kurdische Studien*, 5: 45-63.
- Gündoğdu, S. (2019). "Asymmetries in Kurmanji Morphosyntax" in *Bamberg Studies in Kurdish Linguistics*, University of Bamberg Press. Vol. 1, 93-116.
- Gündoğdu, S. (2022). "Retention Zones in Zazaki" *Endangered Languages Colloquium*, Istanbul Bilgi University.
- Gündüz, D. (2013). *Zazaca/Krmancca Dil Dersleri*. İstanbul: Vate Yayınları.
- Haig, G. (2002). Noun-plus-verb complex predicates in Kurmanji Kurdish argumentsharing, argument incorporation, or what? *Sprachtypologie und Universalienforschung: STUF*, r. 15-48.
- Haig, G. (2008). *Alignment change in Iranian languages: A construction grammar approach*. Berlin: Mouton.
- Haig, G. û Öpengin, E. (2014). "Introduction to Special Issue Kurdish: A critical research overview" *Volume: 2, No: 2, r. 99 – 122. Kurdish Studies – International Peer-Reviewed Scholarly Journal*.
- İzady, M. R. (2013). *Bir El Kitabı Kürtler*. İstanbul: Doz Yayınları.
- Keskin, M. (2015). "Zaza Dili" *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi* Yıl:1, Cilt:1, Sayı:1, r. 93-114.
- Korn, A. (2009). The Ergative System in Balochi from a Typological Perspective. *Iranian Journal of Applied Language Studies*, 1, r. 43-79.
- Lezgin, R. (2015). Kürtçede Akuzatif-Ergatif Özellik. *Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi*. Cilt 1, Sayı 2, r. 85.

- Malmîsanij, M. (2015). *Kurmancca ile Karşılaştırmalı Kirmancca (Zazaca) Dil Bilgisi*. İstanbul: Vate Yayınları.
- Malmisanij, M. (1996). *Kird, Kirmanc, Dimili ve Zaza Kürtleri*. Stenbol: Deng Yayınları.
- Mirdehgha, M. û Jahangiri, N. (2005). Split-Ergative Morphology in Hindi/Urdu, Pashto & Balochi Languages. Vol. 12, r. 93-122. Split-Ergative Morphology in Hindi/Urdu, Pashto & Balochi Languages naghme ghasemi - Academia.edu.
- Paul, L. (1998). *Zazaki: Grammatik und Versuch einer Dialektologie*. Wiesbaden: Reichert Verlag.
- Paul, L. (2009). Zazaki. In Windfuhr (Ed.). *The Iranian Languages*, (r. 545–586). Routledge.
- Paul, L. (2011). Die Herkunft und Stellung des Zazaki und Das Verhältnis von Sprache zu Ethnie. I. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu. Bingöl Üniversitesi Yayınları (r. 1924).
- Selcan, Z. (1998). *Grammatik der Zaza-Sprache: Nord-Dialekt (Dersim-Dialekt)*. Berlin: Wissenschaft & Technik Verlag.
- Veroj, S. (2014). *Veracêkerdena Gramerê Zazakî û Kurmancî/Hevberkirina Gramera Zazakî û Kurmancî*. İstanbul: Ava Yayınları.
- Yonat, M. û Aslanoğlu, O. (2023). “Analîzek li ser Avaniya Ergatîfê - Devokên Kurmancî yên Başûrê Rojhilat, Bakûr û Başûrê Rojava” *Kovara Kurdînameyê ya Navnetewî*, Jimar: 8, r. 13-40. <https://doi.org/10.55106/kurdiname.126584>.

PÊVEK

DEŞÎFREYA DENGAN

1. Ali ŞEKER, temen, 70, gundê Zêrûg

Amîna ti bi xeyr a amîya. Amîna ti torina Hecî Cebardê pîrikê Zîn a efendime soyle Hecî Cebardê merdimêdo dînel mînel ib fena homay yanê kam ro ci bitefeqayê îşê cîne qedênayê şîyê. Rocêk perê xu ke nêwaştê vatê filan roce bîyarê o reyna nêwaştê. E zî ke rocêk ro tefeqyawa min va va ti amey çî şew a e bawer ke enê çaxî bî ke mi va wele hal û mesele ana mi rê tay pery lazim ê. Va çende to rê lazim ê mi va wele dorê se se milyon se kaxit ib çîdo ewna bi o çax pery qîymetlî bî. Wele mêrdekî ardî day mi nêva ti çî çax danê ke wele mi va ez go filan roce to rê bîyarî va tamam. Wele qewlê cê ame mi perê cê berdî şî perê cê day ci. Va ecele bi yanê to ardî mi va çik nêbeno virazyay min ardî o to ra vacî wele carna ma merengozî bî ma îşê kerekican qedênayê. Îşê meleda dîyarî da warî efendime soyle wele fena homay kerekan di nan û awdê xu rê ser a çin î. Efendime soyle wexto gi mi newe başlemîşê merengozî kerd Salih lacê mi, xalo Mehme Şerîfdê adî namê pîrekda cê Zayda bî. Efendime soyle heta tîya ra şîyê o di niqlî şîyê doleke bi şewe o û Zayda pîya di niqlî titûn ardê o destê mi de ke xîzar antê fena homay Zayda ke yanê merdimêda ewna bî. Êmekê caye her çî caye çîdo temîz temîz viraştê nanê caye amey werî. O to ra vacî ewca ra xala mi Safe xura zaten xala mi Safe ay ke wele e ci rê xebetyaya reyke di rey e ci rê xebetyawa yanê son model bîya. E babdê to rê xebetyawa son model bî ez kalikdê to rê xebetyawa Evdilay rê xebetyawa yanê kerekan de joydo gi nêxebetyawa Qeredayî xura zaten e zef Qeredayî rê xebetyawa. Min û Qeredayî ma zef hevaltî jobîn de kerda. O to ra vacî wele de îşê dînya ewna wo. O wele rocêk Evdila ame mi ra va va wele kulfetê mi rehmet kerdo hebêk cenî mi rê lazim a. Hebêk cenî pasor de bî e şîya mi va ya cenekî ti Evdilay gêna nêgêna va dê vinde ez Evdilya bivînî Evdila dî Evdila ke xo nêviraştê hema henû Evdila henû amo mi dî ceneke mi dî ro Evdila awna va wele quran va xweşik nin e. Kurmancî va va wele xweşik nin e. A wele bi eno qayde o Elî ke min û Elî ma zef hevaltî jobîn de kerda. Min û Elî ma zef hevaltî jobîn de kerda. Ma vaşê ewkî girot ma vaşê lacdê Hecî Berî girot Saîm fena homay o ke ma dir xebetyayê. Eno sade wesfê kerekican kena ez o ke ma dir xebetyayê ê min vaştirû destê mi da ê ke qirime destê mi da. Ê çî hewt berdî mi çî şeş berdî wexto ma çî qedêna mi dî va Elo Elo Elo Elo va to mi ê min berdêk zêda to çîyo mi va tamam o wele ma henî ewca ra nat amey

şewêk amey ma kêdê cê de mendî ma se serê xu şande na ro ma bi xu nêhesyay ma şeveq de awna te ra şeveqî daw şeveqî daw bîyo ewk o wele Amîna ma vacê çi ma dinya de zef geyray ke ma wexto şîyê îş ma ro dere mere nêawnayê ro çamûr nêawnayê ro vewre nêawnayê hema tî ke şîyê Bêînî peydê kerekan o kewtê ro dîyar û satar o dîrekmen şîyê. Eyro ke çîmikî kewtê mi ver e nêşkena ray ra şêrî meselê min û Hecî Cebarî wele bi eno qayde. Rocêk Tesîm ame va berê min estê ma ê rê berî viraştî ardî day pero şande ma kê şîma o eka viraştî hetê cêrî hema rehmetî ewke weşe bî iii rehmetîya namê caye çi wa kulfetê ewkî kulfetê biradê iii çi wo namê cê mi kerdo xu vîr a. Tesîm nê o bîn iii o birayê şîma o biray... ma ê ke viraştî to ra vacî de wele dinya ewna bî. Mela cêrî mi Hecî Xalitî rê viraştî embarî mi viraştî çîdo entîke hebêk tornavîda mi te de mende mende. Şî vîst sere qedeya vîst hîris sere qedeya badê hîris sere embarî şay we embarî şay we hema tornevîda mi ci ra vete. Tornevîda ci ra vete e şîya iii kulfetê cê ewca bî Şazîma mi va wele Şazîma va wele tornevîda na etya badê Hecî Xalit pê hesya va wele e pê bihesyê mi nêday to. O wele henî raşt vatê nêzana bi xeseyî vatê nêzana ma min çares serî titûn ramito çares serî min û ena xanime ma çares serî titûn ramito. Mi hebêk motor girote çares serî mi şuxulna nêva çit. E şîyê îş aye şîyê motor şuxulnayê titûn awdayê. Efendime soyle ma bi şewe ez û a tenê bî ma iii roc ma şewe di palasî titûn eştê kê fena homay rokê pîsmamdê ma Salihî Salih eno cîranê ma wo ê ke amey hetê ma îne yardimêdo baş day ma. Min titûn min serêk vet min nee heşt sey kîlo min titûn vet. Mi heşt sey kîlo titûn vet mi berd şî şî alim titûnê qulpdê o verî ame titûnê qemikan ame titûnê to ra vacî şarî nêame kesber ame ê mi ser o vindert titûnê min a sere tamamê qulpî zêdetirî da pero bîr nûmara da pero. Wele min ti perê xu girotî hebêk birayê mi bib o çax se kaxitê o çaxî se hezarê o çaxî min qelenê cê da se hezarê o çaxî eka nîzdîyê iii hema nîzdîyê hewt sey milyardê eka yo mi qelenê cê da o mi ra bib cîya heqê xu ke mi ra girot to ra vacî her çîyê xu o sonice reyna mi qelenê cê da. Mecbûr ma se kerî ma ewna ewk virazyay şewatê qulpî virazyay. Ez qulp de bî e qulp de bî e şîya dewêk a dewe e rocêk tede menda mi dî vengê topan yeno qerebalix o fizat o dûman vurzeno we e kewta ra bîya berz mi awna qulp soto adir kewto qulp. Qêrî ya ewk a panzêr a dana pero topan erzena koyan wele mend bi moxreb ez amîya amîya mezra pasorî ez û de hebê bînî amey ma awna te ra de heb merdimî hay bindê ereba de jo misqalê naleno mi va xeyr o se bîyo bi şîma va wele gule gunaw tîyadê mi ro a gule naw tîyadê mi de vecyaw min ard o merdim mi va şîma şikenê erena ji kam ereba şikeno biramê ê joyî va e şikena o va o ke şofêr o va e zî ke şikena de mi va o zeman

ereba qine ser berade erdo şeqoqin (Kaygan) eger jo ma nêvînê tivinga nêkuwê ma wa
 bidîyey eskerî tivîngî kuway ma ma ereba bereda erdo şeqoqin efendime soyle ma ewca
 ra o merdim mi be a ereba arde çemê şekiran min û ê merdimê bînî ma a ereba kolîyan
 kerde venge. Mi o merdim kerd mîyandê betanî ard ard dewlet xestexanesî ewca hebêk
 hevalê mi bib doxtor mi berd şî emelîyat kerd o gule ci ra vet o yatirmîş kerd. Serê sibey
 ez amîya Bûrhanê ma ke dikan do eno Bûrhanê ma dikan de ma nêzanê eger se bîyo senkî
 bîyo nêzanê roca badê coy ma ende dî dême o ke kewtib dere dere dere û dere fetelyabi
 ame risa ma mezrada pasorî de ma o ke ard çî serê to bicacnî hewt heşt rocî mend badê
 hewt heşt rocî henî serbest bi mi qamyonêke darî qamyonêk darî mi ardî ewca makînê xu
 ke mi sokmîş kerdî. Ez bena dîyarbekir ez geyrawa joydo gi mi rê makînanê mi bar kerê
 çin yê. Wele hebêk kebçeçî camêr o wele ame makînê mi bar kerdî mi ê darî ke kerdî zerdê
 ereba. E şîya qulp e şîya qulp a sere hema dinya socyayê pîrya gi serd ib o to ra vacî
 wele a sere e ewca menda. Min kê xu rê hebê kê îşaat de viraşt e peyinda kê de menda
 binê mî ke firne bî cayê min rind bi germin ib. A sere ma lezeto weş viyarna o wele ma o
 îşaat qedêna tay perê ma bibî ma şî xu rê tay erse girot. Ma dikan viraşt îşat ma viraşt o
 ma ewca de îskan bî. Ewca ra henî bereve yawaş yawaş heta amey tîya rez mez çik
 nêmando. Awna te ra îkî bîn îkî de ez amîya tîya ez amîya etya mi awna te ra nê rez o nê
 baxçe o nê çik o. Se kerî mi va ez rez nana ro mîlete va ti cinêr ê yaw e seyîn cinêr a wele
 ê ti rez ronê hema newe ti rez nanê ro efendime soyle ci ra enguran wenê. Mi dî Mihê
 Hecî Silêmanî ame. Mihê hecî Silmandê keee ewkî kê Hewre va ooo xalê Mehme Elî mi
 va ha ê rez bîyo ser a çinîk o. Emser çende serî yo ewca ra îkî bîn îkî de xura mi qoze nay
 ro mi qoze na ro min jo kê jo pakête ra çewres û di kîloy qoze dert we. Ma ardê o akê cê
 nay ro he akî kewtê teber bîyê fenê morcelandê qîçekî fenê cîmcîmî bîyê fenê cîmcîmî. O
 berêva ma velg day ci bîyê ma enê odey di qatî ke kerdê reynay ke ci rê nêvê nêvecyay mi
 çar serî qoze na ro min çar serî ci ra sêxurta xo odemîş kerde çar serî mêrdekî min rêşîyo
 Entab bi çî bi na Birsî mi telefon kerd mêrdekî mi rê çar serî sêxurta mi ewca da pero
 çar serî ma ewca ra ma bî sêxurtalî mi ewna tay a sêxurta mi tay a e şîya tarim va gere
 tapûyê to bibê mi va tapû wele çin ya. Xezûrê Bûrhanî bib ewk ra dîyarbekir de. O ke
 cîranê mi bi va hewtay û panc dolimî erdê mi tapûlî yo e tapûyê xu qelebnena to ser. Ti
 xu rê tarim de îşê xu viraze wele ame tapûyê xu qelebna mi ser. E şîya tarim de mi îşê xu
 viraşt. Min panc serî ke ewca yatirmîş kerd mend hîrê serî hîrê serê ke seseqa ewca ra ez
 emeklî bîya. Eka ez dorê milyar û çar sey pancas vace milyar û nîm ez gêna ma serbest

şinê xeste to ra vacî yalaniz xanime zilût menda çîdê xanime çin yo a zilût menda. O wele îşê dinya o ma tene danê eka rezê ma ke rind o ma mesera ser o yê o wele eyro ma rib viraşt siba ke ma go tay bastêq virazê tay ke mendo ma go tayna ke rib kerin. Dims ma nanê ewulî xura mesera kenê enguran na kenê qa beno şîra şîra ma kenê qazan qazan gireyeno ma qazan qesnenê e şîya min here arda mi ewk ra namê cê çî wo karaz ra a here erzenê ci qesêno qesêno ma kefê cê gênê o qelebnenê sefênenê reyna nanê ro ser girênenê beno tay beno tay beno ma awna te ra gi gêçirmê lédê ma vecyay beno rib. O eka ma kerdo rib ma naw ro wele a xeyrî ser siba bê qeda bê bela ma go tay bastêq pewcê. Ma go serê sibay a şîra xo bikerê lê eynî reyna bigirênin biqesnin bisefênin bîyarê tîya kêber etya kêber de ma kuçike viraştta ma go ewca ewk kerd tay şîra xu ke ma go ser de kerin ewke esta beroş ma go ci kerin i ardanê xu bisencin beradin ê o xeşebe esta xeşeba pîle bi xeşebe aravke virazi zamanêk bi destî viraştê bi destî ewna kerdê kerdê kerdê bi destî viraştê eka na rey xeşebe esta xeşebe erzenê ci beno edelêno o ma kenê zerdê lê. O tédanê tédanê efendime soyle beno bilbilkê sûrî yenê ci peyşeno qasê seet o nîm di seetî o ma a gave ma satilan kenê çarşebe ser. Pîrekî kenê pen mesela lê ma dorê hewtay çarşebe erzeno lê ma pîl o çende serî verê coyî vatê enê çarşebê ewkî ma ardê çarşebê camponî ma kerdê nêkerdê bastêqê cê nêvecyay pêro bîyê letey. Na rey vanê çarşebê naylonî e şîya mardîn ra hewtay hebe arda bi se û pancas milyon mi se û vîst û milyonî ke deştişê cîne di sey û hewtay milyon. Min da bi çarşeban de nêza emser seyî o min hema bastêq nêkerdo ser eka ez go seîtî bikerî dê hele banî se beno emser senkî go werê bî. O wele siba xeyrî ser bê qeda bê bela ma nîyet kerdo ma go bastêqê xu rafînî o xeyrî ser vecin bê qeda bê bela a to ra vacî emser rezê kerekan çinê bî haya şîma ci ra çin ya. Rezê kerekan çinê bî nî e wele nêza estê çin yê zamanêk de rezê engurê kerekan ribê kerekan nimûne bi. Tîya ra o û kalê xu tîya ra enguran benê şî şinê şên engurê ma zefî bî o çax şeş heran bar kenê tîya rê enguran geldê qulpî o benê şên ewca roşenê. O û babê xu kalê min û babê xu namê babê cê Wus ib namê kalê min Os ib wurzenê we şinê şinê şên. Engura roşenê ot ra yenê sorevang ot ra yenê sorevang kalê min ewca amnan o hewn merdedê gêncî rê şîfa o. Cilanê xu veceno şano serdê xu ver o kuno ra kalê min hebêdo xişn ib her gû zendê cê ende qalindî bî. Hebêdo qîrase bi hema gênc ib nêzewecyabî ke to ra va o çax heta babê mi çewres sera cê qedeya hema zewecya. Çewres sere bi hema zewecya apê min î ke çewres sere bi hema zewecya a şinê ewca ende vînenê mekûmê kêdê Têlî axay şînas ra yenê awnenê e tay ha ewca vezelnayeyê. O herî ewca yê wele vanê perê

cîne estê kunê kalê mi ser kalê min doxînê cê vecenê bi destanê cê gire danê duyês heb ê doxînê cê destanê cê û linganê cê pê gire danê erd o tena perin û tûmanî tenê o cilanê cê ke benê peranê cê ke benê o bîn ke kalê min kalê babê cê ke extîyar o normal extîyar o. O çax sibicî zefî bî sibicî Amîna ti nêzana eka sibican ti nêzana çi wê sibicî zefî bî sibicî kiştê xu rê îçilikê xu vetîbî kiştê cilê xu enê yenê kunê ser îne benê şinê o ca de verdenê şinê qayme şinê Beyrok Beyrok eka ti vacê her kes zano şa wo. Şinê Beyrok enê kalikê min babdê xu ra vano destanê mi ake babê cê destanê cê keno a bi selikan heran ser o şedêneno vano de haydê qulp şa wo şo ti nînê vano nê çîrê ti nînê ê la vano tena perên û tûmanî enîna cilê ma berdî perê ma berdî ma rezîl kerdî wa mi bikiş cenazê mi bî daha baş o fendêk eg ez ewna rezîl bibînî ê vano keno nêkeno nêvino eno şaneno îne dime eno şaneno îne dime ê şinê beyrok o ke dima o tena perin û tûmanî ser serqot lîngê warway bane Amîna sesewat bane lingêdê wareway eka kerekan de ti pers bikerê her kes zano Eno şino nîzdî cê nîzdî îne hebê xu dima geyre xu dima geyrenê a tena perin û tûmanî o hao hema tay mendo îne risê hebêk tivîngê xu keno destê xu baltê xu ke îne vatê ê gi hefs de ê mekûmanê kêdê Têlî Axay îne vatê Hecî Mehemedê Eme. Ê û Hecî Mehemedê Eme pîya hefs de bî ya. Îne vatê mesele ena wa îne mesela gerey kerda vatê bane Amîna sesewat bane lingêdê wareway xura go bîmrê ez go leyrî kerî qedya şî va ez nîzdî ber bi ci şîya va dîtino gi mi dî ez qefelnawa. Va ez qefelnawa va tivîng destê mi ra vet va ez kerda leyrî va en az pancas metre belkî se metre ez bîya leyrî. kê şaya o şî o enê bînan xu ser de geyrê a eg o merdimê cîne çin yo tivîng dest de o vazdeno tena perin û tûmanî kewto ver û ver enîne jondes heban pîya atêşê cê kerd. Emirdê bardê ezîmî hebêk guley o nêqefelna hebê gule bane ê tivîng berd şî şî îne şa dime na ra dime çeperna berd Askar ra vet Askar de armenî bibî veyn da armenîyan va o gi merdimo tena perin tûmanî yeno biqefelnê merdimo tena perin û tûmanî yeno biqefelnê vatê armenî ke xaşîng çînenê şimêlê xaşîngî darenê we vatê armenîya ro min awna tivîng destê mi de o o to ra vacî ez serserqot lingêdê wareway va qeth û bîla joyî awur nêda ra min qethî vatê ez amîya askare va mi balê xu şa ci Avdegês ra warezayê kalikdê min tehsîldar. O şino vano kam tîya o vano wele tehsîldar tîya o hîrê çar heb cendirmey ke tedir ê. Lingê cê pêro teqayê lingê cê pêro gunî ci ra yena serserqot tena perin û tûmanî vano hal û mesela min û kêdê Têlî Axay ewna va şeştî heb fîşeka min a hîris to rê hîris mi rê kuno mîyandê dewe. Osî rê kalikdê mi rê hebêk şekale hebêk şalwar hebê îçilik hebê şewqe etya ra pey vano babdê xu ra bêminet ê hîris heb fîşeka min esta babdê xu ra bêminet ê wa bê Oso malmîrat ma

nayê şinê cenazedê to ser ti vanê ti vano wele hal û mesela ena wa ez nîyama kiştişî tivîngê xu ard tîya tivîngê cê tîya mend ê rehmet kerd apê min tivîngê cê kerd qirme xu rê têlî axa merdimêdo zef bêkeys ib koşka cê eka ha xerepyawa. Amîna her gû sê tede wa nêza ê sî şa ra ardê bi paştada kamî ardê sîyê nihîtî û sipey koşka cê şewawe eka koşka Têlî Axay. Pesê xu ardê çirdê Ahmî pesêdo ewna ewna bizêdê entîkey kalê emnanî şîyê zozanî o payizî amey ewk amey dewe kê birandê cê xura bîrdê zeyna ra o kalê ke bîrdê zeyna ra o xura rocêk ez û Hekîm ma ewca ra şî bîrdê zeynan Hekîmî mi ra va ez bîr dana a. Mi va Hekîm bîr şa danê a va e mîyandê bêwanî de xu rê tûlan bîyare ser o kêdo normal viraze ti û Emîna şima yenê kunê ci xu rê pê îşê dinya derbas kenê.

WERGERA KURMANCÎ: Amîna tu bi xêr hatî. Amîna tu nevîya Hecî Cebarê dapîra Zînê yî. (efendime soyle) Hecî Cebar mirovekî beynel mînel bû wekî Xwedê yanî karê kê biketa kê ew karê wan xelas dikir. Rojek perê xwe jî nedixwest digot felan roj bînin dîsa jî nedixwest. Ez jî rojekî ketim tengasiyê min got, got “tu hatî çî” şev e, bawer bike vê demê bû, min got “hal û hewal wisa ye, ji min re hinek pere lazim in.” Got “ji te re çiqas lazim in” mi got “wele qasî sed milyon bû sed kaxiz bû teştêkî wisa bû, wê demê pere biqîmet bûn. Welehî mirov anîn û dan min, negot tu dê kîngê bidî jî min got “ez dê felan roj ji te re bînim” got “temam.” Welehî qewlê wî hat ez çûm min pereyên wî birin dan. Got “te çima zû anîn” min got “tiştêkî nabe pere ketin destê min û min anîn.” Û ji te re bêjim carna em necar bûn û me karê Kerkîyan qedandin. Karê taxa jorê ya jêrê (efendime soyle) welehî wekî Xwedê Kerkî bi nan û ava xwe camêr bûn. (efendime soyle) Gava ku min nû dest bi necarîyê kir, kurê min Salih, Xalê Mehme Şerîf ê Adî navê pîreka wî Zayda bû. (efendime soyle) heta ji vê derê diçûn û bi şevê du car diçûn Dolekê û li gel Zayda du car tutûn dianîn û bi destê min re xizar kişandin. Wekî Xwedê Zayda jî ango mirovekî wisa bû. Keda wê her tiştê wê pak bû pak çêdikir û nanê wê jî dihat xwarin. Û ji te re bibêjim xaltîya min a Safê bû. Jixwe ez ji xaltîya xwe Safê re jî xebitîme carek du car xebitîme mirovekî baş bû. Ez ji bavê te re xebitîme, ew baş bû. Ez ji kalikê te, Evdila re xebitîme. Ango ez ji Kerkîyan re kesekî ku jê re nexebitîme nîn e. Jixwe ez ji Qeredayî re gelek xebitîme. Min û Qeredayî bi hev re gelek hevaltî kiriye. Û ji te re bibêjim welehî karê dinê wisa ye. Û welehî rojek Evdila hat û ji min re got “kevanîya min çûye li ser dilovanîya xwe, ji min re jinek hewce ye. Jinek li Pasûrê bû, ez çûm min jê re got “ya jinê tu dixawazî bi Evdila re bizewicî?” Jinik got “ka bisekine ez Evdila bibînim.” Evdila dît, Evdila jî xwe nexemilandibû lê Evdila wisa hatiye ku min jinik dît li Evdila mêze kir û bi

kurmancî got: “welehî ne xweşik e.” Û welehî bi wisa. Min û Elî jî me bi hev ra gelek hevaltî kiriye. Me gihayê ewî yekî girt. Kurê Hecî Berî girt. Wekî Xwedê Saîm, ew jî li gel me dixebitî. Niha tenê ez pesnê Kerkîyan didim. Di destê min de das heye di destê wî de jî qirim heye. Wî heft berd çand min jî şeş berd. Gava kû me çandin xelas kir min dît got: Elo Elo min berdekî ji te zedetir çand.” Min got: “temam.” Welehî êdî em ji wê derê hatin. Şevêk em li mala wî man û em êvarê razan û em heta şevêqê hişyar nebûn. Gava em hişyar bûn şevêqê derbaz bûye. Wele Amîna em çi bibêjin em li dinê gelek gerîyan. Gava em diçûn kar em li newal- mewal, herrî, berf nedinêrîn. Lê mirov diçû Benîn li paşî Kerkî ye, em derdiketin rê rasterast diçûn. Îro çokên min ketine berê min ez nikarim di rê de bimeşim. Wele ez û Hecî Cebar wisa bûn. Rojek Tesîm hat û got: “derîyên min hene.” Me jê re derî çêkirin û birin li ber dan. Êvarê em çûn mala we ya ku niha ava bûye li alîyê jêr. Hîn rehmetî ewkê sax bû, navê rehmetî çi bû kêvanîya ewko. Kêvanîya birayê navê wî çi bû min ji bîr kirîye. Tesîm nebû birayê we yê din bû. Me ew jî çêkirin. Û ji te re bibêjim welê dinê wisa bû. Min li taxa jêrin ji Hecî Xalit re embar çêkir. Tornavîdeke min a entîke hebû û li bin embarê de ma û ma. Bîst sal derbaz bû, bîst- sî sal derbaz bû. Piştî sî sal embar xera kirin. Lê tornevîda min ji wir derxist. Ez çûm kêvanîya wî Şazîma li wir bû. Wele Şazîma got tornavîda ha li vir e. Piştî Hecî Xalit pê hesî got: “wele ez bibûma min nedida te.” Û wele êdî rast digot bi xeletî digot nizanim. Me çardeh sal titûn avêt. Çardeh sal min û vê xanimê me titûn avêt. Min hebek motor stend. Çardeh sal min şixuland negot “çit” Ez diçûm kar û ew jî diçû motor dişixuland û titûn av dida. (efendime soyle) em bi şevê ez û ew em tenê bûn û roj û şev me du palas titûn diavêt malê. Wekî Xwedê rojek pismamê me Salih ev cîranê me ye, ew jî dihatên alîkarîya me. Wan alîkarîyekî baş dida me. Min salekî heşt sed kîlo titûn derxist û min bir Pasûr. Û ji te re bibêjim min titûn bir danûstandinê. Cara pêşî li titûna Qemikan nihêrî û ya xelkê nehat firotin û hat li ser titûna min. Di nava giştîyê Pasûrê da titûnê min bû yekemîn. Wele min hemû pereyê xwe girt. Hebek birayê min hebû. Sed kaxizê wê demê sed hezarê wê demê min qelenê wî da. Sed hezarî wê demê niha nêzî heft sed mîlyarê wê demê ye. Min qelenê wî da. Û ji min cîya bûbû lê dîsa jî heqê xwe ji min stand û min qelenê wî jî da. Mecbûr em çi bikin wisa bû. Tişt çêbû. Şewata Pasûrê çêbû. Ez li Pasûrê bûm, ez çûm gûndek û wê rojê li wir mam. Min dît dengê topan tê. Qerebalix e fîzar û dûman radibe. Ez ketim rê û bilind bûm û min mêze kir kû Pasûr şewutiye û agir ketiye Pasûr. Qîrîn e tişt e, panzêr e lê dixê û topan davêje çiyayan. Wele ma, bû êvarê ez hatim gomeya Pasûrê. Du hebên

din hatin û em li wan nêrîn du heb mirov di bin erebeyê de ne û yekî misqalekî dinale. Min got: “xêr e çi hatiye serê we.” Got: “wele gule berî min da gule lê li vê derê min ketiye. Min ev mirov anî û min got: “ji nav we kî dikare ajotinê bike. Yekî got: “ez dikarim”, yekî got: “ew jî ajotvan e” yekî got: “ez jî dikarim.” Min got: “de erebe ber bi paşê berdîn li ser erdê xijok ku yek me nebîne û tivingan berî me nede. Bila bibînîn leşker tiving berî me dan. Me erebe bir li ser erdê xijok. (efendime soyle) me ji wê derê ev mirov bir û ereba anî li Çemê Şekiran, min û ên mirovên din me erebeya êzingan vala kir. Min ev mirov kir lin nav betanîye û anî nexweşxaneyê dewletê. Li wir hebek hevalê min bibû nûjdar. Min bir û çû emelîyat kir û wê guleyê ji wî derxist û ew razand. Serê sibehê ez hatim. Bûrhanê me jî li dikanê ye û em nizanin ku çawa bûye çawa qewimîye. Roja din êdî me dît nexwe ew jî ketibû li nav newalê û ji newalê ziviribû hat û gihişt me. Me ew jî ji gomeya Pasûrê anî. Ez çima serê te biêşînim heft heşt roj ma. Piştî hef heş roj êdî serbestî bû. Min qamyonekî dar anî li wê derê û qamyona xwe jî min kişand. Ez dibim Dîyarbekirê, ez gerîyam kesên ku ji min re qamyona min bar bike nîn in. Wele hebek barlêkerê (kepçecî) camêr wele hat qamyona min bar kir û ên bar kirin li qamyonê. Ez çûm li Pasûrê û ew sal hîna dinê disoje ewqas ku sar e. Û ji te re bibêjim wele ez li wir mam. Min ji xwe re hebekî xanî çêkir. Ez li piştî xanîyê mam biniya min jî firin bû. Cîhê min rind bû û germ bû. Ez êdî ji wir hêdî-hêdî ta ku hatim li vê derê rez-mez tiştêkî nemaye. Di sala du hezarê duyan de ez hatim li vê derê ez lê nêrîn ne rez e ne baxçe ye ne tiştêk e. Ez çi bikim min got ez rez diçînim. Her kes ji min re got: “tu dîn î,” “yaw ez çima dîn bibim,” “êdî dereng e, ger tu niha rez biçînî tu dê jê tirî bixwî?” Min dît ku Mihê Hecê Silêmanî hat. Mihê Hecî Silêmanî yê ku ji malbata Hewre ye got: “Xalê Mehme Elî.” Min got: “Ha.” got: “Rez wiha çêbûye ser wî de tiştêk tune ye” Îsal çend sal e ku li wir şûn de, di sala du hezar û duyan de min qoze danî û min ji paketekê çil û dû kîlo qoza me hilanîn. Me ew hêkên wê anîn û danîn, gava hêk ketin derva bûn wekî morîyên biçûk bûn wekî gizgizîn. Û hêdî me belg da wê bûn. Me di odeyan de du qat raxistin lê dîsa jî têrê wan nekir. Min çar sal qoze danî û çar sal min jê sîgortaya xwe razand. Çar sal meriv ez şandim Entab bû çi bû, na Bûrsa bû min telefon kir. Meriv çar sal sîgortaya min li wir razand. Çar sal em ji wê derê bûn bisîgorta. Min dît ku sîgortaya mi hindik e ez çûm çandinî (tarim) wan jî got: “divê tapûyên te bibin.” min got: “wele tapû nîn e.” Li Dîyarbekirê xezûrê Bûrhan hebû. Ew jî cîranê me bû. Got: “heftê û pênc dolim erdê min ê tapokirî heye ez tapoyê xwe dewrî te bikim, tu ji xwe re di çandinîyê de karê xwe çêke.”

Wele hat tapoyê xwe li ser min kir û ez çûm li çandinîyê min karê xwe çêkir. Min pênc sal jî li wir razand, sê sal ma. Sê sal jî seseqa bû û ez wisa teqawût bûm. Niha ez qasî mîlyar û çar sed ü pêncî ti bêje mîlyar û nîv ez distînim. Û ji te re bibêjim em bi hêsani diçin nexweşxaneyê. Lê bele xanimê zelût maye, tişteki xanimê nîn e. Û wele karê dinê ye û tenê em didin. Niha rezê me jî baş e. Em li ser rezçîninê ne û îro me dims çêkir. Sibê jî em dê hinek bastêq çekin. Hindik jî maye hinekî din jî emê bikin dims . Yekem em dims deynin û em tirîyan dikin sîtilê û dibe şîre, şîre jî em tijî sîtilê dikin. Sîtil dikele û em sîtil diqusin. Ez çûm min ax anî. Navê wê çi bû, ji Karazê. Vê axê davêjin wê diquse diquse. Em kefê wê digrin diqelibînin û disefnin dîsa em datînin. Ew li ser dikele hindik dibe hindik dibe û me lê niherî sîtilê me dikele dibe dims. Niha me kiriye dims me daxistiye. Û ser xêrê serê sibehê bê qeza û bela em dê hindik bastêq çêkin. Em dê serê sibehê wê şîreyê tijî sîtil bikin û dîsa bikelînin biqusin, bisefnin û bînin li vir. Me li vir li ber malê kuçik çêkiriye li wir em hinek şîreya xwe jî em dê tijî beroş bikin û arvanê xwe biwezînin û têxin nava leganê. Legana mezin bû. Emê di nav leganê de araveke çêbikin. Berê bi dest çêdikirin. Bi destan wisa dikirin dikirin dikirin û bi destan çêdikirin. Îcar niha legan heye davêjin kê legan û disekinin û em tijî sîtilê dikin. Û em li hev didin (efendime soyle) dikele û li gor seat û nîv du seat dipije. Û em vê gav digel dewlikan dikin li ser hîzaran. Pîrek pen dikin. Mesela sîtilê me li gorî heftê hîzar e. sîtilê me mezin e. berê çend salan digotin: “ên hîzarên tiştê me anîn, hîzarên pemû. (camponî) me dikir nedikir bastêq jê dernediket û hemû hur dibûn. Îcar dibêjin hîzarên laylonî hene. E çûm ji Mêrdînê heftê heb min anîn. Sed û pencî mîlyon min da. Sed û bîst mîlyon jî ji bo dirutina wan min da bû du sed û heftê mîlyon. Min ji bo hîzaran da lê binêrin îsal wê çawa be. Min hîna bastêq li ser nekiriye. Ez dê niha saxtî bikim ka çawa çêdibe. Û wele sibê ser xêrê bêqeda bêbela me nîyet kirîye em dê bastêqê xwe raxin. Li ser xêrê em bêqeda û bêbela jê derkevin. Ha ji te re bibêjim îsal rezên Kerkîyan tune bûn, haya we jê nîn e. Rezên Kerkîyan tune bûn na wele hebûn tune bû nizamim lê ji berê de rez û tirî û dimsên Kerkîyan nimûne bûn. Ew û kalê xwe ji vê derê tirîyan dibin û diçin Şên. Wê demê tirîyên me zehf bûn. Wê demê şeş keran bar dikin û dibin gelîyên Pasûr û Şên. Li wir difroşin. Ew, bavê xwe û kalê min, navê bavê wî Wus bû. Navê kalê min Os bû. Ew radibin û diçin Şên. Tirî difiroşin û ji Otê tîn Sorevang. Havîn e xew ji mirovekî xort re şîfa ye. Kalê min cilê xwe derdixe datîne ber serê xwe û radizê. Kalê min kesekî qirase bû, her yek milê wî ewqas qalind bûn. Kesekî qirase bû lê xort bû hîn nezewicîbû jî û ji te re bibêjim wê demê heta bavê

min çil salê wî qedîyan hîna nezewicîbû, piştî çilî zewicî. Apê min jî çil salî bû zewicî. Ha ew diçin li wir hevqas dibînin. Mehkûmê malbata Telî Axa ji Şînasê tên. Lê dinêrin ku hinekan li wê derê xwe dirêj kiriye. Û ker li wir in û dibêjin: “perê wan hene.” Û li ser kalê min kom dibin. Doxîna kalê min jê derdixin û bi wê destên kalê min gire didin. Dazdeh kes in. Bi doxîna wî, dest û lingên wî pê girê didin û li erdê didin. Û tenê bi îşlik û tûmanê dimîne. Û cil û pereyên wî digrin û ewê din jî kalê min kalê bavê min jî extîyarekî normal e. Wê demê sipî zehf bûn. Amîna tu nizanî sipî çî ne, sipî zehf bûn. Jji xwe re sipî kuştin, îşlikê xwe derxistibûn û li kêleka nivîna xwe û ew tên li ser wan û wan dibin û diçin wan li wir dihêlin û berê xwe didin jor û diçin Beyrokê. Beyrok niha ti bipirsî her kes dizane ku li ku derê ye. Diçin Beyrokê ev kalikê min ji bavê xwe re dibêje: “destên min veke.” Bavê wî destên wî vedike û selikan li ser keran dişidîne û haydê em biçin li Pasûrê li ku derê ye tu here, dibêje: “tu nayê?” dibêje: “na” dibêje: “çima tu nayê?” dibêje: “lê em tenê bi îşlik û tûmanê ne û hemû cilên me birine, perên me birine em rezîl kirin, bila min bikujin meytê min bibe baştir e ji rezîlbûna wusayî.” Dike nake ew “na” dibêje. E vî dide pêşîya xwe û ew diçin li Beyrokê ew jî ji paş ve. Û tenê îşlik û tûman li ser in, serqot û pêxwas in. Amîna li bûyerê binêre, lê binêre pêxwas. Niha di Kerikan de tu bipirsî her kes dizane. Ev diçe nêzîkê wî û ev hindik li paş xwe digerin û tenê bi îşlik û tûman in. Hindik maye bigihîjin wan yekî tivingê xwe digre bivirê xwe jî. Wan digot: “ên ku di hepsê de ne ewên ku mehkûmê Telî Axayê ne.” Wan jî digot: “Hecî Mehmedê Emê.” Ew û Hec Mehmedê Emê bi hev re li hevsê bûn. Wan digot: “mesele wisa ye û wan ev mesele gilî kirîye.” Amîne lê bûyerê binêre, got: “pîyên pêxwas, jixwe ez dê bimrim ez dê gindir bikim, qedî çû.” Got: “ez nêzî ber bi kê çûm û dîtina ku min dît ez qefilandim. Got: “ji dest min tiving girt û ez gindir kirim û herî kêmetre ez gindir bûm belkî jî se metre ez gindir bûm û hilpekiyam çûm. Û kesên din jî li ser xwe vegeerîn ku ger merivê wan ê din nîn e. Tiving di destê wî de ye û baz dide tenê îşlik li ser heye. Ketîye li pêş û pêş. Wan yazdeh kesan, bi hev re artêşê wî kirin. Bi emrê Xwedê guleyek li wî neket guleyek. Binêre wî tiving bir çû û çû. Wan da dû û ew bir û anîn wî ji Askarê derxistin. Li Askarê Ermenî hebûn gazîyê Ermenîyan kir û got: “merivê ku bi îşlik û tûmanê tê wî biqefilînin. Digot Ermenî jî xaşîng diçînin û qefleyên xaşîngê hiltînin. Digot “Ermenîyan li min nihêrî” tiving di destê min de ye û ji te re bibêjim ez serqot û pêxwas im. Digot tu kesî qet awir neda min û digot ez hatim Askarê. Û ji te re bibêjim min bala xwu da kê ji Avdegêsê xwarzîyê kalê min tehsîldar bû. Û diçe û dibêje: “kî li vir e?” ew dibêje: “wele

tehsîldar li vir e.” Sê çar heb jî cendirme li gel wî ne. Lingên wî gişt teqîne û xwîn ji wan tê. Serqot û tenê îşlik û tûman li ser in. Dibêje hal û hewalê min û malbata Telî Axayê wusa bû. Got şêst heb fişegên min in, sî ji te re sî jî ji min re û dikeve nava gûnd. Hebek pêlav, hebek şalwar, hebek îşlik hebek şewqa didin kalikê min: “Ji niha û pê ve ji bavê xwe bêminet in, sî heb fişekên min hene Got: “Oso malxirab vêga em diçin ser meyita te. Tu dibêjî “wele hal û hewal wusa ye ez nehatim kuştin.” Tivinga xwe anî li vir tivinga wî li vir ma. Ew çû li ser dilovanîya xwe. Apê min tivinga wî qirme kir. Telî Axa ji xwe re mirovekî bêkes bû. Koşka wî hilweşîyaye. Amîna her kevir tê de ye, ez nizanim ew çûne ji ku derê kevirên şimşatî û sipî bi piştê kê anîne. Niha koşka wî hilweşîyaye. Koşka Telî Axayê. Pesên xwe anîn Çira Ahmo. Pesekî wisa wisa bizinên baş in. Kela havînê ye diçûn zozanê û payîzê dihatin gund. Jixwe birayê wî ji Bîrê Zeyna yê ye û kalê wî jî ji Bîrê Zeyna yê ye. Rojek ez û Hakîm bi hev re ji wê derê em çûn Bîrê Zeynan. Hekîm jî min re got: “ez bîr vedidim” Min got: “Hekîm bîr li ku derê vedidî?” got: “ez di nava bêwanî (bostan) de, ji xwe re tûlan bîne, li ser xaniyek normal çêbike. Tu û Emîna hûn tên ji xwe re tede rûdinên pê karê dinê derbas dikin

2. Menice Sönmez, temen, 44, gundê Kerikan

Ezo şima rê qalê zemanê verê xu bikerî. Ma se kerd ma qicîti ra heya pîlîti ma çi kerd ma çi nêkerd. Ezo to rê qalê ê çîya bikerî. Ma zemanê verî zef hêsîrî dî ma tedayî dî yanê ma senkî dî babîyanê o çaxî tedayî ro ma kerdêne. Tedayî senkî kar zef bi ma kerdêne ma tûtî bî. Şew û roc ma yabana wa bî. Ma paleyî kerdêne ma paleyî yanê ma senî kerdê ma ewulî citî kerdêne. Ma gava citî kerdê gey ma bibî ma bi geya kerdêne a ma bi geya kerdê. Serê sibey babê ma wuştêne we gey berdêne şîne mî ke ci rê nan dima berdêne. Ma şîne ma şîne cite kerdêne mî ke dorûverê dara min hetê cê qazme kerdêne. Ga hêrs bibo ga vaco ti nêzana dorûverê dara bikerê. Ê deka e xîret a keyna wa tût a senkî mese dorê dara birika binî ra vecî. Gere mi ê birî bi ra bivetey. Wele ê birî ma vetêne ê ke cite kerdêne. Henî roc şîne awan bîne tari gey beradeyne. Min û ê ma gey berdêne şîne çerêneyne verê genima de. Vatê geya gerekî ti bikerê meşkê cîna beradê ma hema geya berê kê. Ma berdê gey eke gey kewtê miyan. O çax ma cew ramîtêne. Ena rey genimî ma rew ramîtêne bîne xişnî. Ga bikû mîyanê genimanê şarî ga şar vaco to eyro Evdila genimê ma çerênew. Ga vaco wele nê min ê şima nêçerênew. Ê wele to çerênew mi bi xu çerênew çira ti sond wanenê. Wele ma ameyne kê ameyne verê kê kerdê qêrînî vatê ya ya do dadî mi ra vatê hey Meqbûla rihmê Homey ro ci dadî mi eka rihmet kerda. Ga dadî mi vaco ha ga vaco

mi rê aw do bîyare. Bikewtê herey ga nenga biçîno bikero qêrînî dême cîsnê cîna xura cîsnêko zor bi. Wele ma ewk kerdê citî qedêneyne paleyî ameyne ma şîne na paleyî ma çîne. Ga verê paleyî de rûşo genimî ameyne ga şêro verê genima de rûşo o binê cîne vaco kir destê cê ke çep bi desto raşt paleyî nêkerdêne. Wele ma ke gere fenê cê bikerdê ê ma binî ra nêzaneyne bikerê ê binî ra ke vatê gereke şîma here vecê. Werhasil ewkê ma û ê rayêk ro nêşîne. O ma paleyî kerdêne a paleyî ma tamam qedêneyne ma ena rey kerdêne mesela anû milî ma bi mila antêne kerdêne cele. Ma celê xu neyne ro ma henî hêvî patose mendêne. Patose ameyne patose carna herey ameyne ma şîne titûn mitûnê xu tevrik kerdêne. Ma titûnî neyne ro ma gava tevrik kerdê. Vatê patose amî ma ena rey ameyne patose reyna ma ameyne o çax bi motora o patose bi qayiş gire deyne. Patose kerdêne eka biçerî vecyey rehetî ya genima anê kê simer anê kê rehetî ya. O ma ga tenekanê xu torbanê heranê xu ma ga berê şî verê cela ma ga patose amî patosê xu kerdêne. Ê gi zengînî bîne bi morora ardêne ê gi feqîrî bî xu rê neyne ro hera şexsê canê ma ma xu rê bi hera antêne. Ma ga genimê xu bancin kê ma ga ena rey simerê xu bikerê xaşa ma ga bikeri xaşa. O ke ma ga bi hera bîyarin ma ga berê kê de ronin serê banî de. Ma qulikî merbeqî kerdêne a ma pe ro simer beredeyne war merekê ma bîne pirê babê ma xu cor de beredeyne war. Bi melêve o simer kerdê dûz kerdêne dûz ena rey ku ewkê ma bî pirê ma ena rey a qulikê xu serê banî ma neyne pa. Ma xaşê xu ceykêko bîn de ma neyne pêser. Ma patosê xu qedêneyne ma ena rey kewtê titûna ma bi şewe seete di yê şewe de ma bîne esparê hera ma şî şîne Umbareke îne ne ma titûn qerefneyne. Ma o titûn neyne ro ma pelasê xu neyne ro hera ma herê xu bar kerdê ma vatê ma ardê kê. Ma nanê xu werdêne ma şîne verê pelasa de niştêne ro ma bi derzenî ma kerdêne la ra. Ma kerdê la ra ma pelasê titûnê xu qedêneyne ma ena rey berdê şîne îskela daleqneyne ma îskela de daleqneyne ku bîne wuşk. Ma ena rey qora gi bîne wuşk ma berdê axur de daleqneyne. A qorê diyina heta bî wuşke ma a bîne daleqne ma a bîne berdêne. Yanê ma her gû roce bîne esparê hera bi şewe ma şîne titûnî ardêne. Ma titûnê xu qedêna ma zimistanî ke bi hera antêne deyne heywanî. O rocêk babê ma kê de nêbi ez û apê Mehme Can û o Dawud û Xiyas û ê qicûcîkî bî. Nîzam bi Eşref bi. Va ma eyro şîne velg mî ke mi va wele e nîna şîma dir. Ma hîrê darî çîyê tamam vanê ma nêşkenê velg bidê serê dare apo Mehme Can şîyo serê dare mi darê xu da velg ro mi velg da ci ma darê xu ney ro her hîrê darê xu di darê ma mendî hîrê darî ma di darî ney ro darêk mende. Ma sî eşte ma serê velgî de ney ro ma vatê wa velg nêkû war hewa nêdo pero mi senîy sî eşte guna textikê çarê apê mi

ro. E zî remawa mi va e şîna kê zano e şêrî velg maneno jo velg nêdano ci. Wele lavey kerdî e reyna fetelyawa amiya ma ê wur dî darê xu ke ma ney ro henî ma xu degîş kerd cilê xu ma şî şî ewca dere de hebê teyerê ma bibî. Dare ke darê kalê Hecî Cebârî bî ma amey ma teyê xu teyk çî ma teyk teyê xu girzê xu ma kerdî werdi ma werdî binê dare de apê Mehme Canî keys ro mi a mi kuwa mi va wele mi bizaney ke ti mi konê mi darî nêneyne ro. Va çik nêbeno va ez apê to wa ma amey kê e şîya verê kalê Hecî Cebârî mi va wele eyro apê Mehme Canî mi kuwew. Va çira? mi va ma darî ney ro e nişkawa mi va mi sî dawa serê cê ro mi va mi kuwew. Laca ra hes kerdêne va çim û bîvikê ti vetê mi va çim û bîvikê mi vetê . Ez şîya ma şî o velgê xu qerefna ma ard kê ma mexrîb roc şîne awan ma hema beroşê xu girotê ma şîne çirike dere. Ma hejikî çîne ma dere kerdê ma serê xu ke verê beroşa de şitêne çirike de ma hêsîrî zef dîya. Eka makîney vecyey bûlaşiqî vecyey rehetî vecyawa çîqa xaliqê alemî endêk rehetî dawa endêk êşî dey yanê rehetî çîqa bibo endêk ewk o derdî zef ê. Gêncê enê zemanî însanî becnenê. Ezo ena rey şîma rê qalê xu û bûkîti xu şîma rê bikerî ez bîya bûke vistewrê min amew qewlê dewete new ro. Amey motor şî vernî cîna ê bi motor ardî kê goştê cîna tedir o nanê cîna tedir o fekê mexrîbî yo amey verê kê axurê kê kalê mi bibi hewşê cîna o serê cê qapalî bi beroşê xu berd şî ewca goştê xu pewt nanê xu ard da miletî. E zî bûk a zere de kursî ke çinîk a de heb balişney ney ro anû kursîka darik a mi serê a kursî de ništa ro yanê xwedê gir e bûk a a wele henî ard destê mi hene kerd va wa milet leze vila bo va ewk çinîk o elektrîk çin ya. E zî bûk a zere de kursî ke çinîk a de heb balişney ney ro anû kursîka darik a mi serê a kursî de ništa ro yanê xwedê gir e bûk a a wele henî ard destê mi hene kerd va wa milet leze vila bo va ewk çinîk o elektrîk çin ya. Dadî min a rehetî şî hebê engîştare a kerd destê min ardî bazinê mi taxmîş kerd hebê bazinê mi nêardbi. Ez bûkê emê xu wa wele serê sibey remzîya û sevîma amey quâfurciyê bûka ê wê porê mi viraşt taximê mi da mi ra çarşeba sîya da mi ra telika sûre kerde mi pay. Telika sûre kerda mi pay şilî varena firtonew bi lingî ez amiya çem babê mi va wele wa jo to wegêro mi va wele e nêkona paştê joyî mi va ez dana aw ro va ti nêdana aw ro ewca mîyanê miletî ke de mi ra hêrs bi yanê e bûk a mi ke paştê hesenî mi kerd paştê hesenê vistewrê min apê mehme taharî û zekî enîşte ê wurdîne bi milê mi girot telikê sûrî mendî ena perê çemî de mi berd a pere lastîkê cê arde kerde mi pay mi dî ame va bûkê deka e bûk a e nêvana ha ê lastîkê cê ke nanî mi pay de tûtê rojda ke mi ver de o de dorê çemî şîno yeno wele mi dî apê min ê Tesîm mi dî hebê wayê Eyšane şîşko bibî girote xu arde mîyanê ortê çemî wurdî kewtî binê awe. Pîrê mi o çax extîyare

bî verê camî de nişêna ro vana sond wanena vana eka carna e şina verê caye mi ra vana vana ez eşkena sond biwanî to telikê sûrê to ti xirba ro şîne telikê to eyseyne ê ka e vana dayê senî verê camî ra telikê mi ewca ra eysey vana wele telikê to to bi telikanê sûra şî şîya serê raye ê wele raşt a eynî ê telikî mi pay de bî e berda şîya derê meleka ewca çarşebe mi ra vete apê Mehme Taharî cenî menî jo verê ma de çinîk ê. Etekê mi cê ra qesna pîrya bîyo hî ma şî kewtî yarime ez kewta ereba mi ard ceykêk erebey amey vernî bûke ewca mi ke peya mi be ke textsî mi dî Eysane şer kerd va ma şinê konê kiştê bûke ewca qewxe virazya va ez û keynanê xu ma şinê. Werhasilî Xezala amojne hebêka bîne kewtî kiştê mi, a ewca mende. Heredya yarime de mende wele ez berda şî şîya verê bînayî kerda peya ê evdiley babê min xiyas mi dir rêşawuto gere zama nêro nêko binê çengê mi mi nêbero dîyar wele ez ereba ra kerda peya Zekî enîşte qatê hewtinan a de maşalla enîşte ke derg o kewto binê çengê mi a bînayî de gi hîrê lingî bî kerde panc lingî ma berdî dîyar ma şî şî dîyar. Xîyasedîn mi dir rêşawuto yanê dê menîca benê quafêr dê gelîlix danê pe ra dê se kenê hema o çax heqaret ro mi kerd çira ro mi ke ba eka bûkanê xu anê gelîlixa danê pe ra nişan qatîya danê pe ra lacan û keynanê xu benê şinê verê sazî de têdir henanê cîna kenê hema wextê ma de heqaret kerd hem zilm ro mi kerd hebêk emê mi pêlêrî bibî a emê mî ke zef yanê roca gi bî bûke ay ke hêsîrî zef dî. Ez hêsîrî caye senkî bî aye vatê gelîlix îna vatê çarşebe rocêk wele ma şî şî kê xalê Mihemedî ma te ra xalê Mihemed dewucê ma bi. Ma makîne ma arde ma yanê çarşebê caye derzenê wele emê mi berya na pa va gere şima çarşebe nêderzê, berya kilît kerde. Ma sipirkî kerdî vinî ma reyna şî şî kê xalê Mehemedî ma çarşebe werhasilî ma qefelna ma berde şî çarşebe deşte ma arde roca badê coyî dewetê caya wele emê mi arde kerde bûke serê sibey hamey a şewe hamey vewre vana wîr wîr wîr qame birnawa heta serê sibê qamêk a vewre wele emê mi kerde bûke berde şî şî text dadî min a rihmetî o hebêka bîne ke te dir şî e nêzana bi qantira ha o çax bi belgîra berdêne kerde espare. Rihmê Homey ro ci dadî mi vatê vatê ma ema xeze berde şî vatê ray de pîrya lerzeyne vatê pîrya bibî bûze de qamêk bî zemanê verî hêsîrî zefe bî erebey bibî raya bi asfalte bibî çî bibî yanê hêsîrî zemanê verî zefe bî e to ra vacî. Ena rey gerê dadî xu bikerî dadî mi nêweşe bî ez bîya bûke ez hema bûkê serêk a dadî min nêweş kewte dûrî cîya bo yanê berde tixtor va êşê caye qansêr o de o çax yanê êşêko bêfiqaqaq guna aye ro. Wele dadî min nêweşe bî ma arde nîzam ke nişanlî ma nîzam ke nişanlî ma keynê apê fetî ci rê waşte sebhete ma ci rê waşte dadî mi amî xeste bibî aşmêk kê ma de dîyarbekir de mende kê mi de mende ma berde xeste dixtorî ma çarnenê nêvanê

qansêr o.

WERGERA KURMANCÎ: Ezê ji we re behsa wextê xwe yê berê bikim, me çi kir? Me ji zaroktîya heta mezintî me çi kir çi nekir? Ezê ji te re behsa wan tiştan bikim. Me di wextê berê de gelek êsîrî dît, me tehdâyî dît. Yanî me çawa dît, bavên wê demê tehdâyî li me dikir. Çawa tehdâyî bû? Kar gelek bû me dikir. Em zarok bûn şev û roj em li yawanên bûn. Me paleyî dikir ango me çawa paleyî dikir? Yekem me cot dikir. Gava ku me cot dikir gayên me hebûn. Me bi gayan dikir. Serê sibehê bavê me radibû û ga dibirin û diçûn, min jî bi dû re jê re nan dibir. Em diçûn em diçûn û cot dikir. Min jî aliyê wî derdorê daran dikoland. Ewê hêrs bibûya û bigota: “tu nizanî derûdorê dara bikolî.” Ê niha ez xîret/jin im, keçik im zarok im, çawa mesela derûdorê daran, biran ji binî bikolim, divê min ew bir ji binî bikolanda. Wele me ew bir dikolandin, wî jî cot dikir. Êdî roj awan dibû, tarî dibû, me ga berdidan. Min û wî, me ga berdidan, diçûn li ber geniman de diçêrand. Digot: “divê tu zikê wan têr bikî paşê emê bibin malê. Me hîna ga dibirin malê. Wê demê me ceh diajot, îcar me genim zû diajot û mezin dibû. Gava me dibirin ger ga biketin nava genimê xelkê dê xelkê bigota: “Evdila te îro genimê me çêrandîye.” Ewê bigota: “wele na mi yên we neçêrandîye. Ê wele te çêrandîye, min bi xwe çêrandîye, çima tu sond dixwînî. Wele em dihatin malê em dihatin ber malê dest bi qêrîn dikir û ji dîya min re digot: “hey Meqbûla.” Rehma Xwedê lê be niha dîya min rehmet kiriye. Dê dîya min bigota: “ha.” ewê bigota: “ka ji min re av û dew bîne.” Ger dereng biketa nifir dikir û dikir qîrînî. Nexwe cinsê wan jixwe cinsekî zor bû. Wele me tişt dikir. Cot diqedand û paleyî dihat îcar em diçûn paleyî yê me diçand, ewê bihata ber paleyîyê rûništa genim ghiştîbû. Ewê biçûya li ber genimê rûništa û ji binî jêbikira. Destê wî jî çep bû. Bi destê rast paleyî nedikir. Wele divê me jî wekê wî bikira, lê me qet nedizanî çêbikira. Wî digot: “divê hûn xwelî ji binî derxin ” welhasil tiştê me û wî li ser heman rê nedîçû. Ê me paleyî dikir me ew paleyî gişt diqedand. Îcar mesela me dikir wusa qefle bi qefle me dikişand û dikir dêz. Me dêza xwe çêdikir êdî em li benda patosê diman. Patosê dihat lê carna dereng jî dima. Em diçûn titûn-mitûnê xwe tevrik dikir. Me titûn diçand û gava me tevrik dikir digotin: “patos hat.” dîsa em dihatin patosê. Wê demê patosê bi qayîş bi motoran re girê didan wisa patosê dikirin. Niha bîçer (makîneya çîninê) derketine û hêsanî ye. Genim tînin malê ka tînin hêsanî ye. Emê teneke, tûrik û kerên xwe bigrin û biçin kêleka dêza. Ewê patos bihata me yê patosa xwe bikira. Ên ku dewlemend bûn bi motoran

dianî malê, ên ku xîzan bûn ji xwe re dadiketin, keran şexsê canê me. Me ji xwe re bi keran dikişand. Me yê genimê xwe bikişanda malê îcar me yê kayê xwe tije xêşa bikira û ker bianîna. Me yê li ber malê danîna. Di serê xanîyê de me qulika merbeqî vedikir û me hemû ka dibir xwarê. Mereka me tijî dibû bavê me ji jor de xwe ber dida xwarê û bi melêw ew ka dikir duz. Îcar tiştê me tije bû qulika serê xanî yê xwe me digirt. Me xêşayên xwe di cîhekî din de didan ser hev. Me patosa xwe diqedand îcar diketin nav titûnê. Saet du yê şevê de em siwarê keran dibûn. Em diçûn Umbarekê wan me titûn qet dikir. Me ew titûn didanî û pelasê xwe didanî û me kerên xwe bar dikirin û me dianîn malê. Me nanê xwe dixwar û em diçûn li ber pelasê rûdiniştin. Me bend di derzî re dikir titûn dikir bend û wusa me pelasê xwe diqedand. Me îcar dibir li îskelayê didaliqand ku hişk dibûn. Îcar dora ku hişk dibûn me dibir di nav axûrê de didaliqand. Ya dora duyemîn heta ku hişk be me ya din daliqand ya din jî me dibir. Her roj em siwarê keran dibûn bi şev em diçûn titûn dianî. Me titûnê xwe qedand zivistan ku hat me bi keran dikişand û dida heywanan. Û rojek bavê me li male nebû. Ez û apê Mehmed Can û Dawud û Xiyas ew piçûk bûn Nîzam bû Eşref bû. Got: “îro em diçin çilo.” min jî got: “wele ez li gel we nayê.” Me sê dar birîn, dibêjin: “temam êdî em nikarin çilo bidin ser darê.” Apo Mehmet Can çûye serê darê min dasa xwe lê da çilo û min çilo da wî. Me sê darên xwe xilas kirin. Du darên me man, me di dar xilas kirin, darek ma. Me kevir diavêt ser dêzê, me digot: “bila dêz neke xwarê ba lê nede.” Gava ku min kevir avet ser dêzê kevir çû li nîtika ênîya Apê min ket. Ez jî revîyam min got: “ez diçim malê.” Ez dizanim gava ez biçim çilo dimîne yekî çilo nade wî. Wele lava kirin dîsa ez vegeyriyam û hatim û me ew her du darên xwe jî xilas kirin. Êdî me cilên xwe guherandin. Em çûn wê derê di robarê de dartawika me hebû. Dara malbata Kalê Hecî Cebârî bû. Em hatin û me tawikên xwe çinand û hinek jî me ji xwe re gulaz kirin û di bin darê de me ew xwarin. Apo Mehmed Can keys lê anî û li min xist. Min got: “wele min bizanibûya ku tu li min dixî min dar li erdê nedixistin. Got: “tişteke nabe ez apê te me.” Em hatin malê ez çûm ber Kalê Hecî Cebârî. Min got: “wele îro apê Mehmed Canî li min xistiye.” got: “çima.” min got: “me dar didanîn ez nikarîbûm û min kevir avêt li serê wî xist wî jî li min xist.” Ji kuran hes dikir. Got: Çav û bîbikên te derxistine. Min got: “Çav û bîbikên mi derxistine” ez çûm, bi hev re em çûn ew çiloyê xwe me jê kir û anî malê. Êvarê gava roj diçû ava me hê sîtilên xwe digirtin û em diçûn çirikê beravê. Me hejîk diçinand me berav dikir me serên xwe li ber beroşan dişûşt li çirikê. Me gelek hêsirî kişand. Niha makîne derketine, Firaqşo derketine rehetî çêbûye

Xwedayê Alem çiqas hêsanî daye û hewqas jî êş daye. Ango hêsanî çiqas bibe hewqas derd hene. Xortên vê demê meriv dibehcînin. Ezê îcar jî ji we re behsa xwe û bûkîtîya xwe bikim. Ez bûm bûk, xwezûrê min hatiye qewlê dawetê daniye. Hatîn û motor çû pêşwazîya wan. Ew bi motor anîn malê. Goşt û nanê wan jî li gel wan e. Ber bi êvarê ye hatin berê malê. Axurê mala kalê min hebû, serê hewşê wan girtî bû. Beroşên xwe birin li wê derê goştê xwe peht û nanê xwe anî û da millet. Ez jî bûk im, di hundirê malê de kursîyek nîn e ez li ser rûnim, du heb balif danîn wusa kursîyeke darîn danîn li ser balifan û ez li ser vê kursîyê rûniştim. Yanê qaşo ez bûk im. Ha wele wisa anîn destên min hene kirin. Got: “bila millet lez belav bibe lewra elektrîk nîn e. Dîya min a rehmetî çû hebek ingulîsk anî û kir tilîya min û anî bazinê min xist destê min. Bazinekî min neanîbû. Ez bûka meta xwe me. Wele serê sibehê Remzîya û Sewîma hatin. Kuaforê bûkan ew in. Porê min çêkirin taximê min li min kirin çarşeba reş li min kirin şemikên sor xistin piyê min. Şimikên sor xistin piyê min. Şilî dibare û bahoz e. Ez bi piya hatim çem. Bavê min got: “wele yekî te hilgire.” min got: “ez nakevim piştta kesî ez bixwe li avê dixim” Li wir di nav milletê de ji min hêrs bû. Yanê ez bûk im. Wan ez li piştta Hesenî ku bûratîyê min e kirim. Apê Mehmed Tahîr û Zavayê Zekî ên her du jî milên mi girtin. Şimikên sor li wê derê man. Wan ez derbazê aliyê din kirim. Lastîkê wî anî û kir piyê min û min dît hat û got: “bûkê.” ez bûk im ez nabêjim: “ha”. Lastîkên wî jî di piyê min da ne. Zarokê Rojda jî li ber min e. Li dora çemê diçe û tê. Wele mi dît apê min ê Tesîm û xwuşkekê Eysanê qelew hebû, hildabû piştta xwe anî orta çemê herdu jî ketin binê avê. Pîra min wê demê pîr bû. Li ber mizgeftê rûdinê dibêje û sond diwîne. Niha carna ez diçim berê wê. Ji min re dibêje: “ez dikarim son bixwînim ku gava tu li xirbayê diçûyî şemikên te yên sor xuya dikirin.” ez dibêjim. “ê ka dayê çawa ji ber mizgeftê şimikên mi xuya dikirin.” Dibêje: “wele şimikên te, tu bi şimikên sor çûyî serê rîyê.” Ê wele rast e eynî ên şimik di piyên min de bûn ez birim çûn Derê Meleka Apê Mehmed Tahar li wir çarşebe ji min derxist. Jin-min kesek li cem min nîn in. Etekê min ji jêr qusand gişt şil bûye. Em çûn ketin yarimê (otobusa piçuk) e û ez ketim erebê min anîn cihekî erebe hatin pêşîya bûkê. Li wê derê ez peya kirim. Ez birim kirim teksî. Min dît Eysanê şer kir û got: “emê werin li cem bûkê rûnin.” Li wir şer qewumî. Got: “ez û keçikên xwe em diçin.” Welhasil Amojîna Xezalê û kesekê din hatin li cem min rûniştin. Ew li wir ma. Hêrs bû û li Yarimê ma. Wele ez birim çûm berê bînayê ez peya kirim. Evdila bavê min Xiyas li gel min şandîye. Divê zava neyê nekve bin milê min û min nebe dîyar. Wele ez ji erebeyê peya kirim, zava

Zekî di qata heftemîn de ye. Maşalah zava jî dirêj e ketiye bin milê min. Di vê bînayê de sê ling bûn kirine penc ling û em birin dîyar û em çûn. Xiyasedîn li gel min şandîye, de Menîca dibin quafor, bûkanî (gelinlik) lê dikin, çi dikin. Lê wê demê haqaret li min kirin. Çima haqaret li min kirin? Binêre! Niha, bûkên xwe tînin, bûkanîyan lê dikin, cilên nîşan lê dikin, kur û keçên xwe dibin, diçin di pêşî sazane de bi hev ra destên wan hene dikin. Lê di wextê me de haqarat kirin. Hem zilm li min kir. Ji min mezintir meteke min hebû, ew meta min jî gelek zehmetî dît, roja ku bû bûk gelek zehmetî dît. Hêsirî çawa bû, wê digot “bûkanî” (gelinlik) wan digot “çarşeb”. Rojek em çûn mala Xalê Mihemed. Xalê Mihemed gûndiyê me bû. Me makîne anî. Yanê em çarşeba wê didirûn. Wele meta min derî girt got: “divê hûn çarşebê nedirûn.” Derî kîlît kir me bişkok winda kirin. Em dîsa diçûn mala Xalê Mihemed. Welhasilî me girtin û em çûn çarşeb dirût û anî. Pişt re roja din daweta wê ye. Wele anîn meta min kirin bûk. Serê sibehê hatin wê şevê hatin. Berf dibêje wir, wir, wir bi qasî bejnê ye. Heta serê sibehê bejneke e. Wele meta min kirin bûk û birin çûn Textê. Dayika min a rehmetî û kesekî din li gel wê çûn. Ez nizanim wê demê bi qantiran na wê demê bi bergîran dibirin siwar dikirin. Rehma Xwedê li ser wê be dayika min digot: “Me Meta Xezê bir çû lê di rê de hingî dileriziya û ewqas cemed bûbû de bejneke berf bû. Zemanê berê hêsirî gelek bû, ma erebe hebû, rêyên bi bi alsfaltkirî hebûn, tişteke hebû? Ango hêsirî ya zemanê berê gelek bû. Ez ji te re bibêjim. Îcar ez gilîyê dayika xwe bikim. Dayika min nexweş bû. Ez jî bûk im û bûka salek im. Dayika min nexweş ket. Dûrê her der be. Birin doxtor got “êşa wê qanser e.” Wê demê êşekî bê derman lê ket. Wele dayika min nexweş bû. Me Nîzam destgirtî (nîşanli) kir. Me jê re qîza Apê Fetî Sebhetê xwast. Me jê re xwast û dayika min jî li nexweşxaneyê bû û hat mala me mehekî li mala me ma. Mala me jî li Amedê bû. Me ew bir nexweşxane, em li doxtoran digerin lê kesek nabêje qanser e.

3. Îhsan BAYRAM, temen, 79, gundê Text

Ez Êhsan a pişt navî min Bayram û ez lajî Huseynî ya Hiseyn lajî hecî Emerî yû yaşî min hewtê û new serî wu. Hîryêsî kanûnî verîn di hewtê û new qedyênû kunû heştê ewladî bavî min ê lajînî çinê bî. Wextû ze homê ez arda dinya a esna di vewre zî bibiya muxtar tîya ra şîwu qulp nufûs mudûrî dostî babî mi vîwu. Ez eynî jû şewu qeyd kerda o pan sey kaxit perê mujdeyen dawa ci. Her gav mi ra vatê mi serêk pey kulfetî xwu pawut hecî Emer bîngol genc pêrtag dewê pêrtage ra omo. De hevî birê cê çinêbî de hevî apî cê

bivî jû vêrînî inî karazijan û jû zî ap Mihê Mehme Şê û Ezê wu. Bavî cê merdû inû hemlê dadîyê xwu de vîwu bavî cê zî namê cê Emer vîwu. Hevêk wayê cê bivîya namê caye zeyni bîya. O inû zî Emer vîwu o bavî cê rehmet kerdû. Inû hemlê dadî vîwu wextû ze omo dinya namê cê Emer no pa şarî ê memleketî ci ra vatê xemo yanû ti bavî xwu nêdî ti xem we xwu rî sey vîwu. Xwu rî şîyû xevetyo şarî bar di xevetyo şîwaneyî kerda bi serewext şîwu mîranî per xopar oja begêk bar di di serî mendû di serî mendû begî ci ra vatû şewêk payizî şirawutû vatû bî kî gumi de vîwu verî kelan de vîwu ê vatû e nîna. Qasid kerdû ra vatû bî kî vatû e nîna gû lewur mewurêk bî bik gumi heywana berû heqî mi benû hera heqî cê zî zerdêke o ser de hevî hîrî bizêkan zî danû ci anû kî serê sivê wurzênû şînu eg heş omo hevêk kelî cê werdû. Gêrênû yênu kî vanû wele mîrê mi e şîna vanû wele heqî mi bi heram mi ti ra va e nîna. Heş emşû omo kel werdû heqî mi bi heram wurzênû wu di serî mendû şeş heb bizêka o di hevî zerdanê cê danû ci. Yenû kî dadîyê cê cê esta o wayê cê esta de o zemanî o çax bostan mostan xwu rî eg çi ramenî se kênî kartola ramenî çi esto nêzana hindî kuno payiz. Vanû wele dayê ezû mo şî karaz şî kî apanî xwu şîni golikvanî kenî ê zî zerdêk golikvanî kenî heta wextî palyan dadî şîna cor ê wextê palyan di golikan beradanî. Zerdî xwu gênî şîni serê diyina ancî zî dadî şîna cor ê tîya manênî o wext ze tîya ra kunî rey di zerdî cê yî way dir î şîni gelî kê qasan û şîni şîni dewê xwu kî qasa oja erzênî vernî waye bân waye remnênî bânî inû qij û tût û way vana heyra ina heqaret bi şîma rû mi kerd ê tîn tenya dadîyê mi oja qene hîç olmese de hevî zerdî cê mi dir î jû zerdanê cê berê ci resnê zerdanî cê danî ra hevêk însanî. Şînu inû zî şînu anyênû jû dima wu inû şînu o çîqa veng danû inû nêvindenû. Tût û neyse zaf veng danû inû anû xwu rî vindenû kere mera top kenû o vanû hema ami texmê mi ezû ci şanî yenû sadaxê cê hindî nîzd eg sî cê biresê ci vanû ti kam î ti vanî se çîta vanû mi de hevî zerdî emanetî ti mi ardî vanû oja sî serne o ageyr kerî serne o ageyr ti ewca ra cor bî ez ti kişena ewca nan rû şînu inû gêrenû a zerdanê xwu benû şînu dadî vana ka zeyni vanû wele hal û hadêsêka hinayine zeyni şî neyse xever resa ê apî karazî ami şî ewca o cor mîyanî qewm deg hindî kam bivîwu cebî şî miyan. Bavî ap Mihî bivîwu o inî şî dew viraşte Zeyn oja mend hindî inû xevetya wuşt wu panc şeş zerd cê resê pî xwu rî dê bi heywanî dê bi heywanî heywan ard ami şî karaz şî pismamanî xwu bar. Ewca rezêkê zî no rû inka hema zî namê cê estû vanê rezê hecî Emer. O zimistan oja mend zimistan û serd ib pût nêkerd vewr vara de zê inkê cew simer çînebi velg iz nêbirna anya heywan cê qeleyênû heywanî xwu ewca ra dartî wu zimistanî eg heywanêk herê cê bivîya çîta pelûpotî xwu na pa o û dadîyê xwu

amê amê tîya qarşî temira ci ra vanî şikeftî Mistî amê o zimistan oja mendî heywan eg
qeleya werhasil perîşan bi wesarî şî cor dadî zî şî rehmê homê mend tenya ancî geyra a
ami kî softî Mistefê barson xura xalanî teyk apanê mê zî pîrê ma wa bêz yine re wa ewca
di serî yin bar di şiwaneyî ke payiz û rojêk şinû qê verî dewarî dewarî beno a deştê binî
herbeqnî anyênû kalêko extîyar sûretî cê sipî zê peşmî ewca ra ami vano wele ez gawan
a xwu rî verî dewaran da vanû kîsik ti estû vanû estû kîsikî sûrî bi nîki viraştê o perê merê
xwu werdî kerdê ci kîsikî xwu vejênû inû di quruşî nîm o qul kenû binî kîsikî cê o dêrzînî
zî vejênû derzênû vanû ti heta mecbûr nêvî nêvejî wa o tedi vû o vanû ti şandi şî xalî xu
ra vaji gê sîyê çar î kenû qurba xuera og homa def bikû nêkû qurban belêk vernî ca de
estû. Kal şinû kal hecî Emer şandi ga dewarî anû kî hindî şam mamîyê xwu wenî vanû
xalo o vanû ha vanû xalo wele êrû medimêko extîyar bi inû wezîyet niyevanû quruş di
qurişî nîm da mi vanû amo vatû go sîyo çar xalî ti kenû qurban kenû qurban nêkenû
qurban tofan vernî cê de estû. Xal vengî xwu nêkenû badî wextan ra inû kunû binê cê xal
vanû qê şima goşt moşt nêdanî inî tûtî ti dî ê tûtî va se lajî vanî wele nêza o şew sêr sivê
wurzênû we şinû vêrî dewarî esrêk. Vanû ez dewarî bîyarî kî û ezû hindî xatir biwazî e şî
heredyênû zerî xwu di anyênû teqî sîleh ra amî teqî sîleh ra amî neyse yaban a wu bi
hewar bi qerebalix şandi ami dûrî cîyan vû lajî tiving no xwu wa xwu kiştû. Vanû wele ez
erd û verdî bî merhemetî ya gere ez vindî heta yasê hewarî yinê zî biqedyê yasê yin
biqedyû o ezû hindî şînî vindenû eg heftêk des rojî misafirî yin yenî yas qedyena şewêk
şandi vanû apo ti îznê mi bidî wele e şina xal o vanû ti sera şinî vanû homa tialê bi da
zanayiş mi adir na kî xwu wa mi va zeryê xemî şina goşt vanû wedê homê wed kêrdû heta
bêza kênê xwu ez nêdî ti e rû ti mare nêkî şiyayiş ti çinî wu pelûpotî o çaxî çî vîwu allahu
alem o şinû ci rî pelûpotî keynê xwu rî anû ê rî zî cila anû nîyanû e nêzana o marê yini
birnenû o destêk nivîn û o çar hebî zî şeş hebî zî biza danû ci vanû felek oxirî ti yê xêrî vû
ti sera şinî ti rî ewca ra danû perû þinû gomegurî bênatê zira û çalê bêreaþî inka cira vanî
ewca xwu rî qulêkêk kî bi dêsû jola virazenû dara êrzenû ser kewş êrzenû ser kênû setari
cê ê her şeş pesanî xwu zî virazenû tedi manenî. Payizî wextî qelî yênû vanû bêzê ma xwu
rî qelî nêki vana kî bavî ti mîrat vû ma di nufûsî ma inû yavan a o hema ti şeş hevan iz
qelî kênî jûbîn çepernênî vonî de neyse hevêk xwu rî sari bivirni wa panc hevî bimanê
vanû de ti wurz şî awu e zî bizê ma sari bibirni pîra bêz şina awu inû de heva sari birnênû
yena ha bavo ha dayê inû çita vi ti çira hina ke filan vanû bêzê homa pîl û ewca manênî
wesarî ê çar heb biz cê zênî heşt heb bizêkanî maya anî heþt bizêkî çar zî bizî bî duyey

hevî a de hindî pawênû werhasilî kelam hindî verî homê dayiş do. Di serî ewca manenû ewca ra nînû qîmî cê eger hindî wayêrî arazî nêverdenî ewca ra şinû dêrike ina dêrika ze inka kiştê metmûre di serêk oja manenû ewca nêbenû ewca ra yenû şinû mêwuke mêwuke de serêk manenû ewca ra yenû çem ma ci ra vanî hewsel begî ika temira kerdî rezî o çax ormîya bi oja manenû kî kênû dila bermalê kî virazênû kenû dila. Tûtî virazyê ap hecî resûl pîlî biran û o estû ema fat ê dima wa ap hecî mihemed kalî şima ê dima wu di hîrê hevî tûtî zî cê êstî ewca zî serêk di serî manenû nêbenû ewca ta yênu tîya bîrî zêna cê bizi tîya bîrî zênan di begen kêrdû zaf aqilî wu vatê tîya bîrî zênan di manenû eg çen serî ci ra tede şinû ap Hecî Resûl biro pîl bavî inînanî textî wurzenû wu şinû koçeranê şemsika ci ra vatê Medê Ozêrî namê bavî caye Ozêr vi. Kurdûn ra vi ewladî lajînî ci ra çinêvî Malî cê şî mîrati Sofî Îsmâilî barê naşika Med Sofî Îsmâilî rot ci ra vatê newala Heli a keyna ewca anû Hecî Resûlî rî o wesîyet kênû vanû heta ziriyetê mi bivû ziriyetê kî koçeran bivû gere ci ra vacê xalo. Inka qe xalî mi nî zî ez qijan û pîlan ra qê xatirî wesîyetê kalî e vana xalo. Xalê Ebdirehman xalê Ezîz xalê filankes filan ap Hecî Resûl benû mêrde hindî ap Hecî Mihemed hindî benû xort wurdî ap Hecî Mistefa yenû dinya şeş lajî cê vî şeş keynê cê vî ap Hecî Resûl zewejnenû. Ap Hecî Mihemed kerkan ra pîra Em ci rî anû. Ê zewejnenû ap Hecî Mistefa kalî Mistî û Mûradî wu. O zî barsom ra vi gelî kê Qasan ra bî la da dadîyê caye kî Qasan ra bavî caye barsom ra vi. Ê zewejnenû şinû hec o yenû Hecî Resûl şinû Hecî Resûl yenû Hecî Mihemed şinû Hecî Mihemed yenû Hecî Mistefa şinû zengîn î. Hindî bî dewletlî aminî şinû zozan zimistanî yenû tîya bîr pîrika Bêzi şina rehmê homê pîra Bêz rehmet kena. Ezeb manenû namê keynêkê cê Fate vîya jû Hefse vîya jû Eme vîya Em hezrû de vî Hefs o Fati şegan de vî Hefse guleyan de vî .Hecî Ezîzî dadîyê Hecî Silêmanî vî extîyar û hewtê ser emrê cê wû şinû ewca ti wayê xwu bidî mi ezû zî keynê xwu bidî ti. Wanû wa vû xal anû pîrika hew danû ci inû zî ema Hefsi danû lajî cê ê zewejyênî. Neyse hindî vanû Hewê a vana ha ez extîyar a e çî timtêle de vî çî girêdayiş de vî gere ti zî hindî zê mi xwu bikî. A zî vana herê aye ra zî di lajî û di kênê virazyênî. Hisên bavî mi hecî Wusiv o Hele o Rabe. Rabe hezrû di bi mêrdî vî û dûrî cîyan vû bî cinêri atî pê giroto o mêrdî terk ke. Amî tîya sonî serî çirî di ma ci ra vanî ewca bî lêrî şî zinar di kot perçî bî. O ema Heli da vistewrê mi ap Ahmed zî dele ra zewejna. Keynê xwu wa pîli namê caye namê caye Mede vî. Mede danû Hecî Mistefê wayê cê Fedi Danû ap Ahmedî rî o zî oja zewejna. Bavî mi zî temira ra keynê Mele Hisênî namê caye Wese vî damarîyê mi a ardi badî aye ra ze tûtî lajîn nêvirazyê. Ina dadîyê mi kerkan de ewulî

davî Emerî Elî Hutê bavî Celalî û yini o bar di nêvindert. Qederê homê şî ina zî remna ardi ap Hecî Wusiv tazv ra kênê Hecî Emînî ci rê ardi. Hecî Wusiv qijî biran vi namê cê Hecî Wusiv o ê ra lajêk estû. Inka homa verdû ê Mehme Salihî çar lajî cê estî bavî mi di lajî ci ra vî jû ez a jû Hecî Mistefo de ê ma zî estî ap Ahmed di lajî cê vî hevêk namê cê Mehme Şa vi jû zî Evdirezaq vi. Ina Siltani kênê Silî dedezê ma bî Mehme Şê rî waşte Mehme Şa şî rihmê homê ezebî ma ardi Hecî Evdirezaqî ez hindî o çax resavî ci mi dî a Hecî Evdirezaqî ra zî inka Ahmed êstû Ahmedî ra çar panc heb lajî êstî. Ap Hecî Mistefa hîrî lajî cê vî hevêk namê cê Hem vi hebêk Emer vi jû Hecî Siîd vi Hecî Siîd vi badê co bi Hecî Hem şî eskerî ami. O da perû şî deşti nêvindert va Hemo meşû Hemo ti çira hina kenî milkî xwu zî rot da Hecî Sihadî. Rehmetî Emerî va mêrdo camêrd senî nanû xaşîng wenû e şina o şî ewca lajî êstî. Inka hindî ma kêrdî xerîvî çen ser dîyarbekir di ma çend hev dî inka qe nêza çî cê se kênî o ê Emerî zî lajî ci ra çinêbî. Çar hevî keynê o ê Hecî Sihadî zî Mist û Mûrad ci ra yî. Ê dima yanû ê pîlêrî Hecî Mihemed kalî şima ê zî pîra zîne zî şegan ra ardi kulfet ci ra çinêbi. Pîra Eme ra Hecî Cebar û Hecî Şekir ci ra vî. O Cemila û o a bîn namê caye Sidîqa a biro pîl Hecî Resûl vîyo. Hecî Resûl zî a cînek ze mi va koçeran ra arde Sil, Îs, Emîn bavî Hecî Nûrî û yini o hîrî hevî keynê aye ra virazyê. A merde indor şî naşîka Xece arde, Xece inî tarxana ra vî. Aye ra zî Mîxdar û Fede o Eyşe lajêk o di kênê aye ra zî virazyê. Kulfetî ap Hecî Resûlî Mîxdar dadîyêke ra wu. Emîn, Sil û Îs dadîyêke ra yê Emînî ra Hecî Herb û Hecî Arîf mendî o Silî ra zî Mehmed Emîn, Huznî, Hecî Ezîz, Hesen ê çar zî Silî ra virazyê. Ê keyna ma war û verdi ê Hecî Emerî şeş lajî cê vîyi de mi ti ra va ê jûyî çar vî ê jûyî panc vî ê jûyî di vî pan sey û di kî hîrî kî yanû lajan ra ê keynan zirîyet ci ra virazyaw.

WERGERA KURMANCÎ: Ez Êhsan im paşnava min Bayram e û ez kurê Husên im, Husên jî kurê Hecî Emer e û temenê min heftê û neh salî ye. Di sêzdeha kanûnê de heftê neh diqede dibim heştê. Zarokên bavê min ên kur tune bûn. Gava ku Xwedê ez anîm dinê di wê heynê de berf jî hebûye. Muxtar ji vê derê çûye Pasor. Mudurê nifûsê dostê bavê min bûye. Wî di heman demê de ez qeyd kirime. Pen sed kaxiz pere jî mizgînî daye wî. Her gav ji min r digot: “Salek min pê malbata xwe debar kir.” Hecî Emer ji Çewligê, Dara Hênî, Pêrtag gundê Pêrtagê hatiye. Du heb, birayên wî tune bûn du heb apên wî hebûn. Yekî pêşîyê van Karazîyan bû yê din jî Ap Mihê Mehmed Şa û ez im. Bavê wî mirîye û ev jî di hemla dîya xwe de bûye. Bavê wî jî navê wî Enwer bûye. Hebek xwişka wî hebûye

navê wê jî Zeynê bûye. Û ev jî Emer bûye û bavê wî jî rehmet kiriye. Ev jî di hemla dîya xwe de bûye gava ku hatîye dinê navê wî jî Emer lê danîye. Gelê wê derê jê re dibêjin “Xemo.” Ango te bavê xwe nedît tu bixem î ji xwe re sêwî ye. Ji xwe re çûye ji xelkê re xebitiye, li ba xelqê xebitiye, şivantî kiriye, salewext çûye mîrên alîyê Xopar. Li wir li cem xebitiye. Salek maye, du sal maye. Li wir begek bûye. Beg jê re gotiye: “Şeveke payîz şandîye bi kîjan gomê de bûye û di berê kelan de bûye, wî gotîye: “ez nayêm. Qasid şandiye gotiye: “were malê.” Gotiye: “na ez nayêm.” ewê cinawir-mewirek were bikeve gomê û heywanan bibe heqê min zêde dibe. Heqê wî zî zêrek e û li ser du heb sê bizinan jî dide wî. Ew jî tîne malê û serê sibehê radibe û diçe ku meger hirç hatîye hebek kelê wî xwariye. Digere tê malê û dibêje: “wele mîrê min ez diçim, wele heqê min heram bû, min ji te re got ‘ez nayêm.’ Hirç îşev hatîye û kel xwarîye êdî heqê min heram bû.” Radibe, du sal li wê derê maye şeş heb bizinan û du heb zêrên wî dide wî. Tê malê dayika wî û xwişka wî hene. De wê demê bostan-mostan ger ji xwe re tiştê diajon çi dikin, kartolan diajon çi heye ez nizamim êdî dikeve payîzê. Dibêje: “wele dayê ezê îcar biçim Karazê mala apên xwe. Diçin bi zêrek re golikvanî dikin. Heta dema paleyî. Dayik diçe jorê ew di dema paleyîyê de golikvanî ber didin. Zêrê xwe digrin û diçin Serê Diyînanê. Dîsa dayik diçe jorê ew jî li vir dimîne. Wê demê jî ji vir dikevin rê du heb zêrên wan in û li gel xwişka xwe diçin gelfîyê malbata Qasan diçin gundê xwe li wir mala Qasan rêya wan dibirîn û xwişka wî direvînin û dibin lê ev jî hîna biçûk û zarok e. xwişk dibêje: “Heyran we ewqas heqeret li min kir, tenê dadîya min li wê derê ye qet nebe du zêrên wî li cem min e, yekî zêrên wî bibe û bigihîje wî.” Yekî zêrên wî digre lê dixê li dû wî diçe. Ew dinêre ku yekî li dû wî ye ew diçe, ev çiqas jî biqîre û gazîyê wî bike jî ew nasekine de zarok e. Ev gelek gazîyê wî dike, ew tîne ji xwe re kevir û kuçik çi hene berhev dike û dibêje: “gava ku hat texma min ezê bavêjim kê. Edî ew tê texma wî nêz dibe, ger kevir lê bigihîje ew dibêje: “tu kî yî, çi dixwazî?” dibêje: “du heb zêrên te min anîn.” dibêje: “li wir li ser keviran deyne û vegere, ger tu werî jorê ezê te bikujim.” li wir datîne û vedigere diçe. Zêrên xwe digre û diçe cm dayika xwe. Dayik dibêje: “Zeynê li ku ye?” dibêje: “wele hal û hewal wusa ye, Zeynê çû.” De xeber çû gihişt ê Apê Karazî, hat û çû wê derê jorê di nava qewmê de êdî kî hebûye millet çû navê. Bavê Apê Memed bûye û ew diçin dozê çêdikin. Zeynê êdî li wir ma. Ev xebitî rabû penc şeş zêrên wî berhev bûn ji xwe re dan bi heywan anî, hat û çû Karazê cem pismamên xwe. Li wê derê rezekî danîye hîna jî navê wî heye dibêjin: “Rezê Hecî Emerî.” Û zivistanê li wê derê ma. Zivistan e û

sar bû rez nebirî. Berf barîye û wekî niha ceh û ka jî tune bûn û çilo jî nebirîye. Lê nêrîye heywanên wî diqelin heywanên xwe ji wir rakirîye zivistanê. Ger heywanekî kera wî hebûye, çiqas pel û potên xwe hene danîye ser û bi diya re xwe hatin li vir hemberê Temiran jê re dibêjin Şikefta Mistî. Û zivistanê li wê derê man. Ger heywan qeliye, welhasil perîşan bû, buharê çû jor, û dê jî çû rehma Xwedê tenê ma. Dîsa vegeerî û hat mala Sofî Mistefa yê Barsan. Jixwe xalên û hindik apên me jî pîrê me ye Bêzê ji wan e. Li wê derê du sal li cem wan şîvantî kir. Payîz e û rojek diçe ji bo biçê cem dewarê. Dewar dibe dêşta binê Herbeqnîyê. Dinêre kalekî pîr rûyê wî spî wekî hirî, ji vê derê hat. Dibêje: “wele ez gavan im, ji xwe re li ber dewaran disekinim.” Pîr dibêje: “kîseyê te heye.” dibêje. “belê heye.” Kîseyê sor bi nîkan çêkirin. Û pere-mereyê xwe xwarin û dixistin kê. Û kîseyê xwe derdixê. Ew jî di quruş û nîv derdixê û binê kîseyê wî jî qul dike û derzî û bend jî derdixê û didûre dibêje: “ta ku tu mecbûr nebûyî van dernexe bila ew tê de be. Ger tu êvarê çû malê ji xalê xwe re bibêje. ‘gayên reş li ku dike qurban. Jixwe ger Xwedê def bike neke qurban belêk pêşîya wê heye.” Kal diçe û êvarê Hecî Emer dewar tîne malê êdî şîv-mîva xwe dixwin û dibêje: “Xalo.” ew dibêje: “Ha.” dibêje: “wele îro mirovekî kal bû.” bi vî awahî nabê nabêje ku kal du quruş û nîv pere da min. dibêje: “gayê reş çar, xalê te qurban dike bila bike ger qurban neke li pêşî wî tofanek heye.” Xal dengê xwe nake lê dû re ew dikeve eqlê wî dibêje: “hûn qet goşt nadin vî zarok.” Te dît ev zarok weke kur dibêje. Xal dibêje: “wele nizanîm.” wê şevê radizên û serê sibehê radibe û diçe berê dewaran heta esrê. Dibêje: “Ez dewar bibim malê û ez êdî xatir bixwazim û biçim.” di hundirê xwe de hêrs dibe. Di wê heynê de dinêre kû teqîyek ji sîlehê hat. De li yawanê ye bi hewar û bi qerebalix û êvarê hat. Dûrî malan be. Kur tiving li xwe xistîye û xwe kuştîye. Dibêje: “ez wisa ber dim û biçim bêmerhemetî ye. Divê ez bisekinim ta ku şîn û hewarê wan biqede. Piştî şîna wan ez êdî biçim. Disekine êdî hefteyek deh roj mêvanê wan tên. Şîn diqede û şevê dibêje: “Apo! Tu destûra min bidî wele ezê biçim.” Xal ew dibêje: “tu diçî ku?” dibêje: “Xwedê Teala bi da zanîn ku min agir xist mala xwe û min got, li nav xemê ez diçim goşt.” dibêje: “heta Xwedê wed kiriye qîza xwe Bêzê ez nedim te û li te mehr nekîm çûyîna te tine ye. Pel û potên wê demê çî bûn Allahu Alem. Diçe ji qîzên xwe re pel û pot tîne û jê re jî cilan tîne nayîne nizanîm û mehrê wan dibire. Qatek cilan û şeş heb bizinan dide wî, dibêje: “felek oxirê te yê xeyr be. Tu li ku diçî biçê.” Ji wê derê lê dixê û diçe Gomegûrîyê. Di navenda Zira û Çala de ye niha Bêrêafîyê dibêjin. Li wê derê ji xwe re qulek xanî bi dîwarê yek qat çêdike. Daran davêje ser kewş davêje

ser û setar dike. Ji şeş heb bizinan xwe re jî cihekî çêdike tê de dimînin. Payîz dema qelîyê tê. Dibêje: “Bêzê em ji xwe re qelî nekin.” ew jî dibêje: “mala bavê te ava be, em du nifûs in em li vê yawanê ne û tu dê şeş heban jî qelî bikî.” Hevdu digrin û dû re dibêjin: “de em hebek serjê bikin. Bila penc heb jî bimînin.” Dibêje: “ka tu biçê avê bîne ez jî serjê bikim.” Pîra Bêzê diçe av bîne ev jî digre du heban serjê dike û gava vedigere dibêje: “ha bavo ha dayê! Ev çi ye tu çima wisa kir felan.” dibêje: “Bêzê Xwedê mezin e.” Li wir dimînin biharê ew çar heb bizinên wan dizan dibin heşt heb. Heşt heb bizinên mê tînin, heşt heb bizin in çar jî kidik in bûn dazdeh heb. De êdî disekine. Welhasilî kelimê êdî di berê dayîna Xwedê de ye. Du sal li wê derê disekine, ji wir nayê Qîmê... Xwedîyê erdê êdî ber nadin. Ji wir diçe Dêrikê, ev Dêrik jî niha li kêleka Metmûrê ye. Di sal jî li wê derê dimîne lê li wir jî nabe ji wir tê û diçe Mêwûkê, li wir jî salek dimîne ji wir tê Çem. Em jê re dibêjin Begê Hewselî. Niha Temiran kiriye rez. Wê demê Ormîya bû li wir disekine malbata xwe dike, xaniyê duqat çêdike. Zarok çêbûn, Apê Hecî Resûl mezinê biran e, ew heye li dû wî Meta Fatê ye, Apê Hecî Mehemed kalê we jî piştî wê ye. Du-sê heb zarokên wî jî hene. Li wê derê jî salek du sal dimîne li wê derê jî nabe. Ta tê li vê derê Bîrê Zênan li vir ecibandîye. Gelek bîaqil e. digotin li vir li Bîra Zeynanê disekine. Êdî çend sal derbaz dibe, Apê Hecî Resûl birayê mezin bavê van ê Textîyan, radibe diçe Koçerên Şemsikan. Jê re digotin “Medê Ozerî.” Navê bavê wî Ozêr bû. Ji Kurdunê bû, zarokên wî yên kur tune bûn. Malê wî çû mîratê, Sofî Îsmailî bara Amojîna Med firot jê re digotin “Newala Helê.” wê qîzê li wir ji Hecî Resûl re tîne. Wesîyet dike û dibêje: “ta ku nifşê min bibe, nifşê ji malabata ya qoçeran re divê bibêin xalo.” Niha qet xalên min jî nebin ez ji mezin û biçûkên wan re ji bo xatirê wesîyetê kal ez dibêjim “xalo”. Xalê Evdirrehman, Xalê Ezîz, xalê filankes filan. Apê Hecî Resûl êdî mêr dibe. Apê Hecî Mihemed êdî xort dibe her du Ap Hecî Mistefa tê dinê û şeş kurên wî şeş qîzên wî bûn. Apê Hecî Resûl dizewice, ji Apê Hecî Mihemed re ji Kerkîyê Pîra Emê jê re tîne, wî dizewicîne. Apê Hecî Mistefa kalê Mist û Mûradî ye. Ew jî ji Barsamê ye bû, gelî ji malbata Qasanê bûn lê dayika wê ji malbata Qasanê bû, bavê wê jî ji Barsamê bû. Wî jî dizewicîne. Hecî Resûl diçe hacê û tê piştî wî Hecî Mihemed diçe û piştî wî jî Hecî Mistefa diçe û dewlemend in. Êdî dewlemend bûn. Havînê diçe zozan ûx zivistanê tê li vir Bîrê. Pîra Bêzê jî li ser dilovanîya xwe diçe, diçe rehma Xwedê. Ezeb dimîne, qîzên wî yekî Fatê bûye, yekî Hefse bûye. ya din jî Emê bûye. Emê li Hezroyê bû, Hefse li Şeganê bû Fatê jî li Guleyanê bû dayika Hecî Ezîz û Hecî Silêmanî bû. Extiyar e heftê sal temenê wî ye. Ew li wê derê

diçe û dibêje: “te xwişka xwe bide min ez jî qîza xwe bidim te.” dibêje, “bila bibe.” tîne Pîra Hewê dide wî, ew jî Hewsê dide kurê wî dizewicin. Wekî din êdî dibêje “Hewê” ew jî diêje “Ha” dibêje: “ez extiyar im û di nav timtêlê (rewş) de bûm di girêdanê de bûm divê tu jî êdî wekî min bibî. Ew jî dibêje: “erê.” Du heb kur û du jî qîz jê çêdibin. Bevê min Hisên, Hecî Wisiv, Helê û Rabê. Rabê li Hezroyê bi mêr bû, ji dûrê malbatan be, dîn bû cinan pê girt û mêrê wê ew berda. Hat vê derê û serdawî çû wê derê em jê re dibijên Serê Çirê, ji wir gindir bû ket zinarê û perçe bû. Ê meta Helê jî da bûrayê min. Ap Ehmed jî ji Delê zewicand. Qîza wî ya mezin jî navê wê Medê bû. Medê dide Hecê Mistefa xwişka wî Fedê jî dide Ap Ehmedî. Ew jî li wir zewicand. Bavê min jî ji Temiranê qîza Mela Hisênî navê wê Wesê bû jê re anî û dêmarîya min e. Kurekî jê çêbû. Ev dayika min jî ewil dabûn Kerkî Emerê Elî Hutê bavê Celalêyan û di Barê de nesekinand. Qedera Xwedê, diçin ew jî revand û anî. Ji Hecî Wisiv re jî qîza Hecî Emîn ê ji Tavzê anî. Hecî Wisiv biçûkê birayan bû. Kurekî jê heye. Xwedê bihêle yên Mihemed Salih çar kurên wî hene. Bavê min du heb kûrên wî çêbûn, yekî ez im ê din jî Hecî Mistefa ye. De ên me jî hene. Apê Ehmed du kurên wî bûn, yekî navê wî Mehmed Şa bû, ê din jî Evdirezaq bû. Ev Siltan jî qîza pismamê me ya Silî bû. Ji Mehmed Şa re xwast. Mehmed Şa çû rehma Xwedê ezebê me Hecî Evdirezaq bû jê re mehr kir. Wê demê ez êdî gihîştibûm çardeh salî min dît. Ji Evdirezaqî jî niha Ehmed heye. Ji Ehemdî jî çar penc kur heb hene. Sê kurên Apê Hecî Mistefa hene. Navê yekî Hem bû, yekî din Emer bû, ê din jî Hecî Siîd bû. Pişt re bû Hecî Hem, çû esker û hat nesekinand lê da û çû deştê. Milkê xwe jî gişt firot û da Hecî Sihid. Rehmetî Hecî Emer got: “Hemo tu çima wusa dikî neçe.” Wî jî got: “mêrê camêr çawa nanê xaşîkê dixwe ez diçim.” û çû li wir kurên wî hene lê niha me kirin xerîb. Berê çend sal me li Amedê çend kes dîtin lê niha nizamim li ku ne û çi dikin. Ê Emer jî kurên wî tune bûn. Çar qîzên wî çêbûn. Ên Hecî Sihîd jî Mist û Murad in. Ê, paşî angû ên mezintir Hecî Mihemed kalê we, wî jî ji Şeganê Pîra Zeynê anî lê jê kulfet çênebû. Hecî Cebar û Hecî Şekir ji Pîra Emê çêbûn ên din Cemîla û Sidîqa bûn. Birayê mezin Hecî Resûl bûye û ew jî wekî min jin Koçeranê anîye. Sil, Îs, Emîn û Hecî Nûrî û sê heb jî qîzê ji wê jinê çêbûn. Ew mir îcar jî çû Amojîna Xecê anî. Xecê ji vê Tarxanayê bû. Kurek û du heb qîz jê çêbûn. Mîxdar, Fedê û Eysê bûn. Kulfetê Hecî Resûlî Mîxdar ji dayikekê ye û Emîn, Sil, û Îs ji dayikekê ne. Hecî Herb û Hecî Arif ji Emînê çêbûn. Mehmed Emîn, Huznî, Hecî Ezîz, Hesen ên çar jî ji Silî çêbûn. Ên keçan em ber din, Hecî Emerî şeş kurên wî bûn. De min ji te re got. Ê yekî çar, ê yekî penc ê yekî du bûn. Penc

sed û du-sê malbat yanê ji kur û ên keçan nifşê wî çêbûye.

4. Mehmet KORKUT, temen, 70, gundê Seyrikî

Ez lacê Hecî Ehmedî ya. Seyrikî ra emrê mi hewtay serew enê bav û kalanê ma vatê ma hîrê birey bîyê. Ê birey yenê fenê zemanê enkay vatê ma înan nêkerdê mesela enka birêk edîrne do jo wan do jobînî nêvînenê roj bibo jobînî nas nêkenê. Ê ma jî vanê kotî ra amê hîrê hebî bî amê hebê şêxbûba de mendo, jo amo tîya, jo jî şîyo sîsê Licê. O yê şêxbûba oja yerleşmiş bîyo eno jî tîya bîyo, o jî şîyo uca eşîret olarak ma Mistan ra yê Eşîretê Mistanî nê hevêda ma qebûl kena ne kavar ma qebûl keno. Ê ma eşîretê Mistanî wele ma zef acî dî yanê wextê ma de ma paleyî kerdê ma gêley kerdê ondan son ra ma xaşîng ramitê ma birinc ramitê. Ê ma aryê ma bi îdarê ma weş ib nufûsê ma jî tay bî ez bîya de hebî wayê mi bî babê min û dadî mi bî ma pêarye bîyê we. Şar amê tîya ê ma awî ma bibî xaşîngê ma bî birincê ma bî. Amê tîya ra xu rê xaşîng berdê ma rotê dê ci. Ma cite kerdê erd aw dê di rojî hîrê mendê bîyê zuwa ma şî bezre kerdê badê bezrî cite kerdê badê cite sag dê pero şerte fenê şertî tûrî viraştê. Eştê gaya dima bîyê sipar û sa kerdê erdê dûz bo fenê enka silindir o çi wo to dî deşte senî ewka silindir kena erdê nîske ê ma jî anû erdê cê kerdê dûz. Debarê ma bi xaşîng bî qezê Qulpî Hevêdanî nîmêk etya dewê ma ser o bî o amê xaşîng xwu rê girotê berdê. Nangiranî bî a verîne nîna vîrê min feqet ena badê coyî yanê şêrînayî bî a şêrînî nanî bî a nîna vîrê min. Dinya bî weşe ma amey tîya. Eyro patosî vecyê ma gêley kerdê. Ma şê binê dare de xu rê seetêk rûniştêy îsirhet bikerdey îsirhet çinêbi ma debir bi vaşturî ramitê ma gêley kerdê badê coyî va ewk vecyo eştê gaya dima badê ê patose vecya qere patose vecya ma va xuranê ena tamam o a qere patose jî şî sawurme vecya sawurmî şî enka bîçere vecyawa. Ma fekê bîçere ra ma genimê xwu benê şinê arye de tenenê roj de bîçere şina mîyan roc de ma arda anê kê. Ma tîya ra çar seetî şîyê çemê qewşanî ardî tenê o çar seetî reyê ma bî ma şewêk ûca mendê gere ci rê vezd biberdey gere ma ci rê ron biberdey ma şî kolî ardê wextê engure engire berdê ma ci rê çî berdê hemanê bertîl hema ma rê ardî teney. Çemê qewşanî qulp de bi o qeyde ma amey risey tîya tixtorî çinêbî tixtorê ma dewe de bî tixtorê ma yê dewe tamamê tixtora dewe de bî pêro uzmanî bî. Babê min burûn boxaz tixtorî bi, Hecî Filît bib ortopedî, Hecî Îbrayim bib profesor tixtor dîş tixtorî bi, Hecî Kerîm goz tixtorî bi, pîra Eme bibî vatê Emê Rihe a cîldîye bî cîldîye tixtorî bî, naca Rihe bibî Sutma tixtorî bî. Enê tixtorê ma pêro dewe de bî. Ma xeste meste nêdî ma şîyê ma ende awa germe werdê ma do berdê

kerdê kidika. De. berdê kidikê doyi. enê eyarê bizêka ma kerdê ci berdê şîyê yaban boy kewtê ci bîyê pirê cîmcîm pirê morcela pirê çî ma werdê. Kulêk nêamê ma rê eyro jî des yemekî yenê sifri ser pêro hestelix o tememê cê xestelix o tamamê cê bi îlac ê o. Wext gubre çinêb to ra vacî îlac çinêbi debrê ma bê gubre bi dewarê ma bê yêm bi şitê ma hekîm şitê dewarî hekîm bi genim ma ramitê ma nan etya pewtê ma amê nîm seet reye ma amê dîyarê gaze boyê nanî amê. Ma tenûre de eyro boyê nanî çin ya, bixul pewtê ma te ra mirdî nêwerdê eyro ti pewcenê anênê fenê vaşî yo, tem te de çin yo, lezetêk te de çin yo. Nê meyve de esto nê zebze de esto nê nan de esto nê ti çîkêk de çin yo pêro enê îlaca ra wo pêro enê madda ra wo enê madda erzenê ci tem te de nêmaneno lezet te de nêmaneno. Ronê fîdeyaxî ewulî vecya tîya ra boy şîyê nîm seet reye hamê boy amê eyro boy moy çin ya kewtê ra ser boy moyê cê çin ya ma heya etya amey e nêşîya oqule mi berê oqule nêdî e jo seete şîya geceoqulî e jo seete şîya melimê mi belga da mi seetêke tenê etya ra min û lacê apê xwu ma da pêro koli guna destê cê ro şî gerê mi kerd şî va kardî dawa mi ro. Ez bîya mekûm çîqa esker ame o wext amê ziftî o ziftî amê celb kerdê berdê yanê bi celb amê berdê. Eyro nêveydenê wazenê ti şinê şo nêşinê meşo kîngê qefelyê go to bero pîrya amey şî eskerî mi jî raver bî mi va wele ezo nêşorî e xwu nîşan nêdana ez heya şorî esker çîqa amey mi xwu nîşan nêda sonê cê de eskerî vecya e şîya esker e şîya qulp ma şî qomanê xwu jî girote aşî bî de hebî hîrê hebî hevalê min ê ê mi nêdîyo hebê çawîş o yeno tîya qeybê min mekûm a mi dî hevalanê mi va wele eno ziftî va go to bido girotişî cendirma ra enka vanê cendirme enka vanê esker vatê cendirme ziftî bî ewul ma vatê ziftî va go eno anû gêren etya salone de cilê sifilî dê xwu ra go to bigîro yawo senî go mi bigîro va wele go to bigîro va hema salone ro şino yeno salonê hukmat qûnaxî ro şino yeno hama çima çarneno va to nas keno mi nêdî mi ende dî ez qefelnawa hebê kewt enê destî hepîsxane jî nîzd ib jo kewt enê qolê mi jo kewt enê qolê mi hebê şa ra ver hebê mi dima e berde şîya girota kerda hefs eman yeman e kerda hefs. Çewres û panc rocî cezê mi bî ez kerda hefs. Çewres û panc rocê mi qedeyez ez beredawa hevalî şî e beredawa va ti go eyro şorê di rocî to rê mewlet to şorê esker ez amîya di rocî tîya menda temafîle ma şî tîya serê gaze temafîle amî ewulî temafîle bî badê coyî bî makîna badê makîna bî qamyone badê qamyone bî enka bîya ereba enka vanê ereba ewulî temafîle temafîle ser akerdîbî ma kewtî temafîle ma şî e tenya tirkî nêzana yazî mi esta tirkî nêzana çepil çûpil kena lo nan aw filan bêvan e zana dadî min û o bûkê mi dir amey sedîqa amey îstesone e kerda sipar ê bermey ê mi xemê mi nîyo ha bavo ha bira mi dima bermey mi

xem nêkerd e şîya ma di rocî hîrê şewî ma qeretîrene de ma şî a şewî ma manîsa de mendî e tenya hîrê hebî jî hevalê mi estê ê jî risê mi dewre xaybî ya zanê hîrê hebî hevalê risey min serê sibey ûca ra e wušta we da ewk qirxaxaç e şîya qirxaxaç o wext elî oqule bibî çar aşmî şîya elî oqule ma berdî şî oqule texte de nûşt va yaz va ana yaz ê tebeşîr o tebeşîr jî hema vano mi binûsne maşala yazî tebeşîrî jî va ana yaz ana nûşye va baba yaz baba nûşte mi nûşt adiniz yaz qumandarî yaz qumandar nûşt ez vecyawa ê bînî wuştî we de hebê bînî tirk ê e nêzana ê şirawutî elî oqule e şirawuta bêlûge e berda şîya teslîmê hebê bêlûge kerd bêlûgê ma jî ûja tabûr a e berda uçuncî bêlûg e teslîmê caye kerd. Şewa ewulîn a e berda yaw e nêzana senî bikerî e berda şîya yataxî nîşanê mi da remzê bî hetê binî ya nîşanê mi da ma remza ser o wê henî wextê rakewtîşa mi dî hebê ame hebê ziftî amo esker o mi ra va qax. E wušta we mi kerdî xwu pay mi lîngê xwu şitî ma amey kewtî ra serê sibey ez ecemî ya hema şewa ewulîn a de ê serê sibey wexto wurzenê we esker o ê eskero kan o ê zanê ez hema ecemî ya dême go serê sibê wurzê we go binê nevresime de go şalanê xwu bancê heya tîya binê nevresim de serê sibey qawuşçî dano berê qawîşe ro qaxin esker qax wurzenê we hema eg va qax wurzeno we şalanê xwu anceno qinê xwu îne cilê xwu heya tîya dê xwu ra ê wexto vano qax tek ci rê ewk lazim o montê xwu danê xwu ra o kuno teber heta de cilî jî dê ma melûmê home yo beynatê di kopriya mi qayış hire do o bîn cilê cê veng ê yanê hebê jî kuno ewkanê pantoranê min şewqa nawa xwu sere de hîrê serey virazyê sereykê mi bi hîrê serey. Serey kewto eno per jo kewto eno per jo dîyar o şewqa kewte tîyayê min sere çin yo sere kerdo rût mi awna eyne ra yaw ez bermawa halê xwu rê eno kam o e nîya kam o kewta teber heya kewta teber jo verê berê qawîşe de çin yo eman yeman e se ra vazdî se ra şorî mi awna eytim alayî de ewtî cîna def o zirna wa çalgî ya mi va welahî ena dewa wa e şorî mîyanê dewa mi xwu ant e şîya mi awna esker o e şîya hema e ceyk e ro ceyk qelebyawa kewta mîyanê eskerî ewca vinderta kewta mîyanê îne ti mevace qawîşa gi bêlûga gi e dawa ci a bêlûge nîya mi dî hebê ame hebê çawîş o va hebê neferê ma vinî yo mehmet qorqût mehmet qorqût ez a mi va bûrdayim bûrdayim ti çîrê amey tîya milê mi girot ez berda şîya va yazî to esta mi va e taret taximî bib o wext te ra vatê taret taximî çar hebî namlû cê bî ûçeşewar va ba taret taximî va ba cê to eno wo mi va e nêzana enê qolê mi de nûşt manqê min taximê min bêlûgê min pêro qolê mi de nûşt yazî nûşte e zana yazî da pero ma amey ez henî mûsawa e şîya serê sibey e wušta we dême min awna îne ra mi jî serê sibey şalê xwu antî qinê xwu o serê sibê wušta we ez qawîşe qawîşe de pey ra kewta teber îne dir kewta teber hevala

dir ma şî ma vîst û new rocî ûca menda daxtim kerd ma şî çorlû ûca ma mendî ma çorlû de mendî vatê şîma mixara ra amê kotî ra amê perê enê hetê mardînî ra bî extîyarî bî herdîşê cîne bibî rocêk mi rê hezar panot pere babê mi şîrawut veynda min va bê perê to amey e şîya hebê bib Kû ra bi. Berî bi perey dê ê ma rê şîrawutê va çî to wo mi va lacê xalê min o va çîqa to rê amey mi va hezar panot va ti kotî ra wê mi va e dîyarbekir ra wa va ti dîyarbekir a wê mi va e va to çende hebî cendirmey kiştê va ti eşqîyê ti mekûm ê to çende hebî cendirmey kiştê ma ekîcî yê awî yê dewê ma awî ya şîma kîlo titûnî çîqa roşenê mi dî anû qelemê xwu na defterê xwu ser vindert va oxlim va ezo pan sey bidî to va ez pan sey nêdana va kîngê perê to qedyey va bê ezo bidî to ê perê hema nêqedyey reyna babê mi pan sey mi rê şîrawut hîrê çar hezarî pere mi eskerî de wird va ena bêlûge sirgûn bîya ena tabûre aşmê aminî ya silam dûr de vîndenê o yeno heta uçaqê cê nêna ro dorê eskerî şîno yeno tay te ra bayilmîş benê zefê cîne bayilmîş benê konê ma mirdî nan nêwerd ma vatê xeyrê homey rê ma mirdî nan biwerdê esker de ma şîyê verê qentîle gudêke fenê kufta dê ma serê sibey jî nîmê aye dê şande jî nîme dê nîske ardê nîska şîya tenayî nê şîya îdarecî cîne esto her vuruş de îdarecî cîne ser o vinderto mi jî na serê xwu de e zî bîya îdarecî cê o erzeno îne gi pero dê jî derb werdê eg şarê dîyarbekirî bê îne gi pero dê derb werdê o îne gi nêdê pero jî derb werdê îne gi dê pero vatê şîma eskerî kiştê şîma tetikçî yê îne gi nêdê pero jî reyna derb werd.

WERGERA KURMANCÎ: Ez kurê Hecî Ehmedî me. Ji Seyrikê, temenê min heftê sal e. Ev bav û kalên me digotin: “em sê bira bûn.” Ew bira tèn. Digotin me wekî zemanê niha bawer nedikir. Niha birayek li Edîrnê ye, ewê din li Wanê ye. Hevdu nabînin roj bibe hevdu nas nakin. Ên me jî dibêjin ji ku derê hatin. Sê heb bûn, hatin yekî li Şêxbûbayê maye, yekî hatîye li vir, yek jî çûye Sîsê ya Licê. Ew yê Şêxbûba li wê derê bi cih bûye. Ev jî li vir bûye, ewê din jî çûye li wê derê. Em wek eşîrê ji Mistanê ne. Eşîrê Mistanî, ne Hevêda me qebûl dike ne jî Kavar me qebûl dike. Ê me eşîra Mistanî wele me gelek êş dît. Wele di wextê me de me paleyî dikir, me gêre dikir, me xaşîk diajot, me birinc diajot. Aşê me bû, debara me baş bû, nifûsê me jî kêmbû. Ez bûm du heb xwişkên min bûn dê bavê min û dîya min bûn. Em bi aş xwedî dibûn. Xelq dihat li vir, ê me avîya me hebû, xaşîk û birincê me hebûn. Dihatin li vir ji xwe re xaşîk dibir û me xaşîk difiroto wan. Me cot dikir û erd av dida. Du-sê roj diman û ziwa dibûn em diçûn me bîzar dikir piştî bîzarê cot dikir piştî cot jî me gîsîn lêdixist ew bi şîft wekî şîftê ozor çêdikir. Diavêtin piştî

gayan, siwar dibûn û gisîn dikir erd dûz bibe. Niha wekî sîlindir e çi ye? Te dît niha deşt çawa bi sîlindik çêdikin erdê nîskê ê me jî wusa erdê wê dûz dikir. Debarê me bi xaşîkê bû. Nîvekê Hevêdanî navçe ya Pasorê li ser gûndê me bû. Û hatin xaşîk ji xwe re dikirî û dibir. Berê Nangiranî (Xela) hebû ewê berê nayê bîra min lê pişt re şêrînî bû şêrînî ya nan bû ew nayê bîra min. Dinê bû rind û em hatin vê derê. Îro patos derketîye me gêle dikir. Em biçûna di bin darê de saetek ji xwe re rûniştandina û bêhna xwe bida lê bêhndan tune bû. Me debir bi das diçinî û gêre dikir. Pişt re patos derketin. Qere patos derket jixwe me got ev tamam e. Û qere patos jî çû sawurme (berba) derket. Ew jî çû niha makîneya çinîne derketîye. Ji devê makîneyê em genimê xwe digrin û dibin aş û dihêrin. Yanê di nav rojê de ta ku bîçer diçe em arvanê xwe tînin malê. Em ji vir çar saet diçûn Çemê Qewşan arvan dihêrin. Çar saet rêya me bû. Em şevêk li wir diman. Divê jê re bez bibira, rûn bibira. Em diçûn êzing dianî. Di wextê tirî de me tirî dibir. Me bertîl jê re didan hema ji me re dianî. Çemê Qewşanî li Pasorê ye. Bi vî awayî em hatin gihîştin vira. Doktor tune bûn. Doktorên me li gûndê bûn. Gişt doktoran li gûndê bûn. Hemû jî pispor (uzman) bûn. Bavê min doktorê gûh û qirikê bû. Hecî Filît bûbû ortopedî, Hecî Îbrahîm profesor bûbû ew jî doktorê diranan bû. Hecî Kerîm doktorê çav bû, pîra Emê bûbû. Digotin: “Ema Rihê.” ew cîldîye bû. Amojîna Rihe bû, ew jî doktora sitma bû. Ev doktorên me hemû di nav gûndê de bûn. Me nêxweşxane felan nedît, em diçûn qasî ava germ vedixwar. Me dew dibir û dikir nav kodikan, ev meşkê ji postê bizinan hebûn. Me dibir yaban û bêh diketin wê û tev morî diketin wê dewê û me jî wisa vedixwar. Kulek ji me re nedihat. Îro jî li ser sifreyê deh cûre xwarin hene. Tevahîya wan nexweşî ne û hemû biîlac in. Di wê demê de gubre jî tune bû. Debrên me bêgubre bûn. Dewarên me bêyem bûn, şîrê dewarê me hekîm bû. Me genim diajot. Geva me nan li vir dipeht, bêhna vî nan nîv saet rê em diçûn heta dîyarê gazê, dihat. Di tenûrê de îro bêhna nanî nîn e. Savar dipeht me jê têra xwe nedixwar. Îro tu dipêjî tencere tînî deynî wekî gîya ye. Tam tê de nîn e, lezetek tê de nîn e. Ne tama devê heye ne zerzewat ne jî tama nanî ne jî tama tiştêkî heye. Hemû ji ber îlac û maddeyê ye. Ev maddeyê davêjin wê û tê de tam û lezet namînin. Yekem rûnê vîta derket. Ji vir heta nîv saet rê diçûn dîsa jî bêhn dihat. Niha bêhn-mêhn nîn e. Niha li ser bisekine jî bêhn-mêhn nîn e. Em heta li vê derê hatin. Ez neçûm dibistanê, min berê dibistanê nedît. Ez seetek çûm dibistanê şevê. Ez seetek çûme mamosteyê min belge da min. Tenê saetek çûm. Min û pismamê xwe me li hev xist ezing li destê wî ket çû gilîyê min kir. Çû got: “kêr li min xistiye.” Ez bûm mehkûm. Wê demê çiqas esker hatin ziftî bi ziftî hatin. Ez

celb kırım û birim. Yanê ji bo celb hatin û ez birim. Îro gazî nakin. Dixwazî biçer ger tu neçî neçe. Kîngê te girt dê te bibe. Hîngê hatin û çûn, pêşî min jî eskerî bû, min got: “wele ezê neçim.” ez xwe nîşan nadim ta ku ez biçim esker. Çiqas ku esker hatin min xwe nîşan neda. Dû re eskerî derket û ez çûm esker. Ez çûm Pasorê, pîvana bejnên me girtin, em aşî kirin. Du-sê heb jî hevalê min in. Min nedîtiye hebek çawiş e ji bo min tê ez mehkûm im. Min dît hevalên min got: “wele ev ziftî te bide girtin.” ji cendirme re niha dibêjin “cendirme û esker.” digotin: “cendirme ziftî.” berê me digot: ziftî.” got: “ev wisa di salonê de digere û cilê sivîlê li xwe kirîye dê te bigre.” yaw çawa dê min bigre, got: “wele dê te bigre. Li salonê diçe û tê” li salona qonaxa hikûmetê diçe û tê. Lê çima vedigere? Got: “te nas dike.” tiştê ku min dît kesekî ket vî destê mi ez girtime û hepisxane jî nêz bû. Kesek ket binê vî milê min kesê din jî binê vî milê min yekî li pêş min yekî jî li paş min ez birim kırım hepsê. Eman-yeman lê ez kırım hepsê. Çil û penc roj ceza min bû. Çil û penc rojên min qedîyan ez berdâm. Heval çûn. Ez berdâm û ji min re got: “ji te re du roj molet tu dê biçî esker.” Ez hatim du roj li vir mam. Berê tomofil hebû. Bi tomofil em çûn serê Gazê, piştî makîna hat qamyon. Qamyon bû niha dibêjin “erebe” ewil tomofil û li ser tomofilê jî vekirî bû, em ketin tomofilê em çûn. Tenê ez tirkî nizamim, nivîsina min heye lê xeberdan jî çepil-çûpil dikim. Nan, av felan bêvan ez dizanim, dayika min û bûkê jî li gel min hatin. Sedîqa hat îstasyonê ez sûwar kırım. Ew girîn lê yê min jî ne xemê min e. Ha bavo ha bira li dû min girîn min xem nekir. Ez çûm, du roj û sê şev em bi qeretrênê re çûn. Em wê şevê li manîsayê man. Ez û sê heb jî hevalên min hene. Ew jî wekî min eskerê hilik in (devre kaybi). Sê heb heval ên wekî min. Serê sibehê ez rabûm ez dam Qirxaxacê ya Manîsa. Ez çûm Qiraxacê, wê demê Alî Okulu (Eskerên ku xwendin û nivîsin ya tirkî nizanin ji bo wan tê dayîn. Di dema dersdayînê da piranî bi navê “Alî” bi kar tînin. Mînak: Alî gel, Alî bak, h.w.d Ji ber vê di devoka gel de bûye “Alî okulu”) hebû. Ez çar meh çûm Mektebê Alî. Me birin em çûn mekteb di texteyê de nivîs got “binivîse”, tebeşîr heye û ji min re dibêje binivîse. Got: “navê xwe binivîse ê dayik binivîse, ê bav binivîse, ê qumandar binivîse” min hemû nivîs û ez derketim. Ên din rabûn hinek jî tirk in. Ez nizamim ew şandin Mektebê Alî ez şandim bolugê (komik) (bolug: di nav pergala leşkerî ya tirkan de beşek e. ji her beşekî tabûrê re “bölük” dibêjin). Ez birim teslîmê bolugek kırım. Li wê derê jî tabûr e. (tabûr jî beşeke pergala leşkerî ya tirkan e.) ez birim teslîmê boluga sêyemîn kırım. Şeva yekem e, ez birim lê ez nizamim çawa bikim. Ez birim cihê razan û nivîn nîşanê min da. Ranzayek nîşanê min da û êdî dema razanê ye. Min dît hebek

ziffî hatîye, esker e û ji min re got “rabe”. Ez rabûm min cilên xwe li xwe kirin û min lingên xwe şuştin û razam. Ez ecemî me. Serê sibehê gava radibin ên eskerên kevin dizanin lê ez hîna ecemî me tişteke nizanîm. Gava ku dema rabûnê ye nobedar ê qawûşan li deriyên qawûşan lê dide û diqîre “rabin.” Serê sibehê dê tu rabî û di bin nevrêsîmê de şalên xwe derkevî û bikşîni serê qûna xwe hemû cilên xwe û montê xwe li xwe bikî û derkevî derva. Ta ku cil dan me. Melûmê Xwedê ye, di navbera du piran de min kemer girê daye. Ê din cilên wî vala ne. yanê hebê din jî dikeve nav pantorê min. Min şewqa danîye serê xwe de sê heb ser çêbûne. Serekî min bû sê heb. Ser ketîye vî alî yekî vî alî yekî dîyar şewqe ketîya vîra min. Ser nîn e. Ser rût kirîye, ez li neynikê nêrîm ez ji rewşa xwe re girîm. Ev kî ye. Ketim derva, ta ku ez ketim derva kes vê derê nîn e. Eman-yeman ez bazdim ku derê, biçim ku. Min mêze kir ku deng li eytîm alayî (alaya perwerdeyî) tê. Def e zirne ye saz e. Min got: “wele ya min ev e. Ez bikevim nav.” Min li xwe kişand û ez ketim nava wan. Ez nêrîm esker e û ez hîn çûm cîhek li cîhekî rastê min hat û ketim nava esker. Li wê derê sekinîm û ketim nava wan. Nebêje, boluga ku ez dame ne ew e di wê heynê de min dît kesekî hat çawiş e. got ku hebek neferê wan winda bûye. Mehmed Korkut. Mehmed Korkut ez im. Min got ez liv vir im. Got: “çima tu hatî vîra.” ez girtim û birim û got: “nivîsina te heye” min got: “heye.” Wê demê taximê taret hebû. Çar heb namlûyên wê bûn, balafirşikên (uçaksavar). Got: “binêre cihê te vîra ye.” Min jî got: “ez nizanîm.” Li ser milê min mangaya (manga: di pergala leşkerî de beşekî herî biçûk e) min taxima (taxim: du- sê heb manga kom dibin û taxim çêdikin) min boluga min hemû nivîsin û nûsand em hatin. Êdî ez hîn bûm û ez çûm. Serê sibehê ez rabûm. Demeke ez li wan nêrîm û ez jî serê sibehê radibim û şalên li xwe kir û li gel wan ketim derva. Li gel hevalan em çûn û bîst û neh roj li wir man. Pişt re em dagitim (belavkirin) kirin (dağitim: Di erka eskerîye de esker ewil diçe mehek ecemîti dike pişt re wî dişînin cîhekî din li wir êdî eskerê osta ye. Ji vê belavkirinê re jî bi tirkî dagitim dibêjin.) Em çûn Çorluyê (navçeya Tekîrdag e) Em li Çorluyê man. Ji me re digotin: “we ji şikeftê hatin, ji ku derê hatin.” Gişt ji aliyê Mêrdînê ve bûn, kal bûn û rîyê wan hebû. Rojek bavê min ji min re hezar wereq pere şand. Gazîyê min kir û got: “pereyê te hatiye.” Ez çûm yekî bû ji Kûyê bû navê wî Behrî bû. Pere da min û got: “ê ku ji me re şandîye çi ye te ye?” min got: “kurê xalê min e.” got: “ji te re çiqas hatiye.” min got: “hezar wereq hatiye.” got: “tu ji ku yî?” min got: “ez ji amedê me.” got: “tu ji amedê yî?” min got: “belê.” got: “te çend cenderme kuştin, tu eşqiya yî, tu mehkûm î te çend cenderme kuştin?” min got: “em ekîcî ne

(zevîçîn) avî ne, gûndê me avî ye.” got: “hûn kîloyek titûnê bi çend difiroşin?” Min dît pênûsa xwe wusa li ser defterê xwe danî û got: “oglum (kurê min, bi mena ev e lê di zimanê tirkî de ev peyv bi gorî gotinan diguhere ger di dema hêrsbûnê de were gotin ji bo biçûkxistinê ye) ezê ji te re pênc sed wereq bidim, pênc sed jî li ba min e kîngê pereyê te biqede ezê bidim te.” Lê pereyê min hîn neqedîbû bavê min dîsa ji min re pênc sed şand. Di leşkerîyê de sê-çar hezar min pere xwar. Ev bolug celî bûye (surgun). Ev tabûr, meha havînê ye di “selam-dûr” (amadebûna eskerî ye. Esker wisa li cihê xwe disekine û li benda fermana qûmandar e) de disekinin û tê. Ta ku balafira wî deynin li dor esker diçin û tèn pîranî tê de dixeriqin û dikevin. Me têra xwe nan nexwar. Me digot: “xeyra xwedê me têra xwe nan bixwara.” di eskerîyê de em diçûn berê kantînê gilokek wekî kifte dida me û serê sibehê jî nivê wê dida me, êvarê jî nivê wê û nîsk dianî nîska reş. Teneyên vê nîskê reş in. Îdarekerê wan heye di her nîşangirtinê de îdareker li ser wan sekiniye. Min jî di vê salê xwe de ez bûm îdarekerê wî. Ên ku lev xistiye û derb xwariye û ên ku lev nexistiye jî derb xwariye ger ku gelê Amedê bin digotin: “we esker kuştin, hûn tetikkêş in. Ên ku lev nexistiye û dîsa jî derb xwar.